





# Naverok

Sal 4 . Hejmar 13 . Bihar 1998

---

- Peydabûn û bingehê nasyonalîzma Kurd li Îranê I 3  
Dr. Ebbas Welî
- Bedirxan Beg (Bedirxan Paşa) - II 18  
Malmisaniy
- Pirsa “kumik” û tehlûkeya ji navçûna zimanê kurdî 30  
Şahînê Bekirê Soreklî
- Edebiyat û zanistiya hunerî 38  
N. Zaxuranî
- Rojek ji rojên zîndana Diyarbekirê 43  
Laleş Qaso
- Rûsipîkirin 47  
Zeynelabidîn Zinar
- Xerîbî zor e, sirgûnî zehmet e! 51  
Lokman Polat
- Sefera trêne û dinya biçûk 55  
Cemal Batun
- Mihemedê Qazî (Mohamad Ghazî) 61  
Hesen Qazî
- Zimanê Kurdî û nexşeya coxrafî ya zaravayên wî 64  
Fuad Hama Xorşîd
- Felsefa ola êzîdiyan û koka wê 80  
Pîr Memo Osman
- ”Ziman û çanda kurdî ne tenê ya kurda ye,  
pirsa 62 mîlyon hemwelatîyê Tirkîyê ye ” 89  
Yilmaz Çamlîbel

Sal 4

Hejmar 13

Bihar 1998

Xwedî

Komeleya Nivîskarên Kurd  
li Swêdê

Redaksiyon

Laleş Qaso  
A. Gernas  
Zinar Soran  
Cemal Batûn

Şertên abonetiye

Salek: 200 SEK  
Niv sal: 100 SEK  
Hejmarek: 50 SEK  
*Ji bo welatên din mesrefa  
posteyê lê zêde dibe.*

Îlan

Rûpelek: 1 000 SEK  
Niv rûpel: 500 SEK  
Çarîk rûpel: 200 SEK

Pergala rûpelan

A. Gernas

Wêneya bergê pêşî

Şerefyanê Bedlîsî  
*(ji alîyê Bedû Babacan)*

Postgiro

46 32 31-1

ISSN

1400-528X

Çap

Apec-Tryck

*Berpirsiyariya her nivîsê, ya nivîskarê/nivîskara wê ye.*

Navnîşan • Adres • Adress:

Box 2015, 176 02 Järfälla/SWEDEN

# Peydabûn û bingehê nasyonalîzma Kurd li Îranê I

Dr. Ebbas Welî

*Ev meqaleya han qismek ji projeya xebata Dr. Ebbas Welî ye. Ev xebata wî di meha tebaxa sala 1994an de ji aliyê Şûraya Lêkolînî ya Aborî û Civakî li Brîtanyayê (ECONOMIC AND SOCIAL RESEARCH COUNCIL IN BRITAIN) alîkarî girtibû. Zimanê vê xebatê yê orîjînal ingilîzî ye. Ev qismê han ji aliyê Hesênê Qazî ve hatiye wergerandin ser zaravayê soranî. Kurmanciya wê jî, ji ber soraniya wê hatiye çêkirin. Ev xebata Dr. Ebbas Welî wek kitêb di nîsana sala 1996an de hatiye çapkirin. Kitêb, digel hin perspektîv û nerînên nû, behsa peydabûn û bingehê tevgera nasyonalîstî ya di Kurdîstana Îranê de dike. Ji ber balkêşiya van nerîn û perspektîvên nivîskar ên di derheqê peydabûn û bingehê nasyonalîzma kurd a modern de, di çarçoveyê teng de jî be xwe dide mînaqêşeyê kirin. Bi hêviya ku xwendevanên me yê kurmancîaxêw jî bikarin beşdarî vê mînaqêşeya han bibin, bi derengî be jî em vê pêşkêşî wan dikin.*

**Z. Avci**

Di nivîsên kurdî yê di derheqê dîrokê de, hin bîr û baweriyên bi nifûz ên wisa hene ku rah û rîşên tevgera nasyonalîstî di Kurdîstana Îranê de digihînin Serhildana Şêx Ubeydullah a li dijî împaratoriya osmanî ya di salên dawî yê sedsala 19an.

Tê gotin ku ev serhildana han, li Îranê tovên nasyonalîzma modern di axa kurd de reşand; ew bi lez ber bi aliyê rohilatê, ji sinorê Îranê derbas bû û navçeya bakûrê rojavayê Deryaçeya Urmiyê girt nav çarçoveya xwe. Pişt re tevgera nasyonalîstî bû cereyanek ku tim û tim ber bi firehbûnê ve çû û di merheleya pêşveçûna xwe ya herî bilind de gihişt wan bûyeran ku di sala 1946an de bûn sebebê damezirandina Komara Mahabadê. Çalakiyên siyasî yê hêzên kurdan ku li hemberî dewleta Îranê yê di navbera salên e dît û bi

vê gav avêtin sedsala 20an. Ev, ew proses bû ku di salên 10an ên destpêka sedsala 19an pê ve bi çalakane di kar de bû. Tesîrê pêşdeçûna ber hemanîna kelûpel û aboriyê kir û li milekî beşeke zêde ji çîna xwedî milk kêşîya nav bazarê; li milekî din jî di merkezên bajarnîşînî yên serekî de sebebên mezinbûna dereceya burjuvaziya bazirganî ya bi hêz ava kir. Ber bi pêşveçûna aborî bûbû sebebê avakirina aloziya civakî û problema îdeolojî û wê jî nerizayîyeke siyasî di nav wê hêza civakî de, ku kultura taze ya nûkirinî tesîr li ser kiribû, pêk anîbû. Xwedî milkên mezin û burjuvaziya bazirganî ya doh û îro, eger çendîn ewqas bi hêz nebûn ku awayên berî sermayedariyê ji ortê rakin, lê xwe di gehîneke wisa de nîşan dan ku, dibû li dijî bingegehê hilweşayî yê otokrasiya Qacar bisekine, ku ji ber hewcedariya pir a bi serweta zêde, çiqas diçû çiltir dibû û zêdetir hewesa ji bo serweta dahatû geş dikir. Kêmbûna bihayê pereyên zîv, zêdekirina malîyet û serane û bi ser de jî danîna terîfeya gumrukê, di bazarê de pêşî li berhemanîna ziraetê girt, ku ew hem çavkaniya serweta ax û hem qazanca bazirganî bû. Ew lihevhatina siyasî ya ku di dawiyê de di navbera herdu çînan de pêk hat, xwediyê bingehekî qewîn ê aborî, şiklê siyasî, yekperçetiya îdeolojî û nûnerayetiya gelî bû. Dema ku çî rewşenbîrên tradîsyonî û çî jî yên nûparêz bi awakî çalakane piştevanî lê kirin û ji bo reforma civakî, aborî û siyasî pey dengê hawara wê çûn, vê lihevhatina han karê xwe da qebl kirin.

Şoreşa 1905-1906an ku cî ji fermanrewatiya otokrasiya vala kir û hikmekî destûrî (meşrutî) li ciyê wê danî, tovê nasyonalîzma îranî jî çand, mefhuma (konsept) neteweyê Îran, ku bi lez bi tevgera destûrxwazî ve dijîtiya demokrasiya gelêrî di ciyê otokrasiyê de dabû pêşîya xwe û ew bilind kiribû, hat ket nav nerînên resmî û siyasî. “Mefhuma neteweyê Îran” di Qanûna Esasî ya dewleta nû de wekî çavkaniya hakimiyet (serwerî) û heqaniyetê (rewayî) hat bicîkirin. Qanûna Esasî da xuyakirin, ku hakimiyet ji bo parvekirinê nabe, gerek e ew heta hetayî be û yekitiya neteweyî ya Îranê û hêzbûnî û temametiya axa Îranê mercê ji parvenebûnî û heta hetayî bûyine. Rêvebirina vê qanûnê xist ser milê hikûmetekê ku bi rêya raya giştî di helbijartîneke dewreyî de cî bi cî bike. Qanûna 1905an bi awayekî neqdî bi peywendiyek semt (diqet) di navbera netewe û dewletê de li ser bingegehê demokrasiyê cihêkirina desthilat û hakimiyeta gel hatibû ava kirin. Eger çendîn şiklê damezirandin û bingegehê rêxistina dewletê bi awayekî ronî di qanûnê de hatibû danîn, lê ev belgeya han ji bo tebîet û mercên hevvelatîyê di dewleteke nû de bi tevayî ne zelal bû(2).

Ew qanûn bi rêya cîkirina îbareteke ji bo maf û erk, ku peywendîya di navbera ferd (individual) û dewletê de diyar dikir û yên bi tertîb bi du mercên din ve, yanî hakimiyeta gel û huwiyeta netewayetî ve girêdida, mefhumeke demokratîk a hevvelatî tê de bû. Qanûna Esasî, mafê dengdanê yê mêran ji bo her rûniştîyê xwenda girtibû ber çavan û li gor vê, jin û xelkê nexwenda

ji cereyana siyasî ya resmî derxistibû. Ji bo liberçavgirtina civaka Îranê di destpêka sed sala 20an de, mercên cins (zayend) û xwendewarî bi awayekî hakim bi rê ve diçû û hakimiyeta gel û mafê demokratîk a beşdariya di cereyana siyasî de teng dikir û ew maf tenê ji bo grubeke teng a hevvelatiyan re rewa didît; di dereceya yekê de jî nerîna xwendewar a çîna navîn a rûniştîyên hindurê bajarên serekî. Jinên Îranê û piraniya herî zêde rûniştîyên di hindurê gundan de, bêyî ku mafekî wan li ber çav hatibe girtin, ji bo ku di cereyana siyasî de cî bigirin, divabû erkên dewletê li berçav bigirin. Diyarkirin û pênasîna unsurên pêkhênerê huwiyeta netewî, eger hatiba û diyar jî kiriba, sedkêşanî û pêkanîneke berteng bû ji bo şert û mercên hevvelatiyê di dewleta destûrî (meşrutî) de. Qanûna Esasî, zimanê farisî wek zimanê resmî yê neteweyî, zimanê îdarî û xwendinê bi nav kir û bi vê firsetê ji zimanê xwecî û navçeyan zêdetir pêş de çû, bêguman di nav van de kurdî jî. Ev zimanên han ne bi resmî îtiraf bi wan hatin kirin û ne jî hatin înkarkirin, eynî kar ji bo etnîsîteyên ne faris jî hat kirin. Qanûna Esasî, di babetê etnîsîti de bédengî rakir. Peywendiya etnîkan di perspektîva giştî ya neteweyê îranî de hat kirin ku huwiyeta wê bi rêya zimanê farisî (û şîetîya duwanzdeh îmamî) diyar kir û heta dereceyekê jî ne zelal ma. Bi vê yekê farisî bû zimanê hakim, zimanê desthilat û siyasî; sebebê destragihîştina zanîn, wesîleyek ji bo nûkirin û pêşketinê.

Huwiyeta netewayetîya îranî ya huwiyeta hevvelatiyan û wesîleya danenasîna wan ji aliyê hikûmeta demokratîk a nû ve ku hat kirin û bû ciyê maf û erkên hevvelatî û siyasîyan. Ev huwiyeta han pêwîstî bi yekîti û heta hetayetî bû. Li gor vê, Qanûna Esasî ya sala 1905an, her çendîn tiştek ji bo diyarkirina etnîkî ya şert û mercên hevvelatî tê de tunebû, (lê) derxistina cihêtiyên etnîkî di cereyana siyasî de gihişt înkarkirina huwiyeta etnîkî û di merkeza heq û mafan de jî qutkirina peywendîyan.

Ev înkarkirina han di bin (perdeya) rakirina bédengiya di derheqê awa û awatiya etnîkî û kultura netewî de hatibû veşartin ku helwesta resmî ya Qanûna Esasî radixist ber çavan. Digel vê jî, pir bi ser de neçû, nasyonālîzma îranî serê xwe rakir û ew bédengiya ku di danexuyakirinên resmî de dihatin kirin şikand. Dema ku gotinên ji bo mebesta hewcedariya vejandina netewayetî û pêşketin dihatin kirin, di cî de behsên ji bo nûkirina siyasî û aborî dihatin kirin. Nûkirin wisa dihat tehlîl kirin, ku berî hemû tiştî pêwîstî bi santralîzma siyasî û îdarî hebe: yanî, burokrasiyeke modern, leşkerekî (ordiyek) neteweyî, sistemeke tekane ya malîyatê û perwerde û hîndekariyeke layîq. Bi hevgerêdana santralîzma siyasî û nûkirina di nerîn û uslûba resmî de dihat wê maneyê ku êdî, ji wê demê şûn de hêz û meyla nemerkezîyetê divê kevneperestî bê hesab kirin, (û) ew nîşan û delaletek bin ji bo paşketinî û kevneperestiyê, li dijî dîrokê, heta li wî ciyê ku wan bi rastî yan her bi gotin hewil bidana vejeriyana çaxên derbasbûyî. Xweasêkirina li ser santralîzma siyasî di dema hikmê

destûrî (meşrutiyetê) de, eger çendîn rewatiyeke wê ya bi hêz ji bo şert û mercên civakî, aborî û siyasî ya Îranê hebû, (lê) rûyê veşartî yê diyarkirina resmî di ciyê nûkirinê de derket meydanê, di nefîceyê de bû nîşana nasyonalîzma resmî di bin femandariya Pehlewî de.

Di destpêka hukmê destûrî de, kurdên Îranê di sevyeye wisan de nebûn ku li dijî înkarkirina huwiyeta xwe ya di qanuna bingehîn ya dewleta nû de hebû, rabin. Ev ne ciyê tiştekî pê ve zêde kirin û mezinkirinê ye ku bê gotin: hişyariya netewayetî ya civaka kurd, heta li wî ciyî ku ew nîşanek be ji hişyariyeke hevbeş a di derheqê bûyîneke hevbeş di dîrokê de û armanceke hevbeş di siyasetê de, di nav kurdên Îranê de tune bû. Gumanek kêma heye ku ber bi pêşveçûnên siyasî û îdeolojî yên li ser axa kurdan a osmaniyan cîran, li ser Kurdistanê Îranê tesîr kiribe. Hereketê Şêx Ubeydullah, di zahirî de, ji bo Kurdistanê yekgirtî xebat dikir, beşeke firêh a axa kurdan a li Îranê da ber xwe, bûyerek e ku dikare bibe sebebê ajardana bîra nasyonalîstî û ew fikir jî ji ber hilweşîna desthilata merkezî ya Îranê û êrîş û destêkirina gav û bi gav a tirkên di dema meşrutiyetê de, ku ev hêz zêdetir biber bibe(3). Lê rastî ev e ku di salên alozî yên tevgera meşrutiyetxwazî di Îranê de, çî rewşenbîriyeke kurd di Kurdistanê de ji bo nêrîna nasyonalîstî di siyaset an edebiyatê de peyda nebû. Qet hêzeke bi rêkûpêk ya siyasî ya kurd a bi rêxistineke modern a siyasî di meydanê de tunebû, ku ji bo pêkanîna armanca nasyonalîstan kar bike û ne jî hêzeke teng û bisinorkirî ya temam an netemam. Tenê ev yek dikare hebe, ku nasyonalîstî bi awakî tam an netemam di mejiyê çend kesan de hebe û ev yek a han serî hildabe, lê ne nêrîneke siyasî û ne jî edebî derneket ku hebûna cereyan û kirinên siyaseta nasyonalîstî nîşan bidin(4). Di eksê ew gotinên tîr kirin, kurd bi giştî li hemberî cereyanên şoreşgerî muhafezekar bûn û di piraniya wan astengan de ku bi belge di dest de ne, kurdan beşdariya li dijî şoreşgeriyê kirine(5). Serokeşîretên kurdan li Azerbaycanê hêzên xwe dan rexê hêzên dijê şoreşê û ji bo damezirandina rejîma kevî hewlek naserkevî dan(6). Armanca wan ew bû ku bingehê feodaliyê xurt bikin û ew destkevtiyên bi kêmasî beşek jê ji dema sefewîyan di destê wan de bû biparêzin, ku ew jî: otonomiya îdarî û darayî yên ku di ciyê desthilata merkezî ya siyasî de bidest xistibûn, bûn(7). Lê sebebê serekî ji bo wendabûna kurdan di meydana siyasetê de di destpêka meşrutiyetê de bûyereke bingehîn bû, ew jî diçû digihîşt ser kevirê xîmî yê bingehê civaka kurdî ya di wê demê de.

Di dawîya sedsala 19an û destpêka sedsala 20an de, di civaka kurdî de peywendiyên berê sermayedariyê hakim bûn û ew civakeke heta dereceyek ziraî bû. Peywendiya kelûpelî bi zehmet tesîr kiribû ser bingehê berê sermayedariyê û berhemanîna ziraetê ku di eynî wextî bi ser aboriya bajêr de jî hakim bû. Ticaret û bazirganî di rewşeke paşketî de bû û bi de her eketê gelek jar ê ber bi pêşveçûna hêzên berhemanîne, cihêtiyên civakî û pêşketina kulturî pê re rû da. Jiyanê kurdan ya bajarvanî, piraniya peywendiyên destpêkî,



wefadarî û ev cure qîmetên han bi ser de hakim bû ku xesletê çîna xwedî milk awayê eşîretî dida xuyakirin. Rûniştîyên bajarên bi nisbet kêmbûna wan, bi giştî bi ber hemên ziraetê û çîna xwedî milkan ve hatibûn girêdan. Ev ewqas pêş de neçûbûn ku kultureke bi rêkûpêkî ya bajarvaniyê pêk bînin (ku bikaribin) bîr û baweriyên islahî civakî û nûkirina siyasî ku ji aliyê rewşenbîrên azerî û faris ve ter efdarî û bang jê re dihat kirin, werbigrin. Tebeqeya bilind ya kevn a tradîsyonî ya bazirganî, ku ji ber ticareta bi merkezên dûr ên bajarên serekî yê Rusya Qeyserî re têkiliya wan hebû û fikra islahî, pêşketinî û nûkirina kulturî seh kiribûn, hejmara wan gelek kêmbû û gelek ji wê jartir bû ku bikare guherîneke balkêşî di çarçoveya kulturî ya jiyana bajarvanî ya bajarên kurdnişînî yê serekî yê di Îranê de pêk bîne. Serokên eşîretan bi peyade, bi mirov û bi destûpeywendên xwe yê navçeyî ve, ku tekûtûk rewşenbîrên tradîsyonî jî di nav wan de bûn (piraniya wan mirovên dînî yê xort ên sunnî bûn ku farisî û erebî baş dizanîn û bi radeyeke kêmtir jî serî bi edebiyat û dîroka tirkên jî derdixistin), bi giştî ew tîkûtenê beşa xwediyê çalakîyên siyasî yê di nav rûniştîyên kurdan bûn. Kurdistana Îranê, dema ku mirov muqayeseya wê bi perçeyên din ên Kurdistanê re bike, beşa herî paşketî ya erdê kurd bû û di eksê kurdên osmanî, kurdên Îranê nedikarîn di destpêka sedsala 20an de, rewşenbîrên zanistî perwerde bikin(8).

Siyaseta eşîretî bi wê hal û awayî ku hebû, bi riya bi hev ve girêdana benên koka orf û adetan û xizmatiyê dimeşîya û orf û adetek bi rêkûpêkî yê wefadarî û bi awakî serûberî li ser ben hatibû raxistin ku bi esil û bingeh ve rah davêt û tenê ji bo rêxistinî û gerandina desthilatê bingehêke bi rêkûpêk bû(9). Hiyerarşîya fermanan û sekinandina ber emir di çarçoveya lêdana demarê eşîretî de sitûnek bû û desthilat ji jor ber bi jêr ve dimeşîya. Li gel ku li ser bingehê yek sitûnekê ferman dan, desthilatdariyeke (nifuzek) orf û adetî jî hebû, ku di bin navê qebîle yan di bin navê eşîretê de ji çarçoveya xwe ya siyasî pêk hatibû, ku desthilata qebîle yan xanedanan bihêztir dikir Çarçoveya siyasî û eskerî ya eşîretên kurdan bi riya bingehê aborî ve xurt û qahîm dikir, ku di bingeh de her eynî wekî wî awayî bû ku di nav navçeyên zîraetê yê neeşîret de li Kurdistanê û bi giştî li navçeyên din ên Îranê hebû(10). Eşîretên koçer ne tê de, ku zêdetir bi berhemên şivanî ve mijûl bûn, destxistina berhemê zîraetê li ser axa eşîretan, li ser milê aîleyê bû. Bi awakî tabî aîleya ji navikê ve ku mafê wê hebû ax bikar bîne, di ciyê wê de dibû beşeke ji berhemê bide xwediyê milk. Mafê bikaranîna ax mezintirîn rol bû ku ji aîleyê re hatibû dayîn, lê peywendîya bi destxistina berhem (berhemên) bi riya lihevhatina ser îcareyê, li ser beşeke ji birina hasilatê yan pareke hatî diyar kirin hatibû tenzîm kirin, ku ew jî mekanîzma aborî ya bindestî ya di çarçoveya eşîretî de bû. Axa eşîretê milkê taybetî ya serokeşîretê û kevrê xîmî yê desthilata aboriya wî bû. Ev jî yekem êrîş bû ku bi riya wê re serokatiya eşîretên kurdan û çarçoveya wan a siyasî û eskerî di nav çarçoveya dewlet û komelgeha Îranê

de li ser bingehê firehtir ê hêz û desthilatê hatin dûrxistin(11).

Xîm û bingehê eşîretî wekî bingehê rêxistina siyasî di Kurdistanê Îranê de netîceya wê şert û mercê bû ku, piştî yekem parvebûna Kurdistanê bi zoriya têkdana mîrnişînan (mîrektiyan) ve hatibû meydanê. Ev mîrnişînen han, ku li derûdora dewleta Îranê hebûn û bac û xerc didan, di çarçoveya awayekî berfermanî de ku bikare li ser otonomiyeye navxweyî bimeşe jê re pêk anîbû(12). Peywendiyên dewleta Îranê û eşîretên kurdan jî li ser bingehê feodalî bû û bi riya dayîna ax ji aliyê fermanrewa ve ji serokeşîretan re û di ciyê wê de jê re pêkanîna desteyeke çekdar û siwaran hatibû parastin. Hatina ax û xizmeta eskerî aliyê herî girîng ê vê peywendiya han bû û peywendiyên din wekî maliyat û tarîfe (barane) gelek caran serûberiya wan nehatibû diyar kirin. Li gor vê, ev rewşa han radeyê girîng ji otonomiya ji bo serokayetiya eşîretan hatibû pêkanîn, ku di zemînê aborî û siyasî de peywendiyên xwe tenê bi endamên eşîretê re bidin domandin. Bingehê xurtbûn û desthilatdarî di saya ronîkirina rewşa xwedîtiya ax û malbatê hat parastin û giyan dayê ku ew jî bûye sebebê sozpedana zêde ya qîmeta aborî ji endamên eşîretê re, ku wan jî bi dorê ve xercdan û parastina çekdar û destûpewendên serokan pêk dianîn. Ev peywendiya sêalî ya di navbera dewleta Îranê, serokeşîretên kurdan û endamên eşîretan de tiştêkî taybedmendî yê Kurdistanê tenê nebû, ji ber ku nimûneke giştî bû li hemû navçeyên eşîretnişîmî yên li Îranê(13). Li gel vê jî, ya peywendiya dewlet û eşîretan li Kurdistanê (ji ciyên din) cihê dikir, rewşa lêhatî ya stratejiya herêmê bû ku sinorê wê ji axa Osmanî vedigeriya û cîran bû. Dewleta Osmanî bi nexden di sala 1514an de, bi lihevhatineke siyasî-eskerî bi mîrnişînen serekî yên kurdan re, ku bi awakî zêde ji hewl û astengên Sefewiyan ên ji bo berhevkirina kurdan di merkezekê de û şîekirina wan ketibûn nav tirseke mezin, beşek mezin ji herêma kurdî li ber axa xwe xistibû. Sozdana otonomiya siyasî û azadiya dînî ji aliyê osmaniyan ve, ku mîrên kurdan layengirî û piştivaniya xwe biguherin, tesîr kiribû. Hukumetên Îranê yên di pey vê de, careke din ji nû ve bi rûdana vê tecrubeya han a tehl ditirsan û ev tirsan han jî sebebê serekî bû ji bo jinavbirin û hilweşandina bi lez a ew mîrnişînen kurdan ku hê mabûn. Her wiha awayekî nû yê parastina hêminî û girtina wan di bin çav de bû, ku bi riya çarçoveya siyasî ya eşîretan dida meşandin, ku piştî sala 1514an pey ve gav bi gav ciyê mîrnişînan girt.

Li gel vê jî, dewleta Îranê heta radeyek helwesteke cihê li hemberî eşîretên kurdan nîşan da. Ew, li gor eşîretên din ên ku di Îranê de bûn, ketin bin kontroleke siyasî ya girantir û kontroleke darayî ya sist û hêmintir(14). Armanca serekî ya vê siyasîetê ew bû, ku di peywendiyên li ser sinor ên bi dewleta Osmanî re piştivaniya eşîretên kurdan werbigire, vê di eynî wextî de pêşî li wê jî digirt ku konfederasyonên mezin û bidesthilat ên eşîretî li Kurdistanê Îranê çênebin. Ew konfederasyon kevirê xîmî yên çarçoveya siyasî yên mîrnişînen kurdan û çavkaniyên hêza wan ên eskerî bûn.

Ger cardin peywendiyên rojane yên di navbera dewleta Îranê û eşîretên kurdan de heta dereceke zêde bi mîzana hêzên siyasî û eskerî yên di navbera wan ve girêdayî bû, (lê) di demên pişt re siyaseta dewleta Îranê tesîreke berdewamî li ser guherînên bingehîn û rêbaza siyasî ya eşîretan di siyaseta kurdî de hişt. Tedarik û amadekirina peyade û revdên siwarî yên eskerî ji bo dewletê di çarçoveyek qalibê siyasî ya merkezî de tenê rola serokatîya eşîretî ya kurd nebû. Ew valatîya hêzî ya ku piştî têkdana mîrnişînên kurdan di merkeza bajarên kurd de jî peyda bûbû, ji aliyê serokatîya eşîretî ve hat tîjî kirin. Serokeşîretan kirin fermanrewayên xwecî û bajarên kurdan bûn ciyê textê desthilata eşîretî. Li gor vê, ji bo bi hêzkirina çarçoveya xwe ya siyasî û îdarî ya nîvtemam, bi tesîra dejenerasyona pêşveçûna kulturî di merkezên bajaran de peywendiyên orf û adetî û destpêkî berdewam bûn. Ev kirin û rewşa han heta dawîya sedsala 19an berdewam bû, dema ku hukumeta Qacar, ku rastî asteng û kêmasiyên siyasî û aborî yên nikarîbû xwe jê biparêze hat, ew siyaseta da pêşîya xwe ku ciyê pey serokeşîretan leq bike û endamên malbatên fermarewayan li ciyê wan deyne. Ne dût e qismek ji vê siyaseta ji ber sebebê hêminiyê, bûye wekî bersîvek ji bo tesîra ku tevgera Şêx Ubeydullah di pey xwe de hiştibû û beşeke wê jî ji bo berdewamkirina firotina desthilat û karbidestî ku êdî bûbû kirineke tabî ji bo telafîkirina hatina kêmbûyî û îflasa dewletê. Sebebê vî karî çî dibe bila bibe, siyaseteke bêzirav û nexweş bû. Vê, ew rewşa aloz û şerpezetîya bêqanûnî û zulum ku di meydanê de hebû hê jî xerabtir kir. Fermanrewayên Qacar, xelkên ji derve bûn û tu pêgeheke wan a li ser hêzên xwecî tunebû û xwedî nifuz jî nebûn. Wan bi ser ew cure bajaran de hukum dikirin ku heta dereceyeke zêde di bin desthilat û kontrola siyasî û aborî ya eşîretan de bûn, ku bê dilê serok û bê hevkarîya wan çerxa karê hukumetê ji ger diket û disekinî. Ji ber vê yekê, fermanrewayên Qacar, dest pê kirin serokên navçeyan li dijî hevûdu bikar bînin, ji bo ku desthilata xwe ya kêmtaqet biparêzin -kirinek ku bi temamî wê demê tesîra xwe nîşan da, hilkirina agirê şoreşa meşrutiyetxwaziyê bû.

Handerê beşdariya serokeşîretan di destpêka meşrutiyetê de li dijî siyaseta şoreşê, bêguman heta dereceyeke zêde ji ber armanca tradîsyonî û daxwaza danevejandina rewşa borî bû. Ev, hewlek ji bo parastin an zindîkirina otokrasiya feodalî bû ku di muddetê ew çarsed salên borî de mil dabû ber hêz û îmtiyazên wan. Hewlek ji bo parastina wê bingehê di meydanê de bû ku ji bo xwediyên ax ên li derveyî bajêr û destketiyên serokatîya siyasî yên di bajaran de ku ji kîsê wan çûbû, vê wisan li wan kiribû ku ew bikevin nav rewşeke xerab û karekî bikin. Babetên wekî parastina kurdan, huwiyeta etnîkî û mafên wan, niha di belgeya Qanûna Esasî û di daxwazên resmî yên hukumeta meşrutiyetê de ketibûn ber siya mefhuma (konsept) giştî ya huwiyeta îranî (û ew) di bingeh de ji derveyî têgihîştinî û nêrîna serokatîya eşîretî bûn. Di dema meşrutiyetê de hişyariya neteweyî ya serokatîya siyasî ya

civaka kurd tunebû.

Li gel vê jî, hukumeta meşrutiyetê, mijûlê şer û xweragirtina ser piyan bû, berî ku di dawiyê de di saya hukmê hakimiyeta Pehlewî ya berî jê bide birin û bixeniqe, rewşa bûyerên piştî şoreşê ruhê demokrasiyê ji qalibê qanunen wê firandin. Rêketina siyasî ya di navbera xwediyê milkên mezin û sermayeya bazirganî û hevkarîya çalakî ya di navbera rewşenbîrên tradîsyonî û nûxwazan di zemînê siyasî û îdeolojî de, ku bûbû mildaneberê serkevtina tevgera meşrutiyetxwazî, demeke dirêj nekêşa. Ev rêketina han bi awakî zû piştî hewlê dawîn ê otokrasiyê yê ji ser barkirina Qacar û piştivaniya hindur û derve ji bo damezirandina rejîma berî sala 1912an, ji aliyê hêzên meşrutiyetxwazî ve hat şikandin. Dijîtiyên li ser hêzên di navbera çîna xwedî milk û burjuvaziya bazirganî û belavbûna wan cure dijîtiyên siyasî û îdeolojîyê di nav rêzên hinek ji rewşenbîrên tradîsyonî û nûxwazan de ku hê aktîv bûn, bi awakî bi tesîr pêşî bi avabûn û xweasêkirinî da û dezgehên desthilatê yên dewletê di welat de girtin destê xwe. Hewil û têkoşînên bêsekin û dubare yên ji bo sazkirina leşkerekî nû, sistemeke yekgirtî ya malîyatê, xwendin û perwerdeyeke giştî û layîk biserneket û şikest. Hukumet ji rewşa ku danîbû derxist dereceyeke hê aktîvtir ku santiralîzma ax pêk bîne, ku ji bo tesîrkirin û bikaranîna serwerekî tekane di welat de pêwîst bû. Ew qalibên nû yên wan dezgehên ku hebûn, ji bo sazkirina huwîyeteke yekgirtî ya îranî xwediyên wê naverokê nebûn ku piştivanî bi cereyanên siyasî û kulturî bikin. Şoreşa meşrutiyetê hemû nîşanên şoreşeke neçalakî û xweparêzî pê ve dihatin dîtin, bi wî awayî ku Gramşî şoreşa pasîv dida nasandin.

Biserneketina damezirandin û xurtkirina muesseseyên desthilata dewletê, bû sebebê ji heddê xwe zêde têkelhevîyên siyasî û civakî. Dema ku Îran bi temamî bêyî dilxwazî hat kêşan nav Şerê Cihanê yê Yekem, ev têkelhevî û birîna han hê kûrtir bû. Bi vê yekê Kurdistan bû meydan û şergeha şer û qirênên hêzên li dijî hev. Hêzên tirk, Rusya û Brîtanayê êrîş kirin ser wê axê, her yek ji wan beşek jê bi serê xwe an bi hev re girtin û ev problem bi xwe re hilweşandina desthilatê, muesseseyên rêvebirinî û sekna berhemanîna ziraet û bazirganî di herêmê de bi xwe re anî(15). Şerpezetiya vekirî ya ji hesabê der ya civakî û kirîza aborî, bi awakî aktîv bû sebebê nerehetî û sarîtiya herêma kurd û merkezê û bi vî awayî meydan ji bo geşbûna agirê yekem a serhildana serekî ya kurdan li Îranê amade bû.

Îsmail Axayê Şikakî, serokê Qebîleya Ebdoyî ya girêdayê Federasyona Şikakan, ku zêdetir bi navê “Simko” hatiye naskirin, dest bi rêvebirîya tevgerê li dijî hukumeta Îranê kir. Ev hereketê han bi awayên cuda cuda wekî tevgerê netewayetî, tevgerê otonomîxwazî, tevgerê eşîretî, yan jî di ciyan de têkelhevî û astenga ji bo talan û şelandinê hatiye binav kirin. Danenasîna tevgerê wekî hereketekî nasyonalîstî û cudatîxwazî çî ji aliyê

nehez û çî jî ji aliyê hezkerên wê ve xaleke muşterek e û yekîti li ser heye û her wiha perspektîva zêdetir newekhevî ya hesibandina wê weke tevgereke eşîretî û çeteyî ye(16). Ev danenasîn û navlêkirina cihê cihê ya tevgerê û nêrînên awa awa yên di derheqê karakterên armancên wê de, di dereceya yekem di derheqê kokê wê de, gelek av hildigire, ku dîroka siyasî ya wî tevgerî û belgeyên ji gotinên serokê wê yên di firset û munasebetên cihê de di dest de ne û bi awayên cur bi cur tên tehlîl kirin. Di nav tehlîlên kurdan de, karakterê tevgerê û armancên wê ji nêzîk ve bi nêrîn û perspektîva wan ji bo nasyonalîzma kurd, peydabûn û geşesitandina wê ve hatiye girêdan. Vêca ji ber vê dîqqetek kêmlî ser bingehê wê yê civakî hatiye kêşan, rêxistina siyasî, awayê îdeolojî û armancên stratejiya hereketê bi xwe, di çarçoveyê firehtir a dîrok û siyaseta Îranê ya di wê demê de.

Bingehê civakî, rêxistina siyasî û serokatiya tevgera Simko bi awakî serekî eşîretî bû. Tebî'et û karakterê siyasî yê tevgerê, serokatiya wê û her wiha terefdar û beşdarên wê jî, bi temamî eşîretî bû: rêbiriyên çekdarî, talan û şelandina rûniştîyên bajar û gundiyan herêrnê, ew kurdên ne ji eşîretan: azerî, ermenî û asurî bûn. Wisan dixuyê ev berhevkirina hatinê û peydakirina peran ji bo aşî û hevpeywendiya eşîretan biparêze kirineke adetî û rîyeke aktîv bûye. Lê birek belge di dest de hene, ku çî jî aliyê nehezan ve û çî jî ji aliyê hezkerên nasyonalîzma kurd ve piştî xwe pê girê didin, îspat dikin ku serokatiya eşîretî û bi taybetî Simko bi xwe xwediyê bîra ruhekî nasyonalîstî yê ji bo Kurdistaneke yekgirtî û serbixwe bûye. Li gor gotina Mele Ehmedê Qizilcî (Turcanîzade), yê nivîskarekî Kovara Rojî Kurd ku di navbera sala 1919an 1926an de çend hejmarên wê li Urmiyê hatine çapkirin, ev bîrûbaweriyên wî carnî tê de weşandiye, ew kovar ku bi zaravayê Soranî derdiket, bikarhatina herî fireh a zimanê kurdî wekî zimanekî resmî di Kurdistana Îranê de nîşan dide(17).

Ger çendîn ji aliyê serokayetiye ve bîrûbawerîya Kurdistaneke serbixwe û yekgirtî hatiye ziman, (lê), tu şik tê de tune ku ev bîrûbawerîya han xwediyê armanca stratejiyê (dûr û dirêj) ya tevgerê nebûye. Nêrîn û helwestê siyasî yê Rojî Kurd wekî tê gotin, heta dereceke zêde konsept û bingehê siyaseta demokrasiya gel, ku karakterên diyarkirina nasyonalîsta modern li ba wan nenas bûye, bi ber vê re ev cure (diyarkirinên han) ji danexuyakirin û zehrê rewşenbîrên kurd ên di qonaxa dawî ya Osmanîyan de heta tu bêjî belav bûn. Dîroknivîsiya nasyonalîstî ku li dijî bi vî awayî danenasîn û binavkirina tevgerekî ye, ku tenê bi paldana xeyal û kirinên serokayetiya wê, ku li hemberî desthilata merkezî serî hildane, li ber situ netewandine û şerê cenga nûnerayetiye li Kurdistanê qebul kirine, bêyî ku piçek jî be behsa awayî îdeolojî û armancên stratejiya (wê tevgerê bikin) û ew tehlîl bikin. Bîrûbawerîya neteweyê kurd wekî (neteweyekî) serbixwe û bi babetê prosesî siyasî rizgarîxwazî û serbixweyî, bi awakî eşkere di diyarkirinên siyasî yên serokayetiya eşîretî de wenda bû û

diyar nebû, çî di beyanname û çî jî ragihandinên dîplomasî de, di eynî wextî de ew cure (fikir) di guherînên dîroka Kurdistanê û herêmê de demeke dirêj hebû, wisan dixuyê pelege li ser îtibara nasyonalistî ya tevgerê û eger (ew pênasandinî jê nexweşe). Wendabûn û diyarnebûna vî milê herî girîng, îşar ete ji bo dijîtiyeke bi gotinî ya binavkirina tevgera Simko wekî tevgerê nasyonalist. Ev dijîtiya han di wê de ye ku (eynî wextî) xebat li dijî zordariya neteweyetî tê kirin, (lê tevger) çî bi konseptê serweriya gel, mafê neteweyetî û rewayetî ya neteweyetî de kar nake. Ev dijîtiya han ji tebîetê tevgera Simko dirije, ku di bingeh de (tevgereke) eşîretî û otonomîxwazî bû.

Tevgera Simko, berî ku di sala 1925an de bi destê îstîbdada nûxwazî ya ku ji aliyê Riza Şah ve hatîbû damezirandin bê şikandin, qasek hezker û (layengir) di Kurdistana Îranê de ber bi aliyê xwe ve rakêşa bû. Riza Şah karîbû di riya çîbîckirina problema desthilatê bi qazanca hêzên tradîsyonî ên civakî û siyasî, ku ji aliyê hejmareke zêde xwedî milkên mezin û mirovên dîni yên kevneperest ve ji sala 1912an pê ve di meclîsê de nûnerayetiya wê dikirin, hêminî û hêwirî di welat de dabimezrîne(18). Tebeqeyên (stratum) bilind û burjuvaziya navîn bi îmkânên burjuvazî û piraniya rewşenbîrên lîberal ku nûnerayetiya radîkalî û pêşketinxwazî ya hereketê meşrutiyetxwazî kiribûn, niha hêzên xwe kiribûn rexê hêzên tradîsyonîyan. Serhildana hereketê radîkal ê civakî li Azerbaycan û Gêlanê, eynî wextî hereketê Simko li Kurdistanê, bi awakî aktîv yekîtiya lîberal-pêşketinxwazî li meclîsê ji ber hev hilweşandibû û ji hev cihê kiribû, hewcedariyeke zêde ji bo dewleteke merkezî ya bi hêz anîbû meydanê ku mîzana hêz a halêhazir bi qazanca hêminî û sebatê ketîbû nav bêsebatîyê, birêveçûna qanun û hêwiriyê rast bike. Dewleta Riza Şah, ku ji aliyê van awa grubên nu yên hêzan ve di warê siyasî de piştivaniya wê dihat kirin, di bingeh de rejîma xwediyê milkên mezin bû. (Ev rejîma han) bingehê desthilata xwe li ser berê sermayedariyê ya tradîsyonî danîbû û wê li gor bingehê nûxwazî xistibû kar. Ew bingehê ku wê tevliheviya ‘ecêb parastîbû, ji peywendiyên kelûpelî ya her di halê zêdeyiyê de bû pêk hatîbû, ku hêz û taqeta xwe ji xwediyên milk ên sermayedarên ax û proseseke pêş a berî sermayedariyê ya hêza kar a di rêkxistina berhemanîna ziraetê de bidest dixist(19).

(Dewama wê heye)

## JÊNOTÊN MAQALEYA 'EBBAS WELÎ

(”) Ev nivîsa han yek ji wan netîceyên projeya lêkolîna di derheqê ”The Politics of the Stateless Nations, The Kurds in The Modern Middle East” (”Siyaseta Neteweyên Bê Dewlet, Kurd Di Rojhilata Navîn de”) de ye ku niha ji aliyê nivîskar ve xebat li ser tê kirin. Ev projeya han di meha Tebaxa sala 1994an de ji aliyê Şuraya Lêkolînî ya Aboorî û Civakî li Britanyayê (Economic and Social Research Council in Britain) alîkarî jê re hatiye kirin. Nivîskar ji alîkariya ESRC a di vî warî de jê re hatiye kirin gelek sipas dike û hêvî ew e ku di bin eynê

vê navê de di sala 1996an de ji aliyê I. B. TAURIS ve wek kitêb bê weşandin). (Ev lêkolîn di meha Nîsana sala 1996an de wek kitêb hat weşandin- Z. Awci)

- (1) Wisan dixuyê ku behsa vê bîr û nêrîna han cara yekem ji aliyê BASIL NIKITINE ve hatiye kirin, ku ew çavdêrekî dilsoz ê guherînên Kurdîstana Îranê bû. Pişt re ji aliyê WADIE JWAIDEH ve di rêza xwe ya doktorayê ya nehatiye çap kirin a gelek biqîmet de hatiye behs kirin: "THE KURDIISH NATIONALIST MOVEMENT: ITS ORIGIN AND DEVELOPMENT", SYRACUSE UNIVERSITY 1960 ("Hereketê Neteweyî yê Kurd: Bîngê û Pêşveçûn" Unîversîteya Syracuse, 1960, ev di dawiyê de bûye çavkaniyek serekî ji bo diyarkirina helwestên van guherînan. Wêkê nimûne: "ROBERT OLSON, THE EMERGENCE OF KURDISH NATIONALISM 1880-1925, TEXAS UNIVERSITY PRESS 1989". (Robert Olson, Serhildana Nasyonalîzma Kurd 1880-1925, Weşanên Unîversîteya Teksase 1989).

Zanayên kurd bîngê hereketê neteweyî li Îranê gelek caran dibin digihînin hereketê Şêx Ubeydullah, wêkê nimûne binêre: "ABDUL RAHMAN GHASEMLOU, KURDISTAN AND THE KURD; CZECHOSLOVAK ACADEMY OF SCIENCE, PRAGUE 1965".

(Ebdurrehman Qasimlû, Kurdîstan û Kurd, çapa Akademiya Zanistî ya Çekoslovakayê, Prag 1965).

Kemal MEZHER EHMED, KURDISTAN DI SALÊN ŞERÊ YEKEM YÊ CÎHANÊ DE, STOCKHOLM 1990.

- (2) Konseptê "şehriwend" (hevvelatî), di zîmanê farisî de bi nisbeta avahiyên nû ye. Ev "bêje" ya han di sala 1960an de ji aliyê edebiyata gelî ya demokratîk û çep ve hat bikar anîn û her ji wê demê ve ye ku di diyarkirinên siyasî û huquqî yên Îranê de cîyê xwe girtiye. Ji Qanûna Esasî ya sala 1905an a Îranê re "Itba'î Padşah" dihat gotin, lê ew mebest ji maf û erkên xelkê pêk dihat ku bi tabî bi konseptê hevvelatî ya teoriya demokrasiyê ve dihat girêdan. Ji bo wergereke îngilîzî ya Qanûna Esasî ya sala 1905an binêre: E. BROWNE, THE PERSIAN REVOLUTION OF 1905-1909, CAMBRIDGE UNIVERSITY PRESS 1910.

- (3) Bi gelemperî tê diyar kirin ku Şêx Ubeydullah yekem nasyonalîstê kurd e, piştgiriya bîra neteweyekî yekgirtî yê kurd kiriye ku di Kurdîstaneke serbixwe û yekgirtî de bijîn. Ev bîr û nêrîna han bi giştî bi şahidiya nameke Şêx ku gelek caran behsa wê hatiye kirin, di meha kanûna paşî ya sala 1880an de ji bo CLAYTON ê cîgirê konsolosê Brîtanayayê yê li Başqelekê re şandîye, pişt lê tê girêdan. Di wê nameyê de Şêx wiha dibêje: "Kurd neteweyekî cihê ye" û dide xuya kirin û dibêje ku: "em dixwazin kar û barên me di destê me bi xwe de be" (Binêre: OLSON, rûpel: 2). Li ser vê, cîgirê konsolosê Brîtanayayê digihîje wê qene'etê û bifikire ku Şêx: "xwediye planeke pîralî ya ji bo yekîtiya hemû kurdan a di nav dewleteke serbixwe û di bin serokatiya wî de be". Nameya CLAYTON ji bo TROTTER, Van, 27ê çirya pêşî ya sala 1880an, Tîrkiye, hejmar: 5, 1891, rûpel: 33, JWAIDEH, di nivîsa xwe de behsa wê kiriye. Her wiha binêre: "G. CURZON, PERSIA AND THE PERSIAN QUESTION, LONDON 1892" (G. Curzon, Îran û Problema Îranê, London 1892).

Lê, eger Şêx Ubeydullah wekî pîrê nasyonalîzma modern ê kurd bê hesêb kirin an ne, heta radeyek zêde bi wê ve girêdayî ye ku nêrîna mirov a di derheqê mefhuma netewe, huwîyeta neteweyî û nasyonalîzmê de çîye ve girêdayîye. Di derheqê nêrînên cihê yên li ser mefhuma neteweyê kurd û nasyonalîzmê de, binêre nivîsa min a dê nêzik de bê belav kirin: "ABBAS VALI, GENEALOGIES OF THE KURDS: NATIONS AND NATIONAL IDENTITY IN KURDISH HISTORY WRITING ECONOMY AND SOCIETY 1995.

("Çêbûna Dîroka Nasyonalîzma Kurd", Kovara Economy-Society 1995.

- (4) Kitêba Emîrî Hesênî: AMIR HASSANPOUR "LANGUAGE AND NATIONALISM IN KURDISTAN, 1918-1985", 1992.

("Li Kurdîstanê Zîman û Nasyonalîzm 1918-1985", 1992. Ev berhemê han baştirîn kitêba bi belge û karê pîralî ye ku di derheqê derketin û pêşveçûna diyarkirina edebiyat û siyasî li Kurdîstanê de, ku di vî warî de dide xuya kirin.

(5) Nivîs û diyarkirinên nasyonalistî ên dîrokî îddî'ayê beşdariya girîng a kurdan di siyaseta nasyonalistî û domokratîk a wê demê de dikin. Lê çî heye bîr û nêrînên wan ên di derheqê sebebên serekî yê beşdariyeke bi wî awayî heta em bixwazin ji hev çihê ne. 'Ebdulcebbar Mehmûd Cebbarî dibêje ku: rûniştîyên navendên serekî yê bajarên Kurdistanê bi awakî çalakane beşdarî di herekerê meşrutiyetxwazî de kirine û li Mahabad, Seqiz û Sineyê di navbera salên 1905-1911an de, encumenên şoreşgerî pêk anîne. Ew gotinên xwe didomîne û bi wî awayî dibêje: Ce'fer Axayê Şikakî yê birayê Simko yê mezin, di çarçoveya dewleteke meşrutî ya Îranê de ji bo otonomiya kurdan xebat dikir Di wî warî de binêre kitêba: Dîroka Rojnamegeriya Kurd, Kerkûk 1970, rûpel: 136. Lê ji bo îspata van nêrînên xwe tu belge nade nişan. Qasimlû ji beşdariya fireh a kurdan di siyaseta şoreşgerî ya di muddetê serdema meşrutiyetxwazî de îşaret dike, behsa damezrandina encumenan (komeleyên şoreşgêrî) di merkeza bajarên serekî yê wekê Mahabad, Sine, Kirmaşan û her wiha behsa serhildana otonomîxwazî ya Ce'fer Axayê ya li derûdora Urmiyê dike. Gotinên Qasimlû gelek ji yê Cebbarî bi tefsîlattir in. Ew dibêje ku: Encumena Mahabadê ji aliyê Qazî Fettahê mamê babê Qazî Mihemmed ê Serokkomarê Komara kurtremen a Mahabadê ya salên 1945-46an ve rêvebirîya wê hatiye kirin, ku di dawiyê de bi destê leşkerê Qeyserî, ku di sala 1915 an de bajarên dagir kirin, hat kuştin û her wiha dibêje ku: Şoreşgerên Kirmaşanê nêzikê deh encumenan di bajêr de pêk anîbûn. Lê Qasimlû ji bo hemû van gotinan û piştgirîya naveroka wan tu belgeyek nade dest (binêre: kitêba Qasimlû, wergera inglîzî, rûhel: 44).

Bîr û nêrînên JWAIDEH ên di derheqê beşdariya Qazî Fettahî di herekerê meşrutiyetxwazî û kuştina wî li Mahabadê bi destê leşkerê Qeyser wekê yê Qasimlû ne (binêre: rûpel: 757,758). Lê ev herdu çavkaniyên han jî ew tiştên piştî xwe pê girêdane, belgeyên tesdiqkirî yê ji bo van xalên taybetî tê de nîne.

B. NIKITINE, LES KURDES, PARIS, P. 36.

Nivîsek farisî ya ji qelema N. Pêşyan a bi navê: "Mergbud w Bazegesthem bud" (Mirin jî Hebû, Zivirîn jî Hebû) Tehran 1947, rûpel: 152".

(6) Di wan kitêbên ku di derheqê dîroka serdema meşrutiyetê hatine nivîsandin de, beşdariya çalakane ya serokeşîretên kurdan di siyaseta dijê şoreşê de bi firehî û bi belge behs kirine. Wek nimûne binêre: A. Kesrewî, Tarîx Meşrutiyet Îran, Tehran 1961 û M. Malikzade, Tarîx Inqilab Meşrute Îran, Tehran 1949, cild: 5. Ev beşdariya han di van nêzikahîyan de ji aliyê DAVID Mc DAWALL di kitêba xwe ku dê di rojên bînan de bê weşandin, bi belge îspat kiriye. DAVID Mc DAWALL, A MODERN HISTORY OF KURDS, I. B. TAURIS 1996. (Kitêb hatiye weşandin. Z. Avci)

(7) Her çendî hinek ji malbatên serekî yê kurd ên wekê Erdelan, Dêbokrî û Feyzullabegî beşek ji desthilat û nîfuza xwe di saya peywendiyên xwe yê xurt ên bi merkezên desthilatên siyasî yê Tebrîzê, Îsfahanê û Tehranê bi dest xistibûn, lê pozîsyona wan di bingehê desthilata herêmî de ku wan peywendîyan xurtir dikir û diparast, bi dereceya yekem ne'îceya rasterast ya helkeftên wan di çarçoveya mîrektî yan konfederasyona eşîretî de bû.

Mîrnişînan kurd di eslê xwe de struktûra siyasî ya konfederasyonan bûn ku hêzên eskerî yê eşîretî piştgirê wan ên serekî bûn. Lê konfederasyonên eşîretî bêtir li ser esasê bineçek û xizmayetiye hatibûn damezrandin.

Îzahkirina (şîrovekirina) WALTER SMART ê konsolosê Brîtanyayê yê Tebrîzê yê di sala 1910an de, di derheqê muesseseyên birêvebirî yê siyasî û darayî yê di serdema meşrutiyetê de çavkaniyeke hêja ye, bi taybetî ji bo peywendiyên di navbera hukumeta merkezî û çîna xwedî milk a kurd û serokeşîretan de binêre: belgeyên Wezareta Kar û Barên Derve, F. O. 371)953, nameya SMART ji bo BARCLAY, Tebrîz, 3yê kanûna paşî 1910, ji BARCLAY ji bo GRAY, Tehran 23yê kanûna paşî 1910, bîranîna hejmara yekê. Her wiha binêre: G. CURZON, Op, cit, VOL II, PP 470-472 P. 492. G. Curzon jî behsa di navbera perîşanî û bêserûberîya hukumeta merkezî li Tehranê û wilayetên kurdan dike. Ew wiha dibêje: eşîretên kurdan di ciyê amadebûna xwe ji bo xizmeta leşkerî erd didan û ew yeka ku hukumeta merkezî di rojên borî de ji bo ku li dijî mîrektiyên kurdan bikar bîne bi çalakane destê xwe piştî eşîretî de anîye. Ev herdu çalakîyên han jî aliyê Mc DAWALL ve hatine îşaret



kirin. Ez sipasiya xwe ji McDAWALL de didim diyar kirin ku rê da min ez li tekstê nivîsa kitêba wî ku dê rojên bê bê weşandin binêrîm.

(8) Di derheqê vê xalê de li kitêba Hesênpur binêr. Lêkolîna bi hişyarî û bi qîmet a Hesênpur, di berbîpêşveçûn û guherandinên edebî û kulturî di beşên cihê yê Kurdîstanê de zemînek baş e ji bo lêkolîna muqayesekirina berbîpêşveçûna kulturî û rewşên bîrî li ser erdê kurdên Iraq, Îran û Tirkîyê di sala 1918an de.

(9) Peywendîya aloz a di navbera bîngêhê eşîretî û bîngêhê rêxistinî ya desthilata siyasî bi awakî tefsîlî ji aliyê BARTH û VAN BRUINESSEN ve hatine kirin. Ji bo vê binêr: F. BARTH, PIRINCIPLES OF SOCIAL ORGANISATION IN SOUTHERN KURDISTAN, OSLO 1953 (F. Barth, Bîngêhê çarçoveya Civakî Li Xwarê Kurdîstanê, Oslo 1953).

M. VAN BRUINESSEN, AGHA, SHAIKH AND STATE: ON THE SOCIAL AND POLITICAL ORGANISATION OF KURDISTAN, ZED PRESS 1992. (M. Van Bruinessen, Axa, Şêx û Dewlet, Rêxistina Civakî û Siyasî ya Kurdîstanê, Zed Press 1992).

Kitêba C. J. RICH, NARRATIVE OF A RESIDENCE IN KURDISTAN, LONDON 1836, 2 VOLS. (Serpêhatiya Demek Li Kurdîstanê, London 1936, du cild). Ev çavkaniya han a hêja di derheqê dema sedsala 19an de ye û bi taybetî di derheqê rewşa di navbera eşîretan, mîrektiyên kurdan, rêxistinên îdarî û siyasî de ne.

(10) Di vî warî de binêr: A. K. S. LAMBTON, 1882-1946an de, çi bi awayê desthildanî û çi ji bo xweparastinî be, (li gor perspektîva nivîskarên kurdan) bêtir li ber çavgiirtina bîngêhê civakî, rêxistina siyasî, çarçoveya îdeolojî û armanca stratejiyên wan, ew nasyonalîst dihesibînin(1).

Ev lêkolîna han a berdest, wê perspektîva dîrokî ya di derheqê peydabûn û vejîna nasyonalîzma kurd di Kurdîstana Îranê de û mefhuma (konsept) bîngêhin (essentialist) ya neteweyê kurd ku ew nerîn li ser hatiye danîn radixe ber çavan. Lêkolîn, wê gotinê tîne meydanê ku PEASANT IN IRAN, LONDON 1953. (A. K. S. Lambton, Xwedî Ax û Gundî Li Iranê 1953). Ji bilî ve xebata min: ABBAS VALI, PRE-CAPITALIST IRAN: A THEORETICAL HISTORY, LONDON 1993. (Ebbas Welî, Irana Berê Semayedariyê: Teoriyek Dîrokê, London IB TAURIS 1993) Bi taybetî benda heftan.

(11) Ger çendin em bîngêhê tevayî yê rûniştîyên Kurdîstanê yê eşîretî di muqabilê ne eşîretan de nizanin, lê ew belgêyên di dest de nin didin nîşan ku hejmarek xuya ji rûniştîyên kurd ne eşîr et bûn (binêr: ew çavkaniyên li jorê yê F. Barth, Van Bruinessen ku behsa wan hatin kirin). Li gel vê jî, vê nivîsa han di dereceya yekem de bal kêşaye ser rûniştîyên eşîretî, çunkî her wekî ew behsa han eşkere dike, rêxistina eşîretî bîngêhê herî xurt û aktîv e desthilata siyasî pêk dianî. Serokên eşîretan, bi hêsani hêz û desthilata xwe bi ser rûniştîyên ne eşîret li bajaran û gundan teşîs dikirin û pêşde dibirin. Struktura civakî-aborî ya civata eşîretî nebû û bi giştî çarçoveyek wan a siyasî tunebû ku bikarin serî bi eşîretan re derbixin. Dereceya nezelaî û piraniya astengên ku bi serê hinek ji malbatên mîrzade yê wekê Eşîreta Erdelan dikevin berçav, di çarçoveya desthilata siyasî di Kurdîstanê de, ximê wê nakole û sist nake.

(12) Bi darêzore têkdana mîrektiyên kurdan, berê ku Sefewî desthilat bigrî destê xwe dest pê kiribû û bi taybetî piştî "Şerê" Çaldîranê yê di sala 1514an de xurtir bû. Di vî warî de binêr: J. E. WOODS, AQQOYUNLU: CLAN, CONFEDERATION, EMPIRE, A STUDY IN 15th/9th CENTURY TURKO-IRANIAN POLITICS, MINNEAPOLIS/CHICAGO, BIBLIOTECA ISLAMICA 1976. (J. E. Woods, Aqqoyunî: Konfederasyon, Împaratoriyet, Lêkolînek Di Derheqê Siyaseta Di Navbera Tirk-Îranê Di sedsala 9/15an de. Minneapolis/Chicago, Kitêbxaneyê Islamê 1976).

A. ALLOUCE, THE ORIGINS AND DEVELOPMENT OF OTTOMAN-SARVID CONFLICT (906-962/1500-1555), BERLIN.

Ji bo agahdariya di derheqê Dewleta Sefewî û Kurdan de binêr: Lêkolîna girîng (ger çendin kitêb heta dereceyek bêserûber be jî) a Iskender Begê Monşî.

HISTORY OF SHAH ABBAS THE GREAT, TRANSLATED BY: R. M. SAVORY, BOULDER

1978, 2 VOLS. (Dîroka Şah Ebbasê Mezin a ji wergera: R. M. Savory Boulder 1978, 2 cild). Çavkaniyên di derheqê bingehê siyasî û çarçoveya rêvebiriyên mîrekiyên kurdan ên di Kurdistana Îranê de gelek kêman in, lê li gel vê jî, ew çavkaniyên di dest de nin, ên di bin re hinek lêkolînên tefsîlî û ronî yên dîrokê tê de nin ev in:

Mah Şerefxanim Qadirî (Mestûre Kurdistanî) Tarîx-ê Erdelan, Tehran 1343.

Şêx Mihemed Merdux, Tarîx-ê Kurdistan, Tehran 1346.

Mîrza Şukrullah Senendecî, Tehfe-i Nasirî: Der Tarîx w Coxrafayê Kurdistan, di bin çavdêriya H. Tebibî, Tehran 1366.

Ev çavkaniyên han, bi taybetî jî ya Qadirî û Senendecî, peywendiya wan bi Mîrekiya Erdelan, serhildan, berbipêşveçûn, guherîn û hilweşandina wê ya di dewra Qacaran de heye. Xebata Senendecî, bi taybetî di vî warî de balkêş e, çûnkî hilweşîn û jiberhevketina vê mîrekiya han di qonaxa dawî ya hukumeta Nasireddîn Şah de, sebebê wê zêde nabe ser dijminayetiya merkezê, belko sebebê wê dibe digihîne ezîyet û perçiqandina zêde ya hindurî û rizîbûna rêvebiriya mîrekiyê. Ji bo lêkolînek giştî ya di derheqê bingehê siyasî û rêvebiriya Kurdistanê de, li kitêba M. VAN BRUINESSEN û C. J. RICH ku li jorê behsa wan hatin kirin, binêre.

(13) Ji bo analîzek bi tefsîlat û zelal a teoriya di derheqê bingehê desthilata siyasî û peywendiya di navbera konfederasyona eşîret û dewletê li Îranê, li beşa 5an û rûpelên 155-161an a kitêba Welî ya li jorê behsa wê hat kirin binêre. Her wiha binêre: kitêba M. VAN BRUINESSEN benda 2, 3 û nivîsa wê ya di kitêba R. TAPPER (di bin çavdêriya R. Tapper de) de hatiya çap kirin. THE CONFLICT OF TRIBE AND THE STATE IN IRAN AND AFGHANISTAN, LONDON 1983 (Dubendiya Eşîretî û Dewletê li Îran û Afganistanê, London 1983).

(14) Binêre çavkaniya ku di jêrenota 7an de behsa wê hat kirin.

(15) Wêrankerî û şewatên Şerê Cihanê yê Yekem ên li ser Kurdistanê, di kitêba Kemal Mezher Ehmed de bi ronî û zelal hatine behs kirin. Her wiha binêre: ew beşên di kitêba JWAIDEH de ku peywendiya wê bi vê behsê ve heye.

(16) Wek nimûne: hem Kesrewî yê nehezêkî Îranî yê nasyonalîzma kurd û hem jî Qasimlû yê pêşengekî nasyonalîzma kurd li Îranê, Simko wekî nasyonalîstekî kurd didin nasîn û ew îtibar didinê ku fikra damezirandina dewleteke serbixwe ya kurd di mejiyê wî de hebûye. Li gel vê jî, ji bo Kesrewî nasyonalîzma modern, çî ya kurd çî yê din wek kufir bi wî awayî ye û ew vê fêd û dolabên kevnare yê Ewropayê yê jî bo holêrakirina rojhilatê dihesibîne. Vêca ji ber vê, binavkirina Simko ji aliyê Kesrewî ve wekî nasyonalîst li gel nîrxandina nêrîna di derheqê hereketê de ya wekê eşîretî, rêbir û wêrankerî cihêti tê de heye. Bi eksê wî, Qasimlû, ji bo ruhiyeta nasyonalîstî ya nimûne, çav li karekterên eşîretî û wêrankerî ya hereketê digre û ji bo nîrxandina armancên stratejî û destkevtiyên hewlek nade.

Binêre: Kesrewî, Tarîx Hecdesaleyê, Azerbaycan, Tehran 1967, cild: 2, rûpel: 830-831.

E. Qasimlû, 1965, kitêba li jorê behsa wê hat kirin, di rûpelên: 72-73an de.

Ji bo analîzeke zêde û bêteref di derheqê hereketê Simko de binêre: Nivîsa M. VAN BRUINESSEN "Serhildana Simko", ew kitêba ku di bin çavdêriya R. Tapper de hatiye çap kirin, ku li jorê behsa wê hat kirin.

(17) Gotûbêja nivîskar a di destpêka salên 1970an de li Ebrîzê li gel Mele Ehmedê Tûrcanîzade (Qizilcî) ê hevkarê Rojî Kurd di navbera salên 1919-1926an de li Urmîyê, ku pişt re bû mamosteyê Fakulteya Edebiyatê ya Unîversîteya Ebrîzê, heta roja mirina xwe ya di destpêka sala 1980an, ji bo agahdariya zêde di derheqê wê rojnameyê de binêre: Hesênpûr 1992, ku berê derbaz bû. Cebbarî 1970 ku cardin li jorê behsa wî hat kirin. Her wiha C. Xeznedar, rêberê rojnamegeriya kurdî, 1973.

(18) Ji bo agahdariya di derheqê girtina desthilat û imkanên hêzên tradîsyonî û konservatîv û nûnertiya pişt wan di kontrola dam û dezgehên dewletê de binêre: E. ABRAHAMIAN, IRAN BETWEEN TWO REVOLUTIONS, PRINCETON N. J. 1992. (E. Abrahamian,

Îran Di Navbera Du Şoreşan de, Princeton N. J. 1992).

H. KATOZIAN, THE POLITICAL ECONOMY OF MODERN IRAN, LONDON 1981.  
(H. Katouzian, Aboriya Siyasî ya Îrana Modern, London 1981).

N. KEDDIE, ROOTS OF REVOLUTION, YALE UNIVERSITY PRESS 1981. (N. Keddie, Rayên Şoreşê, Weşanên Unîversîteya Yaleyê 1981).

Ji bo analîza piraî ya di derheqê guherîna terkîba civakî ya meclisa Îranê, binêre:

J. Şecî'î, Nimayîndegan Meclis Şura-i Milli Der Bîstûyek Dewre-i Qanun Gozarî, weşanên çapemeniya Unîversîteya Tehranê 1965.

(19) Di vî warî de binêre: benda heftan û netîceya kitêba min a di sala 1993an de hatî weşandin.

(20) Li gel vê jî, ev nayê wê me'neyê em bêjin ku, dewlet di zemanê Rîza Şah de ji bo tehdîda kurdan li ser hakîmiyeta "netewayetî", yekperçeyî û qahimiya axa Îranê destgirêdayî bû û hîs pê nedikir, an çavê xwe ji guherîna hêz wek sebebek pêşdexistin di çerçevaya santralîzma ax û nûkirina rêvebiriyê digirt. Bi eksê vê, lêkolînên nû yên akademîk didin xuyakirin ku dewleta Îranê hê ji berê salên 1920an ve di derheqê ew guherînên li ser axa kurdan a Dewleta Osmanî ya çîran de diqewimîn dudil bû û bi taybetî li hemberê nûneratiya kurd û raxistina pîrsa kurdî di Komeleya Gelan (Esbetû'l-Umem) de li ber çay destgirêdayî dima. Firuxî, nûnerê Îranê yê di Komeleya Gelan de, bi nîrxandina tehdîdek ku bi damezrandina dewleteke serbixwe ya kurd li ser erdê Osmanî ava bibe, pêşniyarê hukumeta Tehranê dike ku di ciyê zordarî, kuştina siyasî û inkarkirina huwiyeta etnîkî ya kurd de, siyaseta asimilasyona (helandina) kulturî bimeşînin. Di sala 1927an de, eynê Firuxî, dema ku sîrayeta hêz û radeya belavbûna hekeretê Şêx Seîd li Tirkîyê û bayê tesîra avakirina nêrehetîya kirinê Simko di herêmê de hejiya, tirs ket dilê wî, ku wê çaxê sefirê Îranê yê Tirkîyê bû, ji bo bi hev re rabûna li dijî hekeretê kurd, pêşniyara gavavêtin û tedbirên muştêrek ên Îran û Tirkîyê kir. Nameyên helbijartî yên nehêni yên Firuxî di kovara Yexma ya hejmarê 7an a sala sêyem, 1950/1329 û hejmarê 8an a sala duyem, 1958/1327an de belav bûne. Hesenpûr di kitêba xwe de van herdu nameyan bi tehlîlê wan ve çap kiriye. (Ew kitêba ku li jorê behsa wê hat kirin, 1992) Lê piştî xurtkirina bingehe hêz û desthilat di nîvê salên 1930an de, êdî Dewleta Îranê pêşî li hekeretê kurd bigre hewceyê hêzeke kêr bû. Jiçêkkirina eşîretên kurdan û nebûne rêxistineke siyasî ya ji bo karê kurd ku terefdarî û piştvanîyek wê ya girîng di merkeze bajarên serekî yên kurdan de hebe, ger çendin ji nav jî neçûbû, lê dehdîda kurdan li ser hêminîya siyasî ya dewleta îstîbdad, heta dereceyek zêde kêr bûbû û jê re astengek mezin nebû. Di sala 1937an de beşdariya Îranê di Peymana Se'adebadê de, ku mesela kurd di çarçoveya li dijî komunîzmê de kirin meseleke herêmî, nîşan û xuyakirina dirêjkêşana hîskirina bi nêrehetî û têkelheviyên di derheqê tehdîdên muhtemel ên etnisîteta kurd de, ku dikarîbû ji dewletê re peyda bike, eger hatiba şert û mercên herêmî ji bo karekî bi vî awayî li bar bûya.

# Bedirxan Beg (Bedirxan Paşa) - II

## Malmisaniy

Bedirxan Beg, birê wî yê mezin Salih, birê wî yê biçûk Esad û yê mezin yanzde salî sê kurên wî bo bajarê Kandiyê ya li Girîtê tên sirgûnkirin. (Ji her sê kurên wî yek Têlî Hamid yek jî Elî Şamil bû.) (74)

Bedirxan Beg "pêşî deh salan li Girîtê maye, di salên dawî yên 'Ebdulmecîd de (75) hatiye efû kirin û rê dane ku bê Stembolê. Ji ber karên ku li Girîtê ji dewletê re kirine [sala 1858-ê] (76) rutbeya mîrîmîrantî û unwanê paşatiyê dane." (77) Reşîd Paşa di rapora xwe de diyar dike ku eger Bedirxan Beg bixwaze ne li hêla Enedoluyê, lê bo nimûne li Rûmelî yan jî li Bosnayê (ne nêzîkî sînorên Bosnayê), ew dikarin wezîfeyeka dewletê bidinê.

Bedirxan Beg dîsa vedigere Girîtê û çend salên din –li gor hin serkanîyan heşt salên din (78)– li vir dimîne. (Di rapora Reşîd Paşayî de tê gotin ku Bedirxan Beg li ser hev hijde salan li Girîtê maye, rojnameya Kurdistan dibêje panzde, di kovara Ronahî de jî hatiye nivîsîn ku çarde salan li Girîtê maye.) (79)

Dema ku Bedirxan Beg li Girîtê bû, bawerî da hem misilmanan hem jî filehan û berî serhildana Girîtê, li Kandiyê û Hanyayê di şerê navbera fileh û misilmanan de rola aştkirinê list. Bo nimûne di bûyerekê de filehên Kandiyeyê li mala xwe parastin (80). Di dema îhtilalê de, ji bona ku nakokîyên nav fileh û misilmanan çareser bike, "wîlayetê daxwaz jê kiriye ku navçîtîyê bike û bi wan re bipeyive" (81).

Bînbaşî E. W. C. Noel dinivîsîne ku 200 peyayên wî pê re bo Girîtê hatine sirgûn kirin û van peyayan sala 1856-ê gava yûnanî li dijî osmanîyan rabûne, piştgiriya osmanîyan kirine û di şkandina serhildanê de roleka mezin listine. Hetta tê dîyarkirin ku ji ber van xizmetan padişah Bedirxan Beg efû kiriye (82).

Di nivîseke frensî de (83) ku sala 1865-ê hatiye nivîsîn, li ser Bedirxan Begî û helwêsta wî ya li Kandiyeyê (li Girîtê) weha tê gotin:

*"Di van tevlîheviyên Girîtê de ku ji ber rêveberîya çewt ya Welî Paşayî rûdabûn, sala 1858-ê kêma mabû ku Kandiyeya (Candie) misilmanên birçî û*

zendegirtî lê civiyayî, bibe sehneya tevlîhevîyên pir tirsnak. Tirkan gelek caran êriş biribûn ser filehan û rewş hatibû niqteyekê ku wan bi destan bixeniqînin. Li wir dikarîbû qirkirinek ji ya Cidde (Djeddeh) mezintir çêbibe. Li gor hemî kesên ku bûyerê ji nêzîk nas dikin, şanazîya pêşlêgirtina vê sehneya tirsnak, ya du mirovên egîd e. Yek jê karmendê konsilxaneyê frensî M[onsieur[ Hard e ku niha ne sax e û yê di jî Bedirxan Begê paşayê kurd e ku ev çend sal in li Kandiyeyê li sirgûnê dijî. Ev kesê he, demekî dirêj li beşekî Kurdistanê, birêkûpêkiyek ku berîwî nehatiye dîtin hakimiyeta xwe meşandibû û bi rastî jî yekî bi serê xwe bû; "qewas" ê min carna behsa xusûsiyetên wî yên hişkî bêrehmet ku yên qiralê Portekîzê Don Pèdre le Justicier tanîn bîra mirov, dikir. Rojekê li bajarê Wanê ku gelek caran lê dima, fermanek dabû ku kes nikare bi çek ji derîyekî bajêr têkeve hundir. Piştî çend rojan serokek bi yekîneyên siwaran ve tê Wanê; mirovekî nêzîk û yek ji xweşdivîyên Bedirxan Beg. Nobedarên li ber derî jê re çêlî fermana Beg dikin, ew dikene û dibêje fermaneka weha ne ji bo min e; serê her du nobedaran bi şûrê xwe difirîne û hildikişe hizûra Bedirxanî. Nobedarên din jî her di wê demê de digihin ba Bedirxanî û jê re dibêjin ku çawa guhdariya fermanê nehatiye kirin. Bedirxan Beg êdî naxwaze tiştêkî bibihîse û destê xwarziyê xwe ku pir jê hez dikir, ji qevdikê dide birîn; ev cezayê bicihneanîna îradeya wî bû. Dema ku cezayê destbirînê hat bicihanîn, Bedirxan Begî bi dilovanî û dilnermî pêşwazîya kesê ku cezayekî weha giran dabûyê, kir; gotinên rûmetbilindî û dîyarî pêşkêşî wî kirin. Ji ber guhnedana fermanê, cezakirina mirovekî nêzîk tirseka mezin xist dilên kesên din. Li qezayên ku ketibûn jêr desthilata wî dizî nemabû. Te dikarîbû kêsekî tijî zêr danî ser riyekê; kesî nediwêriya dest bidîyê; lê tevî vê jî kurd qet ji bo cîranên xwe tirsnaktir nebûn. Nestûrîyên wîlayeta Tor (Tauris) ji zû de bac didan Bedirxan Begî. Sala 1844-ê ji ber pendên bêaqilane yên mîsyonerên emrîkî, nestûrîyan nexwest bacê bidin û xwe amadeyî serhildanê kirin. Piştî çend mehan giş gundên wan xopan bûbûn. Yên ku ji şûrên kurdan rizgar bûn jî wek dîl bo çîyan hatin veguhastin.

Felaketa nestûrîyan li Ewropayê olaneka mezin da. Balyozxaneyê navîn ya emrîkî û balyozxaneyê mezin ya îngilîz ji ber vê felaketa ku mîsyonerên wan bûbûn sedem, pir êşîyan. Zor dan Bab-i Alî ku Kurdistanê vegirin û vê yekê bêceza nehêlin. Bedirxan Begî hingê li dijî paşayên ku dixwestin zora wî bibin têkoşîneka demdirêj û navdar da. Lê sala 1847-ê ji ber xiyaneta hin peyayên wî, hêzên ji yên wî pîrr xurttir zora wî birin. Piştî şkestinê bo girava Kandîye (Candie), girava ku dengvedana serketinên wî berî wî ghiştibûnê, hat sirgûnkirin. Rûmetbilindîya danûstandinên wî û prestîja wî ya pêbawer welê kir ku pir zû di nav civatê de bû xwedî desthilat. Gava bûyeran rû dan, ev desthilata xwe bi kar anî. Herçiqas ku wezîfeyeka resmî nedabûn wî û tu hêzên wî yên çekdar nebûn jî bi enerjîyêke bêwestan çû ba yûnaniyan, ew bi şîretên xwe yên maqûl hedimandin, tim di wext de xwe gîhand tirkan da ku

bi cesaretdayîn û gotinên xwe çekên wan -ên ku devê lûleyên wan dabûn filehên reben- ji wan bistîne. Li Kandiyeyê Bedirxan Beg hema bêje bû xwedîyê rola ku 'Ebdulqadirî wê piştî du salan li Şamê bilîsta; lê serdarê kurd kamûrantir bû: Yê ereb ['Ebdulqadir] çênd qurban ji destên celladan xilas kiribûn lê wî [Bedirxan Beg] rê li qetliaman girt.

*Tiştê ku rê da ku yekî wek Bedirxan Begî li welatekî bîyanî, di demekî tirsnak de bibe xwedî roleka weha payebilind, weha kêrhatî, ew bû ku bi serokatîya qonaxeka dirêj ewî hemû balkêşî û şîyana xwe dabû qabilîyetên xwe yên xwezayî; qumandarî, ceng, guftûgo, dilî û sirgûnê, mirov û bûyer pê dabûn nasîn; digel nermîyê bûbû xwedî karaktereka polayî û asoya wî fireh bûbû.*" (84)

Paşê, di heyamê Siltan 'Ebdul'ezîz de (85) Bedirxan Beg ji Girîtê vegeyriyaye Stembolê, li vir çend salan -li gor hin serkanîyan heft salan (86)- maye (qesra ku piştî vegeyriyê ji Girîtê, li Stembolê lê maye, paşê bûye Daruşşafaka) (87), dawîya dawî çûye Şamê û her du salên dawî yên jîna xwe li wê derê derbas kirine (88).

Herçend li gor hin serkanîyan Bedirxan Beg sala "1267-ê hicrî" [1850-1851] (89), "1867" (90), "1867/1868" (91), 1868 (92), 1870 (93), yan 1871 (94) miribe jî, ew sala 1286-ê hicrî/1285-ê rûmî (95) miriye ku ev jî dibe 1869-a (û yek du mehên pêşî yên 1870-yê) mîladî. Lewra dikare bê gotin ku ew sala 1869-ê miriye. Hinek dinivîsinin ku ew li Kandiyeyê (Candî) miriye, lê ev jî ne rast e (96). Bedirxan Beg li Şamê miriye û li goristana taxa Rukneddîn ya îro hatiye veşartin. Piştî gelek salan wê neviyê wî Celadet Bedirxan jî her li vê goristanê bihata veşartin. Li ser kêla Bedirxan Beg a 1286-ê, îro bi kurdî weha hatiye nivîsandin:

*"El-fatîha*

*Mîrê Cizîra Botan*

*Mîr Bedirxanê Azîzan*

*Rehmeta Xwedê li ser wî û li ser malbata wî bit."* (97)

Piştî mirina wî biryar hat dan ku "li gor qabiliyeta wan wezîfeyekê bidin" kurên wî yên mezin. Ji kurên wî yên mezin Necîb, Mistefa, Bedrî û Behrî Beg bûne qeymeqam yan jî memûrên wek qeymeqam, yên biçûktir jî bi "meaşekî munasib" li dayîrên dewletê bûne memûr (98). Lê vegeyriyê kurên wî bo Kurdistanê ji binî hatibû qedexekirin (99).

Malbata Bedirxan Beg pir mezin bû. Di nameya xwe ya jêrîn de ku bo Sedirezem Elî Paşa şandibû, Bedirxan Beg bixwe dide zanîn ku sala 1867-ê hejmara endamên malbata wî ji 110 kesan pirtir e:

*"Raberkirina koleyê te yê bêçare*

Herçende pir zelal e ku debara zar û zêçên min bi mehaneya 19 000 qurîş ya ku bi saya serê Padîşahê me bo min hatiye terxankirin ne hesan e jî, meha tebaxê serûbin bû, lê ji ber daxistina ku wê bê kirin, 3470 qurîş jî ji mehaneya min tê birîn. Lewra ez heyirî mame, ka ezê çawa û bi kîjan sermayeyî debara xwe bikim. Ji ber ku nifûsa pir ya li mala min ne kole û carîye ne ku bifiroşim, ne xizmetkar in ku bera wan bidim. Giş zar û zêçên min in û ji 110 kesan pirtir in. Ez ketime taya wê yekê ka ez ê bi vî pereyî çawa wan xwedî bikim. Sala 1275-ê ya çûyî jî meaş ji sedî yazde hatibûn kêmkirin, lê li ser raberkirina min Meqamî Dewletê we ez koleyê xwe li derveyî vê daxistinê hiştibûm û meaşê min tam dabû min. Tevî ku vê carê jî daxistin giştî ye, daxwaza min ji dilovanî û dilnermîya we ew e ku hûn vî koleyê xwe li derî tevahîyê bihêlin, bibexşînin. Neku li welatê me, lê li welatên bîyanî jî hevtayekî (emsalekî) min peyda nabe, lewra ez lavlav û hêvî dikim ku hûn koleyê xwe nekin hevtayên kesên di.

Debara me dikare yan bi meaşê ku tê lutfkirin bibe yan jî ji neh gundên koleyê we yên li Eyaleta Kurdistanê, şeş bila dîsa malê dewletê bin, lê sisyên mayî bo koleyê we bên dan. Bi vî awayî divê ku ez pîraniya kesên malbata xwe bişînim van gundan ku li wê derê bi cotyarîyê debara wan bibe, yên mayî jî ezê bikaribim li vê derê bi meaşê ku tê pêşkêşkirin, xwedî bikim.

Koleyê te kurê min Necîb Beg ev çar sal in li dayîreya qelemê ya mezbeteya Meclis-i Vala dixebite û têra xwe bûye xwedî zanîn. Kurê min koleyê we yê ku bi saya serê we bûye xwedîyê rutbe-i salîse (rutbeya sisiyan) eger bi meaşekî teme ji ya min tê birîn, yan li meclisa Gumrikê yan jî li ya Dîwan-i Muhasebatê bibe endam, dîsa wê ji me re fêdeya wî bibe. Bi kurtî ji bilî bextê dilovanîya Padîşahê me cihekî din yê min tuneye ku ez xwe bavêjimê. Ji bilî Zat-î Dewletê te kesekî min nîne ku bi qencî û erêkirin guhdariya derdên min bike, lewra bi hemû êş û endîşeya xwe min bi xwe re dît ku ez rewşa xwe raxim pêş çavên we yên dilovan. Destên min yên pîrhêvî davên te yên pîrqencî girtine, Xwedê neke ku ji merdiya we ya gihiştî bêpar bimînin. Ez hêvîdar im ku wê li gor navê we yê mezin ji bo rewşa min çî pêwîst be bê kirin û hûnê -min- koleyê xwe piştî vî temenî li ba zar û zêçên min nexin şermê; ji bo ku ji min re îmkan bê bexşkirin da ku ez bi her awayî bikaribim derheqe Padîşah efendiyê me de duayên xwe yên xêrê û derheqê bilindkirina şan û şerefê Zatî Dewletê de temenniyên xwe bêbir bidomînim min cesaret kir ku ez niyazê xwe 'erz bikim. Di vî warî de û di her rewşê de qencî û bexşandin ya efendiyê me ye.

12 Sefer 1284/5 Hezîran 1282 " [1867] (100)

Gava Bedixan Beg mir, 63 kes ji malbata wî dijiyan (101).

Hejmarên cida yên di heqê jin û zarokên wî de tînin gotin, zehmettir dikin ku mirov hejmara rast destnîşan bike.

Hejmara jinên wî yên ku bi wan re zewiciye li gor hinan hivde (102), li gor

hinan sihûçar (103), li gor hinan jî çil (104) bû. Li gor nevîyê wî M. Salih Bedirxan, bapîrê wî Bedirxan Beg "şanzde jin anîne". Ji van bi tenê yek - dayîka Hamid Begî- dotmama wî û mehrkirîya wî bû, yên dî carîye bûn ku ji nav êzîdîyên ku di êrîşan de êxsîr kiribûn hilibijartibûn. Her li gor wî nivîskarî, jinên Bedirxan Beg yên êzîdî hê jî têkiliyên eşîrtî didomînin. M. Salih Bedirxan wisa dom dike:

*"Îro zarokên wî giş bi vê yekê hisdar in, dayîka kê ji kîjan eşîrê be, birayên xwe yên ji carîyên (yan jî bermalîyên) wê eşîrê, ji birayên dî xweştir divên. Dapîra min ji eşîra Anqosî ye. Dayîkên Osman, Bedrî û Mirad Beg jî ji vê qebîleyê ne."* (105)

Ji belgeya li jêr jî xuya dibe ku dema ku Bedirxan Beg miriye, çar jinên wî yên mehrkirî û pênc bermalîyên (odalîk) wî hebûne.

Li ser hejmara zarokên wî jî reqemên pir cihê tên gotin: li gor hinan çil kur û çarde keç yanî pêncûçar (106), li gor hinan şêstûpênc (107), li gor hinan heştêûsê (108), nod (kur û nevî) (109), nodûpênc (110), yan jî nodûneh (111) bû. Li gor Mûsa Enter jî bîstûheft kurên Bedirxan Begî hebûne (112). Tê famkirin ku çî bigre yek ji van hejmaran jî ne rast e. Rastî ew e ku gava Bedirxan Beg dijiya nodûşeş zarokên wî çêbûne, gava miriye jî çar jin û bîstûyek keç û bîstûyek kur, çilûdu zarok li pey xwe hiştine (113). Li belgeya li jêr navên wan derbas dibin.

Piştî mirina wî, meaşê endamên malbata wî weha hatibû destnîşankirin:

*"Kurê Xwedê jê razî Necîb.....2500 qurîş*

*(Ji ber ku Necîb Beg kurê mezin yê Xwedê jê razî ye, serokê malbatê ye û debara hin mirov, pîr û xizmetkarên babê wî li ser wî ye, ya rast ew e ku 2500 qurîşên ku babê wî di saxîya xwe de didanê, [ji îro şûn de jî] wek meaş jê re bèn terxankirin.)*

*[Têlî] Hamid.....1100*

*Mistefa Elî.....1000*

*Ehmed Bedrî.....1000*

*Riza Behrî.....1000*

*(Hamid, Mustefa, Ehmed, Riza Beg ji ber ku ji kurên mezin yên Xwedê jê razî ne û zewicî ne û xwediyên hin mal û malbatên dî ne, munasib e ku ji her yekê re 1000 qurîş bê terxankirin; ji ber ku her du çavên Hamid Beg kor in munasib e ku 1500 qurîş jî ji wî re bèn terxankirin.)*

*Ehmed Xulûsî.....350*



<i>Osman Nûrî</i> .....	350
<i>Tabir Muxlîs</i> .....	350
<i>Mehmed Emîn</i> .....	350
<i>Elî Şamîl</i> .....	350
<i>Xalid Cewdet</i> .....	350
<i>Mehmed Elî</i> .....	350
<i>Huseyîn Kenan (114)</i> ....	350
<i>Mirad Remzî</i> .....	350
<i>Mîqdad Eswed</i> .....	350
<i>Xelîl Ramî</i> .....	350
<i>Hesen Fewzî (115)</i> .....	350
<i>Yûsiv Kamil</i> .....	350
<i>'Ebdirehman</i> .....	350
<i>Zubêr 'Ewam</i> .....	350
<i>Sedillah</i> .....	350

*(Ji ber ku ev 16 kurên [yên dawî] Xwedê jê razî, bêjin û bêmalbat in û ji ber ku xuşkên wan yê li jêr nav nivîsandî jî wê meaş bigrin, ji bo her yek ji wan 350 qurîş meaş munasib hatiye dîtin.*

<i>Keça wî Leyla</i> .....	200
<i>Helîme (116)</i> .....	200
<i>Fexrîye</i> .....	200
<i>Edwîye</i> .....	200
<i>Samîye</i> .....	200
<i>Sarîye</i> .....	200
<i>Meryem</i> .....	200
<i>Nazlî</i> .....	200
<i>Nefîse</i> .....	200
<i>Emîne</i> .....	200
<i>Emîne Rabîa</i> .....	200
<i>Ezîze</i> .....	200
<i>Zeberced</i> .....	200
<i>Zelîxa</i> .....	200

Fatima.....	200
Eyşe.....	200
Zerîfe.....	200
Şefîqa.....	200
Asîya.....	200
Rûqîye.....	200
Mariye.....	200

(Ji van 21 keçên (117) Xwedê jê razî, hinan şû kiribin jî pîraniya wan ne zewicî ne û li gor meaşê birayên wan, ji her yekê ji wan re 200 qurîş meaş hatiye terxankirin.)

Jina wî Xezal.....	400
Hezare.....	400
Fatima.....	400
Rûşen.....	400

Bermalîya (odalîk) wî Zeyneb.....	200
Fatim.....	200
Gulnaz.....	200
Delalê.....	200
Eyşe.....	200

(Ji ber ku çar jinên mehrkirî û pênc bermalîyên Xwedê jê razî hene, ji bo jinên wî 400 qurîş û ji bo bermalîyên wî jî 200 qurîş meaş hatiye girêdan.)

Îrade 1286 [1869], 41717, lef " (118).

Sala 1898-ê ji kurên Bedirxan Begî hîvde (119) sax mabûn, sala 1909-ê - herî kê-m- çarde (120), sala 1919-ê jî ev neh kurên wî sax mabûn:

- 1-Emîn Alî
- 2-Tahir
- 3-Mihemmed (Mehmed) Elî
- 4-Hesen
- 5-Mirad
- 6-Xelîl
- 7-'Ebdirehman

8-Zubêr

9-Yûsiv Kamil (121)

## BERHEM Û SERKANIYÊN DERHEQÊ BEDÎRXAN BEGÎ DE

Tevî ku li serkaniyên di warê Bedirxan Beg û serhildana di serokatiya wî de hin agahdariyên cûr bi cûr hene jî, qasî ku ez dizanim di vê babetê de wek kitêbên taybetî bi tenê du kitêbok hene:

1-Bi navê "Emir Bedirhan" kitêbokeka bi zimanê tirkî.

Ev kitêbok paşê ji aliyê 'Elî Seydo Gewranî ve bo zimanê 'erebî hat wergerandin û sala 1992-yê hat weşandin.

2-Kitêbokek jî ji aliyê Konê Reş [Selman Usman] ve hatiye amadekirin ku tê de hîn zêde fiqra û gotinên li ser Bedirxan Begî yên ku di nav gel de tên gotin hene: Serpêhatiyên Mîran-I, Danhev û dabeşkirina Konê Reş, Beyrûd, 1991.

Hin serkaniyên din yên ku derheqê Bedirhan Beg û serhildana wî de agahdarî didin ev in:

-Ahmet Cemil, Kürt Bedirhaniler (wek muswedde di Türk Inkilâp Tarihi Enstitüsü Arşivi -Nihat Gökâlp Arşivi- de heye) (122)

-Dr. Arşak Safrastiyan, "Şorişî Netewey Kur d/Şorişî Kur dekan Legel Turkekana 1830-1847", Yê ku wergerandiye bo kurdî: 'Ebdullah Şalî, Rojî Nwê, no: 1 (Mart 1960), r. 59-60

-"The Azizan or the Princes of Bohtan", Royal Central Asiatic Journal, vol. XXXVI, Paris, 1949. (123)

-Baba Merdûxê Rûhanî (Şîwa). Tarîxê Meşahîrê Kor d, c. 3, Tehran, 1371/1992, r. 523-525

- "Bedirxan Beg", Kurdistan, Cenevre, no: 13, r. 264-267

- "Bedirhan Bey", Kurdistan, Cenevre, no: 14, r. 288-292

-El-Dr. Bleç Şêrko, El-Qezîye'l-Kurdîyye (Maziyu'l-Kurd we Haziruhum), Qahîre, 1930, r. 40-46

-Dr. Bleç Şêrko, Kêşey Kur d, Mêjîne w Êstay Kurd, Mihemed Heme Baqî kirdûyetî be Kurdî, Le Blawkirawekanî Yekêfîy Nûseranî Kurdistan, Çapxaney Şehîd Ce'fer, 1986, r. 46-52

-Celîle Celîl, XIX. Yüzyıl Osmanlı İmparatorluğu'nda Kürtler, Öz-Ge Yayınları, Ankara, 1992, r. 124-151

-Chris Kutschera, Le Mouvement national kurde, Ed. Flammarion, Paris, 1979, r. 13-16

- Cûdî, Bochum, no: 4 (1990)
- 'Elaeddîn Secadî, Şorişekanî Kurd we Kurd û Komarî 'Îraq, Bexda, 1959, r. 44-47
- George Perrot, "Les Kurdes d'Haimaneh", Revue de deux monde, Paris, vol. V, Février 1865, r. 627-628
- Halfin, 19. yy'da Kürdistan Üzerinde Mücadele, Komal Yayınları, Ankara, 1976, r. 62-66
- İbrahim Alaâettin Gövsa, Türk Meşhurları Ansiklopedisi, c. 1, r. 67-68
- Dr. Kawus Qeftan, "Lêkolîneweyek Derbarey Bizûtnewey Bedirxan Paşa (1843-1847)", Kolêcî Edebîyat, no: 17, r. 66-80
- Kemal Burkay, Geçmişten Bugüne Kür tler ve Kürdistan Coğrafya-Tarih-Edebiyat, c. 1, Deng Yayınları, İstanbul, 1992, r. 329-332 ve 353-368
- Lütfi, Tarih-i Lütfi, İstanbul, 1329 [1913-1914], c. 8, r. 474 û dewama wê (124)
- Martin van Bruinessen, Ağa Şeyh ve Devlet, Ya ji îngilizî wergerandiye tirkî: Remziye Arslan, Öz-Ge Yayınları, Ankara, r. 218-223
- [Koca] Mustafa Reşit Paşa, Bir Türk Diplomatinin Evrak-ı Siyasiyesi (125)
- Sevgen, Nazmi; Doğu ve Güneydoğu Anadolu'da Türk Beylikleri, Türk Kültürünü Araştırma Enstitüsü Yayınları, Ankara, 1982

**Wergêra ji pirtûka Malmîsanij a bi navê "Cızira Botanlı Bedirhaniler ve Bedirhani Ailesi Derneği'nin Tutanakları":  
Remzî KERÎM**

- 
- (74) Nazmi Sevgen, Doğu ve Güneydoğu Anadolu'da Türk Beylikleri, r. 103
- Mehmet Salih Bedirhan, "Mehmet Salih Bedirhan'ın Anıları-1", Özgür Gündem, İstanbul, 27 Kasım 1992, r. 6
- (75) 'Ebdulmecîd di navbera salên 1839-1861-ê de padişah bû.
- (76) Nazmi Sevgen, Doğu ve Güneydoğu Anadolu'da Türk Beylikleri, r. 116
- (77) İbrahim Alaâettin Gövsa, ber navg., r. 67-68
- (78) İbrahim Alaâettin Gövsa, ber navg., r. 67-68
- (79) "Bedirhan Bey", Kurdistan (pazde roja de carekî têt nivîsandin cerîdeya Kurdi ye), Cenevre, no: 13, r. 266
- Ronahî, Şam, no: 11 (1 Şubat 1943), r. 6
- (80) Emir Bedirhan, r. 27-33
- (81) İbrahim Alaâettin Gövsa, ber navg., r. 67-68

- (82)[E. W. C.] Noel, Yaddaştekanî Mîcir Noel Le Kurdistan, r. 147  
 -Doç. Dr. M. Kemal Öke, İngiliz Ajansı Binbaşı E. W. C. Noel'in "Kürdistan Misyonu" (1919), Boğaziçi Yayınları, İstanbul, 1989, r. 101
- (83)Beşê vê nivîsa frensî yê ku min neql kiriye, ji aliye Ş. Yılmaz ve bo tirkî hatiye wergerandin.
- (84)George Perrot, "Les Kurdes de l'Haimaneh", Revue de deux monde, Bedirxan Beg, vol. V, Février 1865, r. 627-629
- (85)'Ebdul'ezîz di navbera salên 1861-1876-an de pađîşah bû.
- (86)İbrahim Alaâettin Gövsa, ber navg., r. 67-68
- (87)Nazmi Sevgen, Doğu ve Güneydoğu Anadolu'da Türk Beylikleri, r. 245  
 -İbrahim Alaâettin Gövsa, ber navg., r. 67-68
- (88)Emir Bedirhan, r. 27-33  
 -İbrahim Alaâettin Gövsa, ber navg., r. 67-68
- (89)Baba Merdûxê Rûhanî (Şiwa), Tarîxê Meşahîrê Kord, c. 3, r. 525
- (90)'Elaeddîn Secadî, ber navg., r. 47
- (91)Basile Nikitine, Les Kurdes, Editions d'Aujourd'hui, 1975, r. 193  
 -Nivîsa Cemal Nebez a di Govarî Nîştiman (Temmûzî 1943-Mayîsî 1944) Zimanî Halî "Komeley Jê Kaf"e, Binkey Çapemenî Azad, Stockholm, 1985, r. 20 de  
 -İbrahim Alaâettin Gövsa, yage,, r. 67-68
- (92)Joyce Blau, Le Fait national kurde, mémoire de licence, Université Libre de Bruxelles, 1961-1962, r. 58  
 -Basile Nikitine, ber navg., r. 193  
 -Celîle Celîl, XIX. Yüzyıl Osmanlı İmparatorluğu'nda Kürtler, r. 148  
 -Mehmed Uzun, Destpêka Edebiyata Kurdî, Weşanên Beybûnê, Ankara, 1992, r. 21
- (93)[E. W. C.] Noel, Yaddaştekanî Mîcir Noel Le Kurdistan, r. 148  
 -Nazmi Sevgen, Doğu ve Güneydoğu Anadolu'da Türk Beylikleri, r. 113, 116 ve Emir Bedirhan, r. 34
- (94)Mahmur Lewendî, "Mala Bedirxaniyan: Niv Dewletek", Rojname, İstanbul, no: 0 (hejmara provayê), r. 28
- (95)Nazmi Sevgen, Doğu ve Güneydoğu Anadolu'da Türk Beylikleri, r. 117
- (96)Joyce Blau, Le Fait national kurde, r. 58
- (97)Min ev nivîs ji Mehmûd Lewendî girt ku havîna 1993ê gorra Bedirxan Begî dîtîbû û ev nivîs nivîsandîbû.
- (98)Emir Bedirhan, r. 34
- (99)"Bedirhan Bey", Kurdistan (pazde roja de carekî têt nivîsandin cerîdeya Kurdî ye), Cenevre, no: 13, r. 266
- (100)Nazmi Sevgen, Doğu ve Güneydoğu Anadolu'da Türk Beylikleri, r. 114-115
- (101)Nazmi Sevgen, Doğu ve Güneydoğu Anadolu'da Türk Beylikleri, r. 117, 118
- (102)Nimet Arzık, Tek At Tek Mızrak Anılar, c. 1, Kaynak Yayınları, İstanbul, 1983, r. 69-71
- (103)İbrahim Alaâettin Gövsa, ber navg., r. 67-68
- (104)Dr. Kemal Mezher Ehmed, Mêjû, Bexda, 1983, r. 187
- (105)Mehmet Salih Bedirhan, "Mehmet Salih Bedirhan'ın Anıları-4", Özgür Gündem, İstanbul, 30 Kasım 1992, r. 6

- (106)Jibo beşê neqlkirî yê ji Trotter bin. Chris Kutschera, ber navg., r. 20
- (107) Jibo beşê neqlkirî yê ji Elphinston bin. Chris Kutschera, ber navg., r. 20
- (108)Nimet Arzık, ber. navg., r. 69-71
- (109)[E. W. C.] Noel, Yaddaştekanî Mîcir Noel Le Kurdistan, r. 148
- (110)Dr. Kemal Mezher Ehmed, Mêjû, r. 187
- (111)Jibo beşê neqlkirî yê ji Halil Nadir Kutluk, kovara Orman ve Av (no: 2, Ankara, 1963) û Kamuran Âli Bedirxan bin. Mehmet Salih Bedirhan, Mehmet Salih Bedirhan'ın Anıları-2, ber. navg.
- (112)Musa Anter, Hatıralarım, Doz Yayınları, İstanbul, 1990, r. 80
- (113)Nazmi Sevgen, Doğu ve Güneydoğu Anadolu'da Türk Beylikleri, r. 116
- Emir Bedirhan, r. 33
- İbrahim Alaâettin Gövsa, ber. navg., r. 67-68
- (114)Nazmi Sevgen ev nav bi awayê "Hasan Kenan" nivîsandiye, lê şaş e, divê Huseyîn Kenan be.
- (115) Nazmi Sevgen ev nav bi awayê "Hasan Nuri" nivîsandiye, lê şaş e, divê Hasan Fewzî be.
- (116)Herçend Nazmi Sevgen li hember navê Helîme, "200" [qûrîş] nenivîsandibe jî di orîjînalê osmanî ya belgeya LVIII. de "200" hatîye nivîsandin, lewra min li gor orîjînalê nivîsand.
- (117)Di listeya Nazmi Sevgen de ji 21 keçên Bedirxan Begî, navên 14 keçan hene. Lê di orîjînalê vê belgeya neqlkirî de navên 21 keçan tev nivîsandî ne. Min, navên keçên di yên Bedirxan Begî jî li gor orîjînalê osmanî ya belgeya LVIII. ya ku di pirtûka Sevgen de heye, nivîsandin. Ango min ev navên ku di listeya Sevgen de tunebûn, lê zêde kirin: Fexriye, Edwiye, Samiye, Sariye, Meryem, Emîne, Mariye. Di rûpelê 116 yê pirtûka Sevgen de jî navên van keçan hatine nivîsandin lê li wir navê Zerîfe tune. Herweha navên ku Nazmi Sevgen di rûpelê 116ê de wek "Emine, Rabia, Emine" nivîsandine, di orîjînalê belgeyê de wek "Emine Rabia, Emine" hatine nivîsandin.
- (118)Nazmi Sevgen, Doğu ve Güneydoğu Anadolu'da Türk Beylikleri, r. 118
- (119)Kurdistan (pazde roja de carekî têt nivîsandin cerîdeya Kurdî ye), Qahîre, no: 3 (7 Mayıs 1314 [1898]); çapa nû: Kurdistan (rojname Kurdî ya pêşîn/ilk Kürd gazetesi 1898-1902), c. 1, Yê ji herfên 'erebî kiriye herfên latîni: M. Emin Bozarslan, Deng Yayınevi, Uppsala, 1991
- (120)Aharon Cohen, "Entellektuelekî Herî Girîngê Kurd Mîr Dr. Kamiran A. Bedir-Xan", Wergêr: Yıldız Samer û Hazım Kılıç (Bin. Stêş çapa nû, Yê ku ji çapê re amade kiriye: Hazım Kılıç, Weşanxana Xani û Bateyî, Kopenhag, 1992, r. 19)
- (121)[E. W. C.] Noel, Yaddaştekanî Mîcir Noel Le Kurdistan, r. 149-151
- (122)Şevket Beysanoğlu, Diyarbakırlı Fikir ve Sanat Adamları, c. 2, İstanbul, 1960, r. 190-198
- (123)Cefîlê Cefîl, XIX. Yüzyıl Osmanlı İmparatorluğu'nda Kürtler, r. 181
- (124)M. Salih San, ber. navg., r. 183
- (125)Emir Bedirhan, r. 24

# Bi salan e

Lezgîn Salih

Bi salan e ku ez evîndar im;  
evîndarê erdên beyar im.  
Mîna Ferhat hoste,  
mîna Eyûb Cebar im.  
Di erdên beyar de bîran dikolim,  
bi serkên derziyên koh!  
Her cara ku ez dikolim dîwarên wan,  
bi ser min de diherifin. Û ez kûr dinalim!  
Lê dîsa dikolim, dîsa diherifin.  
Dîsa jan dide dilê min. Û ez dîsa kûr dinalim!  
Ê ne ez ê sibehê jî bikolim;  
ez dizanim ku ew ê dîsa biherifin;  
wê dîsa jan bide canê min,  
û ez ê dîsa binalim!  
Ez ê bikolim, ez ê bikolim!...

# Pirsa “kumik” û tehlûkeya ji navçûna zimanê kurdî

Şahîne Bekirê Sorekî

Dema min di hejmara dawîn ya Çirayê de dît ku “teqereqa” li ser kumika me hîn berdewam e, min kesereke kûr kişand û di dilê xwe de got, “bi rastî jî em endam in gelekî bedbext û talihreş in.” Ji aliyekî ve min nedixwest kat û taqeta xwe ji bo vê pirsê wenda bikim, çimkî tişteki gotinê êdî di derbarê vê pirsê de nemaye û piraniya beşdarên di hevpeyvîna li gel Laleş Qaso de careke din li ser sedema pêwîstiya berdewamkirina kumikê rawestiyane. Lê ji aliyê din ve min dil hebû ku vê dilxemgîniya li nik min hatî holê bi gotarekê ji nav sistêm xwe derînim.

Li dora deh salan e ku munaqeseyeke germ didome: gelo bila î/i di elfabeya kurdî de wek xwe bimînin, yan gelo bila bibin wek yên ku tirk bi kartînin? Rewş gihîştîye wê radeyê ku pirtûkek di derbarê vê pirsê de hatiye nivîsandin, ku çend bakuriyên me hema hema mayîn û nemanan me bi nuxtebûn (niqte) û bènuxtebûna “î”yê li aliyekî, kumikbûn û bêkumikbûna “i”yê li aliyê din, ve girêdane! Van şareza û pisporên bakurî wisa bawer in ku kumika bêbav bûye sedema hemî kul û xemên me: zarokên beşê mezin ji Kurdistanê ji ber wê dest ji fêrbûna kurdî berdane, mezinên beşê mezin ji Kurdistanê ji bo eynî egerê dil nakin ku rojname û kovarên kurdî bixwînin, edebiyata kurdî hatiye berbendkirin, û herweha û herweha û herweha. Bi encama berdewamkirina vê îsrara wan ya bi serhişkî, ne dûr e ku hêkên şerekî dinî navxweyî di binê qurqê de bin.

Gelo çawa dibe ku zarokekî ingliz fêrî frensî dibe?! Wek mînak, dema ew peyva “le garçon” li ser rûpelê dibîne, ew wê wek “lî garkon” dixwîne, lê mamoste dibêje, “na, ev peyva frensî wek ‘lu garçon’ tête xwendin, ...” Dirêj nake zarokê ku zimanê wî yê zikmakî inglizî ye, ne tenê fêrî xwendina frensî dibe, lê kêfa wî ji van telafuzên nû re tê. Zarokekî din ku herweha zimanê xwe yê zikmakî inglizî ye fêrî xwendina almanî dibe. Dema ew peyva “die Straße” li ser rûpelê dibîne, ew wê wek “day strêb” dixwîne. Mamoste dibêje, “na,



zarokino, alman vê peyvê wisa dixwînin: ‘dî ştrassê, ...’” Di rûpelê din de zarokek peyva “gasse” di çav xwe re dike û bi mentiq ji mamosteyê xwe dipirse: Heke “ss” di almanî de têtê bi karhanîn, ma bi karhanîna “ß” ji bo çi? Mamosta dibêje, “bila ji bîra we neçe ku di almanî de ‘ß’ telafuza ‘ss’ dirêj dike, lê ‘ss’ heke wek xwe bimîne kurt e. De hemî guh bidin min û li dû min dubare bikin: ‘Straße’ -ştrassê- û ‘Gasse’

-gassi-”

Lê helbet me maf nîne ku em behsa zarokên inglizan bikin; çimkî heye ku hin ji me bibêjin, “bavo, mêjiyê inglizan mezintir e.” Em nimûneyeke din bidin ber çavan: Li welatekî wek Australya (ne Awustiralya) gelek zarokên muhacirên ereb fêrî xwendin û nivîsandina zimanê bapîrên xwe, erebî, dibin. Wekî tê zanîn, tîpên erebî bi ser û binê xwe ve ji tîpên ku inglizî bi kartîne cuda ne. Tew hîn bi ser de, nivîsandina bi erebî ji aliyê rastê ve dest pê dike û ber bi çepê diçe!!! Gelo çawa dibe ku hejmareke bilind ji van zaroyan fêrî xwendin û nivîsandina erebî dibin, tevî ku ew li Australya mezin dibin, di xwendegehan de fêrî tîpên latînî dibin û ji wan gelek, ji çend gotinên zaravayê malbata xwe pê ve bi erebî nizanin! (zaravayên erebî yên têyên axiftin hema hema bi tevahî ji şeweya nivîsanidna erebiya bilind cuda ne)?!!! Gelo kî dikare ji me re bi şeweyên “ilmî” û bi “lêkolîn” piştrast bike ku mêjiyê van zaroyan ji mejiyê kurdên tirkîxwende mestir e?! Hele em tîpên japonî û fêrbûna vî zimanî ji aliyê zarokên biyanî ve tew di bin kulêv de bihêlin! Bêguman ev zarok “superzaro” ne!

Ma mirov êdî çi bike û çi bibêje, ey hawar! Baş e, em bibêjin di salên 80î de ji bo kovareke biçûk nivîsandina bi i’ya bi nuxte û bènuxte, ji ber sedemên teknîkî, hêsantir bû. Îroj kompiyûter û makîneyên çapê pêşve çûne û çi asteng li ber nivîsandina i’ya bi kumik nînin. De baş e, çima li i’ya bi kumik venagerin? Çima vê hêlehopa dûr û dirêj li ser kumika malkambax yê vê i’ya ronedi? Ma cudatî û cawaziyên ku di nav kurdan de hene têtê nakin? Ma em hîn li ser sê elfabeyan cudabûnekê têxin nav şeweya nivîsandina kurdî ya bi tîpên latînî jî? Baş e, heke rakirina kumikê wê xwendinê ji bo hin kurdên bakur “hêsantir” bike, gelo van şarezayên me nizanîbûn ku kurdên başûrê biçûk jî eynî elfabeyê bi kartînin, û nuha hejmareke ji kurdên beşên din jî xwe fêrî eynî elfabeyê kirine?! Canên min, çavên min, seydayên min, li ser ser û çavan, hejmara mezin ji kurdan li bakur in! Bi Xwedê me pejirand! Hûn ê sibe bixwazin “û” jî bikin “ü” û dusibe guhertineke din, ... Wekî hejmareke ji birêzên di hevpeyvîna Çirayê de beşdar pêşniyar dikin, bila çi guhertin anuha cîh negirin, lê heke guhertinek dike îlleh hebe, bila ji bo pêşerojê bimîne/û heye ku baştir be tîpên ji bo inglizî tèn bi karhanîn ji bo nivîsandina kurdî wê demê bèn adaptekirin çimkî ev tîp in ku di INTERNET û satelîtên navneteweyî de tèn bi karhanîn. Ji bo xatirê Xwedê, wek têtê gotin, dest ji elfabeya me

berdin. Ji bo nuha têra me dike û zor baş e.

Gelo ez mirovekî bêhiş im, yan li nik hindekan ji me mentiq nîne? Baş e, heke çend kes û rêxistin dixwazin bi îsrar û serhişkî kumê “i” ji ser rakin, bila bi ya xwe bikin, bila “şebqeya” xwe rakin û kumika me ji me re bihêlin. Wisa diyar e ku ew dest ji riya xwe bernadin û dixwazin piraniyê bi serhişkî têxin riya kêmahiyê! Heke wisa be, de terxandina bi sedan rûpel li ser vê pirsra ku bûye zeviyekî bi deh gîsnan cot lê hate kirin ji bo çi?! Ma gelo di welatê kurdan û di cihana fireh de tiştekî din nemaye ku ev çend kovarên kurdan xwe pê mijûl bikin? Ma gelo zanyar û pisporên me hemî gelşên civakî, siyasî, hawîrdorî û hwd. çareserkirine ku tenê ev gelşa kumika agirpêketî li holê maye?!

Ewên dibêjin elfabeya kurdî fêrkirina xwendin û nivîsandina kurdî dijwar dike bi xwe dikenin, yan bêhay in. Heke ji bo kesên nexwende fêrbûna xwendin û nivîsandinê pêkan be; heke kurdên Sûriyê ku li xwendegehên erebî xwendine bikaribin xwe fêrî elfabeya kurdî ya bi tîpên latînî bikin, ma gelo çima ji bo kurdên bakur fêrbûna xwendina kurdî ewqas dijwar bûye, yên ku li dibistanê fêrî tîpên latînî bûne? Ma gelo sedema rast tenê kumik e? Ma gelo eger rast tenê qedexekirin e?! Gelo hebûn û nebûna meraqê ne xwedan rol bin?!

Di sala 66an de ez li Viyena rastî du kurdên başûr hatim. Ew cara yekem bû ku min du kesên soranîziman didîtin. Bi dîtina wan zor dişad bûm, lê dilsar bûm dema em neçar man li gel hevûdin bi erebî bipeyivin. Bi rastî, wê demê fêhmkirina ji hevalên faris ji bo min hêsantir bû ji fêhmkirina şêweaxiftina herdu hevalên Soran. Dû re li Almanya, dema em çend xwendekarên kurd dicivyan, em neçar dibûn bi 4-5 zarav û zimanan biaxifin: Kurdên başûr û rojhelat bi soranî li gel hev diaxifin, yên bakur bi tirkî, yên bakur û başûrê biçûk bi kurmancî, yên başûr û başûrê biçûk bi erebî û hemiyên bi almanî baş dizanibûn bi almanî. Bi encama vê yekê û çend trajêdiyên bi ken û girî (di civînekê de ku herweha tê de biyanî beşdar bûn, hin kurdên beşdar bi îsrar daxwaza wergêran kirin da ku soran û kurmanc bikaribin ji axiftinên hevûdin fêhm bikin) min soz da xwe ku ez ê xwe fêrî soranî bikim. Li gel hemî kêmasiyan û nebûna îmkânên rêk û pêk jî ez gihîştim amanca xwe, ne tenê ji aliyê axiftinê de lê herweha ji aliyê xwendin û nivîsandinê de jî, çiqas şûn ji pêşvexistinê re hîn hebe jî. Ez dikarim sond bixwim ku mêjîyê min, heke ji yê piraniya kurdan ne siviktir be, ne girantir e jî! Bi dîtina min, li nik gelek kurdan meraq nîne. Her kes tawanê dixwe stuyê dewletan lê di rastiyê de kurd bi xwe jî tawanbar in. Bêyî dirêjkirina vê pirsê, dixwazim tenê bibêjim ku di salên dawîn yên Turgut Ozal de, heke kurdên bakur bi şêweyeke mentiqî ew fersendên di dest de bi kar bihanîna, hebû ku rewşa zimanê kur dî li Tirkiyê û ew beşê Kurdistanê îroj yeke din bûya, lê ji ber nebûna pisporan û şaştiyên

siyasî, ew fersendên ha terepaş hatin bi karhanîn; lêbelê ev gotara di dest de ne şûna şir ovekirina wê pirsê ye. Jê bêtir, ez bi xwe bi dehan kurdan dinasim ku ev bûn dora bîst salan li Ewropa ne û hinan ji wan şehadiyên bilind bi dest xistine, lê li gel wê jî nikarin hîn rûpelekî bi kurdî bixwînin, yan nameyeke kurt bi kurdî binivîsînin.

Em ê careke din vegerin ew gotina ku me pejirandiye û daye ser ser û cavên xwe, gotina ku piraniya kurdan li bakur in. Çak e, canekem, lê ji wan kurdan (ku carine wek 20 milyonan, yan tew 30 milyonan, tên hejmartin) gelo çend bi kurdî dixwînin? Gelo hejmara wan xwendevanan ji ya xwendevanên li Binxetê, kurdên ku hejmara wan milyonek ta milyon û nîvekê ye, pir bilindtir be?! Heye ku bête gotin, bavo, kurdên bakur gelek stemkarî dîtine. Li ser ser û cavên min, rast e! Lê li milê din, kengî li Binxetê fêrkirina kurdî serbest bûye?! Çawa be îroj li Stenbolê kovar û rojnameyên kurdî dikarin bên kirîn. Gelo kî dikare li Şamê rojname û kovarên kurdî di taxan de bifroşe?! Bila bêtir neyêt gotin; “em serê kêçel di bin kum de bihêlin.” Bila li min bête borandin ji bo vê gotina ku pêkan e bêtahm bête hesibandin, lê mebest ew e ku bête piştrastkirin, meraq roleke grîng dileyize.

Şareza û zanyarên hêja bila bi kerema xwe (ji kerema xwe re!) min bibexşînin ji ber ku ev gotara min gotareke tevlihev e û bi carekê ve ne “ilmî” ye, ne jî bi encama çî lêkolînan hatiye holê, lê çawa be, “min carê xwe daye nav,” wek tête gotin, û ez ê çend tiştên ku di dilê min de mane vereşînim ser kaxezê bi hêviya ku kevir û kuç xwe ji ser deryayan û awqîyanoson re negihînin min, wekî ku carekê ji aliyê zinarekî li serê cîhanê de xwe gîhandibûn binê cîhana me ku ez nuha lê bi war bûme. Gotarê bi vê pirsê bidomîne: Gelo çima ewqas nivîsar û gotar û hevpeyvîn û ewqas rûpel li ser kumik û bêkumikbûna “î”yê? Gelo sedem ne ew be ku “gera heskê heta binê biroşê ye”? Gelo çima rojname û kovar û zanyar û şareza û pisporên dijkumikê xwe bi pirsin din ve mijûl nakin? Wek nimûne, mirov dikare êdî dawiyê bide lêkolînen di derbarê kumik û şebqe û bilindekan de û dest bi lêkolînen din bike ku piçekî xwe bi jiyana kurdan ve peywendîgir dikin, em bibêjin, di derheqê tadeyên cinsî de, li jinan û zarokan?! Heke ev pirseke zor hesas be, em ê wê ji “otorîteyan” re bihêlin! Baş e, ew ji lêkolîneke di derbarê dizîtiyê û talankirinê û li hevdanê re çî dibêjin? Mirov dikare sedem û encamên bêtara Helebçê û rola hin hêzên kurdî di cîhgirtina wê de bide ber çav, yan hejmara kurdên bi destên kurdan ku hatine kuştin bide hember hejmara miriyên Helebçê! Heke ev pêşneyarên ha ne di cîh de bin, heye ku mirov bikaribe bizava bersivdîtina ji pirseke wisa re bike: Gelo çawa dibe ku her kes wê daxwazê dike ku bila “partî û serokên kurdan” pirsra kumik û şebqe çareser bikin di dema ku ev partî û serok pergala hevûdin belav dikin û ya gelê kurd jî li gel xwe?! Gelo ev partî û serok çawa dikarin sûd û kelkê bigihînin

zimanê kurdî?! Gelo ji wan bête der ku bi beşekî biçûk ji nerxê kirîna wanqas guleyên hevkuştinê ji me re rojnameyê heftane bidin weşandin? Rojnameyê bêyî propaganda, rojnameyê li ser hîmên mentiq û rastiye, rojnameyê ku bi “A, B, C” û “yek, du, sê” dest pê bike, ne bi gotareke li ser şoreşan û faşîzmê, çimkî a) yê bi “A, B, C” û “yek, du sê” nizanibe dê nikaribe gotarên li ser şoreşan û faşîzmê fêhm bike; b) qedexekirina rojnameyê wisa ji aliyê dewletên serdest ve dê diwartir bibe, û c) rojnameyê wisa dê di dawiya dawiyê de hesteke netewî duristir û resentir li nik xwendevanan bîne holê û şeweya ponijandina hevbeş gelemperter bike! Ji ber ku xelkê me fêr nebûye rojnameyan bi peran bikire, bila rojname bêyî peran bihata belavkirin; û ji ber ku rojname ne yeke propagandîst û şerfiroş e û bi pereyên hemî rêxistinên mezin hatiye holê, tirsê ji bo bi destxistin û xwendina wê jî dê kêmtir bûya. Bila dîsa şerê hevûdin bikirana, lê bila pirsê zimên li derveyî vî şerî bihiştana!

Ji ber ku gotar ne “ilmî” ye û min bi xwe gotiye, ew yeke tevlihev e, ez ê careke din li pirsê kumikê vegerim, li min biborînin (Zebeşê buhirî ew zebeşe ku kata xwe bi ser ketiye. Ji lew re, buhirandin xwebêja derbaskirinê dide. Li min bibuhirîn = şaştiya min kirî derbas bike, yan min bibexşîne. Ji ber ku “bibuhirîn” peyveke diwar e, heye ku hatibe hêsankirin û bûbe “biborîn.”. Li milê din, “min biborîn” xwebêje “min derbas bike” dide; û bibûre bi carekê ve ne mentiqî ye. Lê nikarim bi îsrar bibêjim ku ev şirovekî min rast e, ne jî ew bi encama “lêkolînên ilmî” hatiye holê). Bizaveke din ji bo îqnakirina kumikneyaran (îqna erebî ye, heye ku pêbawerkirindan rastir be, lê lêkolîn divên!!!) Almanya welatekî zor pêşkeftî ye û piraniya kesên ku almanî diaxifin li Almanya dimînin. Zimanê almanî çiqas ber bi pêş çûbe jî, hîn gelek kêmasî û diwariyên xwe hene. Li gel van kêmsaiyan jî, Almanan elfabe û rênivîsandina zimên (zimanî) nedan guhertin. Tenê ber sê-çar salan bû ku hin guhertinên bi sînor hatin holê, ew jî bi encama itîfaqê hemî welatên ku tê de almanî tete bi karhanîn. De baş e, yê me çawa dikaribûn kumikê ji ser “i” wisa bi hêsaniyê û bêyî pejirandineke tevahî rakin?! Wisa, min tika û rica ji kumikhejneran heye ku êdî dest ji vê pirsê berdin û ji bo nuha vê kumikê li ser serê kêçel bihêlin! Yê meraqa nivîsandina pirtûkeke din di derheqê (di derheqa! Peyva “heq” erebî ye. Tete gotin, “te heqê min xwar,” yan, “te heqê wî nedayê.” Heke wisa be, de çima gotina “derheqa” û ne “derheqê”?! Lê wek min li jor diyar kir, bila ji bo nuha herdu jî bînin bi karhanîn; ez bawer nakim tiştên wisa bibin sedema ziyaneke mezin) kumik, şebqe û bilindekê de dikine, tika ye taqet û kata xwe ji bo tiştêkî din têxin rê: hema pirtûkekê di derheqê rewşa başûr de binivîsîn, yan di derbarê gerdûnê de, yan hema li ser germbûna cîhanê û bandora wê li ser kêmbûn û zêdebûna avê! Ma ne kat û taqeta we ji bo lêkolînên “ilmî” heye! Qe nebe di derheqê van pirsên grîng de ji zimanên din wergerînin. Ma em kurd jî li ser vî erdê bi zîqûm najîn qey?!!!

Ma jiyana me tenê bi kumikan ve girêdayî maye?!

Nuha em bèn ser pirseke din. Bi dîtina min, bila her kes wek dixwaze binivîsîne, heta bila feqî û mewla pirtûkên “gramerê” jî binivîsînin. Nivîs û berhemên bi nêrxê bîmînin û yên bênerxê wenda bibin. Ji xwe her kes gotina wê yekê dike ku pêwîst e zanyarên me danîşin û rênivîsandineke rast ji me re pêşneyar bikin. Ma heke berhemên cudaşewe nebin, ev zanyar wê çawa bikaribin gotin û formên rast û baştir bidin me. Mirov di zikê diya xwe de fêrî zimanan nabe! Bila hin kes di nivîsarên xwe de “nehat,” bila hin din “ne hat” binivîsînin, bila hin “hat wenda kirin,” û bila hin din jî “hat wendakirin” binivîsînin, ... Bawer nakim ku ev cudaşeweyên ha mala zimanê kurdî wêran bikin. Gotineke wek “kûrdîstan” tehlûketir e. Heye ku tew bi rê ve forma rast xwe bi cîh bike û bide pejirandin, wekî ku di nav panzdeh salên borîn de bûye jî. Wek nimûne, peyva “xwendegêh/xwendegêh” di nav çend salên dawîn de şûna peyva “dîbistan” girt, lê bila herdu jî di ferhenga kurdî de hebin; peyva “pejirand” şûna “qebûl kir” girt ku bi paşereha xwe erebî ye,

...

Çima em her behsa tiştên nêgatîv dikin; çima em nabêjin ku di nav van çend salên dawîn de zimanê kurdî, bi taybetî nivîsandina bi kurmancî, gelekî ber bi pêş ve çû û ji mirinê hat azadkirin. Çima em nabêjin, aferîn ji wan nivîskar û karmendên ku nivîsandina bi kurmancî ne tenê zindî kirin lê herweha bedewtir û xweşiktir kirin? Çima em nabêjin, ya ji dest me hatiye ev e û bila em hêvî bikin ku di bîst salên pêş de jî ewqas pêşketin hebe? Çima em nabêjin, aferîn ji hemî nivîskar û hemî mirovên ku li derve xwe û kata xwe dan ber pêşvebirina vî zimanê?! Em hezar pesin û sena dibêjin di derheqê hin klasîkên me de, ku hinekan ji wan bi rastî zor baş bi erebî nivîsandine lê çend gotinên bi kurdî xistine nav helbest û nivîsarên xwe, di dema ku hin ji me hezar û yek kevir û kuçan diavêjin nivîskarekî wek Mehmet Uzun ku zanîbûna xwe ya di derbarê zimanê kurdî de bi daxwaz û îsrar li derve pêş ve biriye û her bizav kiriye ku berhemên li gor xwe qenc biafirîne. Heye ku şexsiyeta Uzun ne li gor kêfa wan be, yan heye ku wan ji nivîskarekî wek wî dipan ku wekî wan hêvî dikirin binivîsanda, lê ev tiştêkî din e! Ji bo nivîskarên bi kurmancî dinivîsînin xwendegêh û zanîngêh nebûne. Bêguman e ku gelek şaşîti dê di destpêkê de hebin, lê 15-20 salên raberdû (derbas bûnî) piştrast dikin ku pêşveçûneke bêhempa hebûye û rastiya ku em nuha ji nivîsarên hevûdin têdigihên îspat e. Bi dîtina min, pêşveçûna di nav çend salên çûyî de cîh girtî, heke nebûna îmkanan û rewşa kurdan bête berçavkirin, ne encameke biçûk e. Pêwîst e neyêt ji bîr kirin ku ta salên 70î tenê hejmareke zor biçûk ji kurmancan sûd ji berhemên Celadet û Kamêran Bedirxan û hindekên din girtibûn. Helbet, hin berhemên qelsê hebin, lê li milê din, kesekî maf nîne ku nivîsandinê li kesekî din bide qedexekirin. Wekî li jor hat gotin, berhemên hêja û ne hêja dê di

pêşerojê de ji hev bèn veqetandin.

Amojgariyeke din (dîsa soranî ye: şîret, nesîhet): Bila hestê kêmasiyê li nik me rabe; heke berhemên me yên wek ji nivîsakarên wek Shakespeare û Goethe manî tunebin, bila em dilsar û bêhêvî nebin; bila em derpiyên osmaniyan li keçên komên folklorî nekin û wan kincan wek yên kurdan bi nav nekin; bila yên filimên wek Mem û Zîn çêdikin berê lêkolîneke hema biçûk li ser “lê” û “lo” çêbikin; bila em dîrok û berhem û pûtên gelên din nedizin û nekin yên xwe, wekî ku milletine din kirine; bila em dîrokê bi derewan danegirin, wekî ku em dibêjin neyarên me kirine. Heke em çi ne, em ew in û tiştên me yên hene têra serbilindiya me dikin. Me hewcedarî bi dizîna ji dîrok û berhemên gelên din tune.

Ber kutakirina gotarê, min dil heye hayê we xwendevanên hêja bikişînim ser pirseke zor grîng. Heke em wek hejmareke ji zanyarên geline din pêşeroja dûr bidin ber çav, em ê bigihên wê encamê ku zimanê kurdî di tehlûkeyeke mezin de ye, tehlûkeya ku bi tevahî ji holê rabe. Sedem ne kumik, ne rastnivîsandin, ne jî qedexekirina zimanê kurdî ye, çiqas ev pirs xwendan bandor û encam bin jî.

Zimanê inglîzî bi şeweyeke bêhûd li cîhanê belav dibe. Bi rêya filimên sînemayî û televizyonî, bi rêya mûzîk û stranên, bi rêya satelîtên navneteweyî û Internet, û bi encama pêşveçûna teknîkî inglîzî ne tenê xwe wek zimanekî navnetewî daye pejirandin lê herweha mayîna hejmareke mezin ji zimanên xistiye tehlûkeyê. Heta bi dewleteke wek ya frensî ji nuha ve tevdeyan bi rê dixê, ka ew ê çawa bikaribe zimanê frensî ji bandora leheya zimanê inglîzî biparêze. Li gor Professor Bob Dixon, ji Zanîngeha Australî ya Neteweyî (ABC/SUN/SBS: 18/12/97), ji vir ta sed salên din belavbûna inglîzî dê bibe sedema mirina hejmareke mezin ji zimanên cîhanê. Li gor wî, ji 6000 zimanên ku îroj di cîhanê de tê axiftin, tenê çend ziman ê bimînin: inglîzî û zimanine ku ji aliyê hejmareke zor blind ji xelkê de tên axiftin, wek çînî, îndonêzî, spanî, swahêlî û cendekên din; herweha zimanekî wek japonî ku axifgerên xwe toreperest in. Heke ev teoriya rast be û heke zimanên welatên wek skandinavi di tehlûkeya nemanê de bin, gelo ji bo zimanekî wek kurdî çi hêvî hebe?!!! Ev e pîrsa ku axifgerên vî zimanî divêt xwe ji nuha ve pê mijûl bikin. Gelo nivîskarên kurdan, zanyarên wan, îmkanên di dest wan de û partiyên wan yên siyasî bikaribin ji nuha ve berbendkirina tehlûkeyeke wisa misoger bikin, yan bi kêmasî hest bikin?! Gelo di sal 2100î de zimanê kurdî hîn hebe? Heke erê be, îcar ka ew şert û mercên misogerkirina bersiveke wisa li ku ne?!

Heye ku şoreşke nûşewe di nav kurdan de pêwîst be, şoreşeke zanyarî û zanistiyê, şoreşeke hejandina partî û rêxistinên li holê, şoreşeke li ser hîmên mentiqê û li gor daxwaz û rastiyên sedsala 21ê; şoreşeke ku tê de bi wêrekî bête gotin: bila peyv û pênûs têkevin şûna nefret û tîfingê, bila zanistî têkeve

şûna serhişkiyê û mirûdîtiyê, bila kîrin têkeve şûna gotinên bêşûd, bila Kurdistana hatî wêrankirin dîsa şên bibe. Heke wisa nebe, di sal 2100î de, heke tew Kurdistaneke serbixwe hebe jî, ew ê bêyî xwebêj be?! Çima ewqas agir û xwîn û wêrankirin ji bo welatekî ku reng û ziman û toreyên xelkê wê dê ji yên welatên dirawsê (cîran) ne cuda bin?!

Ji bo parastina zimanê kurdî û ber bi hevhanîna zaravayan televizyoneke ku bi şev û roj bernameyên bi rêya satelîtê pêşkêş bike divêt; herweha dezgehên radyo, rojname û kovar. Karmendên van “muesseseyan” divêt ji nav zanyar û pisporan bêtir bijartin, bi hevpeyvîn û îmtîhan, ne ku ji nav mirûdan û navmezinan. Amanca van dezgehên televizyon, radyo û weşanên çapemeniyê divêt ber her tiştî parastin û pêşxistina zimên be, herweha perwerdekirin û pêşxistina gelê kurd bi metodên li ser hîmê gotina rast û mentiqî, ne bi rêya propaganda û hêvotina li dij yek û tir. Pêwîst e bête pejirandin ku bêyî hebûna zimanê kurdî kurd û Kurdistan peyvên bêyî xwebêj in. Bêguman e ku bi cîhkirina daxwazeke wisa li gor şert û mercên li ber çavan xewn û xeyal e, lê kat hatiye ku em kata xwe ne ji bo pirsên wek ya kumik û nizanîm çî terxan bikin, lêbelê ji bo amanc û daxwazên mezintir.

Siyasetmedarên gelekî divêt bikaribin pêşerojê bidin ber cav, ne tenê pêşeroja li dû pênc salan, lê ya li dû sed û du sed salên din; û zanyar û nivîskarên neteweyêke pêşketî pêwîst e ne tenê ji neyarên neteweya xwe bêtirs bin, lê herweha ji partiyên wê neteweyê bi xwe jî. Heke partiyên me rast ji bo kurd û Kurdistanê têdikoşine û heke em bipejirînin, kurd û Kurdistan bêyî zimanê kurdî pêşeroj nînin, wê demê em ê nikaribin înkâr bikin ku parastin û pêşvebirina zimanê kurdî mezintirîn çek e ji bo têkoşîna neteweyî. Heke wisa be, pêwîst e partiyên mezin yên Kurdistanê bi kêmasî 25 % ji budcayên xwe ji bo parastin û pêşxistina zimanê kurdî bidin encûmeneke kurdistanî ji mirovên bijarte, bi amanca bi rêxistina rê û rêçikên misogerkirina wê yekê ku li dû sed salên din zimanê kurdî dê ne tenê hebe, lê dê zimanekî yekgirtî û di nav axifgerên xwe de bi hêz be. Tevî ku rewşa li holê bi cîhkirina hêviyêke wisa ji realiyetê dûr dihêle jî, nivîskarên kurd pêwîst e ji bo realîzekirina vê hêviyê bi can û bêhn têbikoşin, qe ne be ji bo xatirê dîrokê û berpirsiyartiya li hember nifşên sibe û dusibe.

# Edebiyat û zanistiya hunerî

N. Zaxuranî

Weke ku rind tê zanîn, zanistîya edebî peywendîyên gelekî organîkî ji nêzik ve bi zimanzanistîyê re hene. Heger ku mirov li ser vê yekê baş birame, mirov bi hesanî dikare bibîne ku ev yeka ha tehlikeyekê bi xwe re diafirîne. Lewra, pirê caran ev yeka ha dibe sersebebê ku mirovê edebîyatzan ji mijara xwe dûr bikeve û li ser mijarên ku ji zimanzanyarîyê re dibin mijar ji nêzik ve serê xwe biêşîne. Bi qasî ku tê zanîn, zimanzanistî, bi alîkarîya berhemên ku bi saya zimên tîhî hûnandin li ser geşbûna qanûnên hemû zimanên gelên cihanê lêkolînan li dar dixê û hewl dide ku wan bi piralî şîrove bike. Carinan, mirovên edebîyatzan jî didin ser şopa wan, hingandê jî mirovê edebîyatzan li ser berhemên ku tu tîkîlyên wan bi hunerê re tune ne, mijul dibin. Bêguman, mirov dikare di vî wari de gelek mînanan bide, lê di vê pevgirêdanê de Mamoste Cigerxwîn mînakeke herî berbiçav e. Mamoste Cigerxwîn di serpêhatina temamê jiyana xwe de mîna şair di nav hemû rafên gelê Kurdistanê yê ji hev cuda de tê naskirin. Lê, dema ku mirov di derbarê jiyana Mamoste Cigerxwîn de xwedîyê agahdarîyên berferê be, wî çaxî mirov dibîne ku Mamoste Cigerxwîn ji bilî şairîya xwe, li ser gelek mijarên ku nekar û barê şairan e, kar û xebatên heja li ser li dar xistine. Mamoste Cigerxwîn hê jî dema feqetîya xwe ve hewl daye ku şairîya xwe li ser şopa şairê şairan ya Melayê Cizîrî bi xwîn û can bike. Lê, mijara şairîya Mamoste Cigerxwîn mîna ya Melayê Cizîrî ne li ser "Selma Sehî" bû, li ser evîneke niştîmanperwerî gelekî bi dilşewat bû. Herçiqas çarînên Mamoste Cigerxwîn ew çarçova klasîk ya ku çarînên Melayê Cizîrî li ser hatibûn danîn hinekî bi vî alî an jî bi alîyê din de zewirandibe jî, bi temamî çarînên wî ji çarçova klasîk xilas nebûn. Bela vê yekê jî, mirov dikare bi hêsanî çarînên wî di nav klasîka "nûjen" de nas bike. Ango, mirov dikare şairîya mamoste Cigerxwîn mîna pîrekê di navbera şairên klasîk û yê nûjen de binirxîne.

Bêguman, Mamoste Cigerxwîn heta bi ciheki di vî kar û barê xwe de bi serketî tê xuya kirin. Lê, ji alîyê din ve jî, Mamoste Cigerxwîn li ser dîroka Kurdistanê - qî ya kevnar û qî ya nû - berhemên bedew ji gele Kurdistanê re



dîyar kirine. Herweha hinek nivîskarên "Nûdemê" - ku kar û barê wan yê bingehîn li ser huner e - bi mûnasebeta çarsedsaliya Şerefnama bi nav û deng ya Şerefxanê Bedlîsî gotûbêjên bi rêk û pêk li dar xistine.

Bêguman, mirov dikare di vî wari de mînakên ji dema kevnar ya filolojîya klasîk jî bide. Hinek zanyarên wê demê bê çawa kar û xebatên xwe li ser trajedyên Sophokles an jî li ser hicwên Horas dikirin, her weha van zanyaran lêkolînên bi rêk û pêk di derbarê "Anabasîsa" Ksenophon ango li ser berhemeke bi reng dîrokî kar û xebatên hêja pêk tanîn. Weke ku ji mînakên jorîn bi hêsani tê xuya kirin, nivîskar an jî hunermendên jorîn baş dizanîbûn ku objeya zanistîya edebî edebîyata bedew bi xwe ye jî, disa jî kar û xebatên xweyî weha yên ku di rêzên jorîn de behsa wan hate kirin, pêk tanîn. Ji xwe, bi qasî ku tê zanîn, heçî karmendîya (wezîfa) zanistîya hunerî ew e ku bi tevahî hemû babetên hunerê ligel şaxên wê û bi taybet jî objeya zanistîya edebî ku ew jî edebîyata bedew e, bi gelek alî şirove bike û lêkolînên berferê di derbarê wê de li dar bixe.

Ji bo ku pirsgirêk di vî wari de rind bê têgihîştin, divê ku mirov parîkî serê xwe li ser mefhûma hunerê biêşîne, da ku bi vî awayî ji pirsgirêk ji bo xwendevanên hêja bê zelal kirin. Di destpêkê de divê ku bê gotin ku huner li ser tecrûbê û mehareteke bi şax û per tê bi dest xistin. Bi peyveke din, mirovên xwedî tecrûbe û mihareteke mina deryayê kûr ancax dikarin bi kar û barên hunerî dakevin. Ji ber vê yekê jî, huner an jî hunermendî li ser bingehê berhemkirina tiştên ku mirov di jiyana rojane de heyranê wan dimine, tê bi cih û war kirin. Bêguman, ji bo mirov bikaribe ji heqê vê yekê bê der, divê ku mirov di jiyana rojane de xwedîyê qabîliyet û hostatîyeke mezin be.

Bêguman, mirov nikare kar û barê hunerî bi her awayê hostetîyê bi rê ve bibe. Li vir amanc ji hostetîye ew e, berhemên ku peydebûna wan bi saya tecrûbe û maheretên kûr û payebilind tîn afirandin, bixwe ye. Ji ber ku cêrvan an jî jineke tevnevan ku di jiyana rojane de bi kar û barê cêr û tevnê dadîkeve jî, mirov dikare wî / wê mîna hostayekî / hostayekê bi nav bike. Ma gelo mirov dikare ji wê / wî re bibêje hunermend? Bî ya min na ! Ji ber ku kar û barê wî / wê ne li gore kar û barê hunermendan, ango li gora hin pîvan, nisbet û ahangê tê bi rêvebirin. Lê, heçî peyker, wêneker, edebîyatzan, mûzîkvan û şanoger e li gor pîvan û ahangêke estetîkî berhemên xwe diafirînin û pêşkêşî xwendevan û bînerên xwe dikin. Bela vê yekê jî, mirov dikare ji kar û xebata hunerî re bibêje ku ew bi alîkarîya kar û xebateke ku li gore qanûnên xweşikbûnê tê pêk anîn, dest nişan bike.

Ji xwe, xweşikbûna berhemên ku bi hunera destên hunermendan tîn afirandin, bi saya van her sê tiştên çê tîn wucûdê: Yek, form, dudu, naveroka ku li dorbera formê peyde dibe, sisê, fonksiyona wan ya ku ji bo şirovekirinê xwedî rol e, di jiyana rojane ya civakî de. Bêguman, mirov dikare bi hêsani

ji yekitîya organîkî ya van her sê tiştên ku li jor bi kurtî behsa wan hate kirin, mîna qanûna xweşikbûnê bi nav bike. Berhemên ku li ser bingehe vê qanûna xweşiktîyê tên afirandin, xwedî fonksiyonên gelekî ji hev cuda ne. Ji ber ve yekê jî, bê çî di berhema hunerî de xweşik e, dikare ji yên din cudatir bê xuya kirin.

Wek tê zanîn, tiştên mîna cêr ku ji axê çê dibin, û yê mîna merş, têr, çewal, şalê kayê û cilika limêjê ku bi saya kar û barê tevnê tên çêkirin, hewcedarîyên jiyana mirovantîyê ya rojane ku birekî ji jiyana kulturî ya madî ye, pêk tînin. Ji xwe, materyalê ku di hûnandina wan de hatîye bi karanîn, wan betir rengîntir dike. Ji bilî vê yeke jî, aletên ku di pêvajoya berhemkirina wan de tên bi karanîn, kalîta wan dîyar dike.

Taybetmendîya herî sereke ya tiştên pratîkî ku di jiyana rojane de tên bi karanîn, ev e: Ev berhemên pratîkî, divê ku bersiva hewcedarîya jiyana mirovantîyê ya rojane bidin. Lê, divê bê gotin ku mirov nikare ji wan bixwaze ku jiyana ji derveyî wan ji alîyê wan ve bê şirove kirin. Ango, ev tiştên madî yên bi reng kulturî jiyana civakî ya ji derveyî wan - çî ya bi giştî û çî ya ferdî - di xwe de bi cih û war nakin, nikarin bi tu awayî mîna mirêkê bidine xuya kirin.

Lê hunerên din yên ku xwedî form û naverok in, bersiva kulturî ya madî nadin, ji berevajîya vê yekê hêla kultur ya wateyî( manewî) di xwe de bi cih û war dikin. Ev bedewbûna wan, berhema şaxên huner yên serbixwe yên mîna edebiyat, muzîk, wênakêşî û yên din e. Ji xwe, ev berhem ne ji bo bi cihkirina hewcedarîyên mirovantîyê yên pratîkî / madî ne. Hewcedarîyên mirovantîyê yên bi reng wateyî, giyanî û ramanî pêk tîne. Ji ber vê yekê jî, ev şaxên huner yên ji hev cuda rastîya jîyanê ya ku ji derveyî wan heye, bi alikariya imajan ji nû ve diafirîne. Bi alîkarîya vê afrandinê jî, mirovê hunermend li ser fenomenên hunerî şirovan li dardixe, lêkolînên zehvalî di derbarê wan de pêk tîne. Ji ber vê yekê jî, berhemên hunerî mîna xezîneyên bîrewerîya civakî tên bi nav kirin.

Vêca, mirov dikare bi hêsanî bibêje ku peyva hunerê mîna ku di rêzên jorîn de li ser hate rawestan din, divê ku xwedî hinek normên estetîkî be, da ku bi vî awayî bi wateya xwe ya bi çend alî bigunce. Lewra, mefhûma hunerê ji bo hunerên plastîkî, anga ji bo wênakêşî, peykertî û mîmartîyê jî, tê bi karanîn. Bêguman ev şaxê hunerê pir kevnar e û jiyana mirovantîyê bi gelek alî dineqîşîne. Ji ber ku mijara vî şaxê hunerê hêlîna mirovan bi xwe ye, di serpêhatina jiyana dîrokî de ji alîyê mirovantîyê ve gelekî balkêş hatîye dîtin.

Lê, çî heye ku objeya zanistîya edebî bi tenê berhemên edebî yên ku bi alîkarîya zimên tên hûnandin û bi awyekî ji awayê afrînerîyê tên berhem kirin, bi xwe ne. Ji ber vê yekê jî, zanistîya edebî ya ku berhemên hunerî bi saya

zimên şirove dike jî, mîna zanîstîya muzîk û şanogerîyê zanîtîyêke hunerî yeke xweser e. Bi çî awayî dibe bila bibe, heger ku mirovî zanîstîya edebî ji şaxên din yê huner qut bike, dê geşbûna zanîstîya edebî bê rawestandî.

Lê, ji aliyê din ve jî, divê ku weke prensîb baş bê zanîn ku karmendîya (wezîfa) zanîstîya edebî û ya zimanzanîstîyê di dema ku berhemên edebîyata bedew tî berhem kirin de, gelekî ji hev cuda ne. Ji ber ku karmendîya serekî ya zimanzanîstîyê ew e ku berhemên edebîyata bedew ji aliyê xezîna peyvan û ji aliyê rêzimanîyê ve şirove bike. Lê heçî karmendîya zanîstîya edebî ye, di destê pêşî de ew bi tenê berhemên edebîyata bedew ji aliyê naverok û forma wan ve bi gelek alî şirove dike. Ji bona zanîstîya edebî zimanê berhemên bedew yê hunera edebî bi tenê aliyek ji aliyê forma wan e. Bêguman ev aliyê forma berhemên hunerî bi aliyê din yê forma berhemên hunerî re xwedîyê têkilîyên organîkî ye.

Berîya her tiştî, mirovê edebîyatzan dema ku berhemên edebî şirove dike, di destê pêşî de bala xwe dide ser vê gotina wê ya bi reng hunerî û wê li gore naveroka wê ya bi reng ramanî dinirxîne, ango li berhema hunerî ne li gora nerîna mirovê zimanzan dinere, ji berevajî li gora pîvanên estetîkî, pîralî dinirxîne. 25 /01 / 1998 Stockholm

# Mîretiya mirinê

Memo Darrêz

Ji min mepirse hemû tiştên ku dijîn!  
bi bayê kêf û jiyane westiyame ez  
Kî dikare xwe biparêze ji hêza mirinê bi kul!  
Gilgamiş 'dahî' bi qedera xwe razî bû li împaratoriya wê

Meyê ba min bi jana hebûnê!  
mamik e ew ji pêşî ta dawî  
Sînorê mîretiyê digiha ku?  
Nûh jî xelas ne bû ji lasera Araratê

Bi kirasên seqem xwe meneqîşîne, zelîl yar!  
ne mirov in disekînin mirinê  
Bûye siûda wan, berxwedan û dijraberî  
dij cenawirên muxî!

# Rojek ji rojên zîndana Diyarbekirê

Laleş Qaso

Dewleta tirk, li girtîgeha Diyarbekirê bi destpêka sala 1981ê re, di pey ku bi wahşetek mezin êrîşî ser girtiyan dike û girtiyan di hindurê demek kurt de teslîm digire, wahşeta xwe bi hawayekî sistematîk heta îlona sala 1983an didûmîne. Girtiyan, ji sala 1981ê heta sala 1983an "Dema Teslîmîyetê" û ji sala 1983an vir ve "Dema Berxwedanê" digotin. Îcar êşkencên ecêbnedîtî jî hemû di salên teslîmîyetê de hatine kirin! Yanî girtî hem wê ji desthîlanîn bikeve, jî mehmetçîkê misilman re têkeve temenê û li gora rêbaz û destûrên wî bilive û hem jî mehmetçîk wê wahşeta herî mezin pê bike. Girîng e! Di hindurê deh salên ku ez li girtîgehê bûm, 55 kes hatine kuştin. Belkî ev hejmar hîn bilindtir be jî. Ji van 55 kesan hejmarek piçûk ne têde, min ên din hemû nas dikirin. Lîsta wan li ba min e. Çawa, bi çi hawayî? hatine kuştin min nivîsiye.

Girtîgeha Diyarbekirê goristanek bajarî bû. Di vê goristanê de ji bilî şêxan hemahema bibêjin ji her tebeqê insan hebûn. Desthilatiya girtîgehê jî ev insan bi carekê ve dabûn ber xwe û bêwestan êşkence bi hemiyên dikir. Di vir de ezê li ser sebêbên kuştina Cemal Kiliç û bê Cemal bi wahşeteke çawa hatiye kuştin, rawestim.

Qanûnek mehmetçîk yek jê jî ezberkirina merşan bû. Ji bilî "Türk andî" û "istiklal marşî," wekî din 52 merş hebûn. Her girtî divabû ev merş hemû ezber kiribana. Îcar a herî zor ku her merş jî divabû li gora meqamê xwe bihata ezberkirin. Li gora qanûnên ku mehmetçîk danîbûn yextiyar, xort, zarok, pîrek kî dîba bila biba, herçendî nizanîba bi tirkî dîsa jî mecbûr bû ku merşan ezber bike. Bi rastî yextiyarên kurd û ên wek Hansê elemanî, Nebîl Farac Arabî û Mûhemmed Salih Mûhemmedê iraqî li ser ziman û ezberkirina merşên tirkî, pir êşkence dîtine. Di vir de divê ez ji yûnaniyan re jî bibêjim ku bi rastî, li girtîgehê pirên merşan namûs û şerefa wan hedef digirt. Hemahema di her merşa ku bi girtiyan xwendinkirin didan, çend gotinên kotî ji bo yûnaniyan hebûn. Ji bilî vê bi gotin, mehmetçîkan her roj çewalek siqêf bi şeref û namûsa milletê yûnan dikirin. Belê mixabin yûnanî jî ji bo tirkan hîn jî dikarin li welatê xwe radyo û televizyonan saz bikin; dibistanan ji wan re

vekin û tuxmê tirk zêde bikin!

Mehmetçikan di sibata sala hezar û nehsed û heyştê û duduyan de, Cemal Kiliç ê hîlwanî li hicrên qawîşa sih û pêncan bi çengelê zilmê ve daliqandin! Cemal xortekî bîst salî, ne çûbû dibistanên tirk û hînî zimanê tirkî ne bûbû. Mirovekî bêdeng, bi edep û kemlan bû. Ev mirov gotineke bi tirkî nizane û wê merşa istiklala tirk ezber kiriba. Mehmetçikan Cemal bi derabên hesinî ve girêdan û ji hev re gotin:

*"Bu köpek oğlu köpeye ilk önce istiklal marşının satır sayısına göre, ölmese kelime sayısına göre, ölmese hecelerın sayısına göre, yine ölmese harflerin sayısına göre jop vuracağız! Dayan yavrum!.. Emê pêşî li vî kûçik lawê kûçikî li gora hejmara rêzên merşê, eger nemir li gora hejmara wuşeyan, eger nemir li gora hejmara kîtan, eger dîsa nemire emê li gora hejmara tîpan jopan lêxin! Xwe li ber bigire çêlîka min!.."*

Di destê mehmetçîkekî de merş, yek dixwîne, yek dihejmêre û dudu jî bi jopan li Cemal dixînin.

Merşa istiklala tirk ji 40 rêzî, 40 rêz ji 247 wuşan û 608 kît û 1419 tîpan pêk hatiye. Yanî mehmetçîkên misilman, bi hejmar pêşî wê 40 jopî li Cemal xînin; gava Cemal nemira wê hejmar serguherî hejmara 247 wuşan bûba, ku Cemal bi 247 jopan jî nemira, wê li gora hejmara 608 kîtan pê re bûba! İcar ku ev hêsîr bi 608 jopan jî nemira, wê wî çaxî jî bi hesabê 1419 tîpan pê re bûba! Cemal wê 1419 jopên mehmetkî bixwe û wê hîn jî ne miriba ha!

"Aaaaaay! Ay hewarêêêê! Ay yabooo! Aaaaaay!.."

"Ulan orsupu çocuğu hala kiroca konuşuyor!.."

"Oooof! Ay dayêêêê!.."

"Vurun kahpeye!daha hızlı daha hızlı vur!.."

"Aaaaaaaa! Aaaaaa! Aaaa! A a a a a!.."

"Ulan bu nebiçim adam ölmüyor a..na si...ım!.."

"Hi hi hihihihihhi!Hi hihi hi! İi iii iii! İii iii! İiii!.."

"Vurun daha yaşıyor! Sayılar daha çok çok çok, vurun!.."

"İi i i i i i i i i i!"

"Gastapo, kafasını kaldır bir bak yaşıyor mu? si..ım dölü!.."

"....."

"Yok olmuş ibne!.."

"İyice kontrol et dah çok vurmamız lazım!.."

"....."

"Tamam ölmüş!.."

Gava ku mehmetçikan digot:

*”Ruhumun senden ilahi şudur ancak emeli!  
 Değmesin mabedimin göğsüne namahrem eli!  
 Bu ezanlarki, şهادetleri dinin temeli!  
 Ebedi yurdumun üstünde benim inlemeli!  
 O zaman vecd ile bin secde eder varsa taşım!  
 Her cerihamdan ilahi boşanıp kanlı yaşım!  
 Fıskırır ruh-i mücerred gibi yerden naşım!  
 O zaman yükselerek arşa değer belki başım!..”*

Cemal ji zûde can dabû. Bi kuştina mirovperestekî hêsîr, serê bavê mehmetçikan Mehmet Akîf Ersoy, careke din gihabû erşê Xwedê! Cemal can daye û mehmetçik jî îcar ne bi jop, bi daran li vî termê ku bi derabên hicrê ve girêdayî û derabe ji xwîna wî hemû bûne kulîlk, dixînin! Kewşkêş (ereboka çopê) anîn û li hindama term sekinandin. Bi kêrê kindir qetandin term ji hewa de hate xwar. Term ji navkê berjêr de di hindurê kewşkêşê de, serî û çepil jî hemû li ser çementoyê, ji her der wî xwîn dinisile û mehmetçik jî di navê xwînê de didin camcamkan! Serkên potînên xwe dan bin sênga wî, term di kewşkêşê de li piştê rûnişt. Serî li hêlekê, ling li hêlekê daliqandî, destek wî bi vî alî yek bi wî alî ve bi ser qiraxa kewşkêşê de xilyayî bû; mehmetekî xwe da pişt, bi her du destekên kewşkêşê girt meşiya, ên din jî dan pey û bi dengê herî bilind gotin:

*”Dalgalan sen de şafaklar gibi, ey şanlı hilal!  
 Olsun artık dökülen kanlarımın hepsi helal!  
 Ebediyen sana yok, ırkıma yok izmi hilal!  
 Hakkıdır hür yaşamış bayrağımın hürriyet!  
 Hakkıdır hakka tapın milletimin istiklal!”*

Kurdekî hêsîr pir bi wahşî kuştine û li ser termê vî hêsîrî, kuştina te azadiya miletê min e, bêku te bikujim nikarim bijîm, dibêjin; li ser termê te ancaz dikarim serbilind, bi şer ef bibim û bigihêm heqaniya Xwedê. Wilo dibêje ev merş. Wan wilo digot û kuştîyê me jî di hindurê kewşkêşê de dest bi dû de liba dibûn! Te digot qey tarîxa xwe û wan lêdike; dilopên xwînê bêyefş bi ser çementoyê de digindirîn û hawêrdor xêsk vedidan! Wey mala min!

Erê ey Xwedayê dest daye zilm, qey hêsîr in em ebed! Li dojeha ku te wek “qeder” li aniya kuroyan nivîsîbû û te mehmetçik kiribûn zebaniyên wê, kuroyên kurd bi saxî dibiraştin! Dûra nebêje min ne bihist û min ne dît. Ma hema tenê qedera te ji bo me kuroyan heye, ev çi mesele ye! Ez bi xulam ey Zulcelal, ji te mestir kes nîne. De ka bibêje ma em herin ba kê û giliyê vê zir zilma li ser xwe bikin!!! Hema bila kafirê herî mezin nebe hêsîrê destê ebdê tirkên te ên misilman û hew!

### **De ka were û li min guhdar bike!**

Tenê hema di çûn û hatina dadgehê de,  
her saniyek êşkencê,  
bi qasî qonaxa sed salî dirêj dihat!  
Te digot qey zeman sekinî bû;  
ne seet dimeşiya û ne jî ro diçû ava;  
can di nav lapûşkên zilmê de kêferat dikir!  
Can tev de bi birîn,  
zilmê jî bêyefş kezab diniqutand birînan;  
ne can dimir û ne jî kezab diqediya off!  
Ax hewar kurdino ew çi roj bûn!!!  
Ew çi rojên ku bi carekê ve ji rehên jiyane hatibûn birîn!  
Jahra binê zemanan bi ser serê me de dirijandin hewar!

Erê tu ê çawa ji bîr bikî!  
de ka bibêje min lo lo kurdooo!  
Hemû bi xwîn û elem,  
wilo bêdeng;  
dev di erdê de û mîna baranê hêsir dibarandin!

Ey ew eşqa min a ku ji pêsêrên wê,  
xwîna min diniquete were!  
de ka were cana min,  
û serê xwe deyne ser vê sênga ku mehmetçikên teres  
yekser terişandine û li zindanê guhdar bike!  
Ji bo te wek volkanan,  
bi ser zilmê de hindik dil ne teqîyan!  
hindik dilan li ser te,  
di hindurê xwe de bombe ne tefandin hesreta min!  
Ranêbû destên wan ji ser birînan,  
hema bêhnekê!  
Di nava gola xwînê de  
emrek buhurandin eşqa min!  
Emrek, emrek, emrek!..



# Rûsipîkirin

Zeynelabîdîn Zinar

Çi dema ku kongreyek çêdibe, di kongreyê de serokê wê komelê yan sazgehê dema ku radibe û dipeyive, yan jî berpirsyarê malî ku radibe hesabê lêçû û hatiniyê pêşkêş dike, nûnerên kongreyê jî bi derbekê destên xwe radikin hewa û dibêjin ku ango "erê, rast e." Îcar dîwan jî dibêje: "Ev xala rûspîkirinê hate girtin." û li xaleke din tê domandin. Lê eger nûner bêtî "na!", dîwan nabêje ku "ev kes hate rûreşkirin."

Çewa ku di piraniya zimanan de hene, herweha di zimanê kurdî de jî çî bêtî ku heye, çewa ku hevmaneyên wê (sinonim) hene eynî wisan diimaneyên wê (mutsas) jî hene. Mesela: Diimaneya rûspîkirinê, rûreşkirin e.

Bi rastî çî kongreyeke ku ez bi xwe jî tê de beşdar bûme û gava ku mesela "rûspî" kirinê hatiye holê, ez xwe bi xwe sêwirîme û min gotiye: "Gelo, ma van biraderan rûreşiyek kiriye ku kongre niha wan ji binê wê gunehkariyê derdixîne û ruyê wan sipî dike?" Yan jî "Ji bedêla ku ew bêne perûkirin, ji ber fedekariya ku kirine ew bêne xelatkirin, vêca nasnavê rûspîtiyê ku vajiyê wê rûreşî ye, li wan datînin?"

Ev bêtî "rûspîkirin"ê yan jî "rûspîkirin" çî ye û ji ku hatiye, heta niha jî nivîskar û siyasetvanên kurd lê nesêwirîne. Herwekî bêtî "çavekirî" ku pir kes bi niyeta "xasûk", "dekvan" û "dolabgêr" bi kar tînin. Lê di kultura kurdî de, ew bêtî bi mana comerd, camêr û nandayî ye.

Ji bo ku em rind bizanibin ka maneya "rûspî" kirinê çî ye, pêşî divê ku em berê xwe bidin xelkê, ka ew çî dibêjin û bi çî amacê bi kar tînim.

T.A.:

- Gava tiştêkî pir xirab li dora meriv rû dide û meriv nakeve navê, hemahema bi hindikî jê difilite, meriv dibêje: "Xwedê ruyê me sipî kir ku em ne ketinê!"

N.K.:

- Gava yek nebûkariyekê bi meriv ve tîne, lê meriv li ber xwe dide û dide peyitandin ku meriv ne lêkerê wî karê kirêt e, hingê meriv xwe bi xwe dibêje: "Xwedê ruyê min sipî kir. Ekene hindik mabû ku ez ê rûreş bûbûma!"

Ez bi xwe jî yek ji wan merivan im ku pir li nava xelkê, xasma li nava gundiyan Kurdistanê geriyame û gelek caran pêrgê peyvika "rûreşkirin" û "rûsipîkirin"ê bûme. Li piraniya herêman, ew bêje bi vê amaca ku li jorê hate diyarkirin tê bi karanîn.

Bêjeya rûreşî yan rureşkirin, xeysetek e ku ji jinekê re tê gotin ku wê xwe ji aliyê namûsê ve hetikandiyê. Peyva devê xelkê eynî weha ye: "Filankesê ruyê xwe reş kir." Bêjeya rûsipî yan rûsipîkirin jî, xeysetek e ku ji jinekê re tê gotin ku wê xwe ji aliyê namûsê ve ji hetikandinê filitandiyê. Peyva devê xelkê ji vê re jî eynî weha ye: "Filankesê ruyê xwe sipî kir."

Xeysetê "rûreş"tiyê ne tenê ji bo pîrekan, lê hin caran ji bo zilaman jî tê bi karanîn. Yanî çaxê zilamek dest davêje jineke ku destmêja wî jê naşikê, nasnavê rûreştiyê lê jî tê dayîn. Xelk dibêje ku filankes ruyê xwe reş kiriye.

Îcar piştî ku mana bêjeya "rûsipîkirin"ê di zimanê kurdî de û li gor kultura kurdî ev e çewa ku me li jorê got, vêca em ê rabin û nasnavê "rûsipî"kirinê ku vajiya wê "rûreş"kirin e, çewanê li wan kesên welatparêz deynin, ku ewqas fedekarî kirine?

Li gorî geryan û lêkolîna min, peyvikeke ku şûna vê peyvika bi teşqele bigire, tenê "silmandin" e. Ev bêjeya silmandinê kok e, kirina wê disilmîne (silmandiyê, silmandibû). Ev bêje di nava xelkê de, bi mana dawêşandina tiştêkî ji êş û nexweşiyên tê bi karanîn.

Mesela min bi xwe pir caran dîtiye ku, xasma jî li nava koçeran, dema zarokek nexweş diket, li derve agirekî gur dadidan û jineke navsere bi herdu nigên zaroka nexweş digirt û li ser wî agirê gur dihejand, ango wê zarokê ji êş û der dan dadiweşand; ew êş û nexweşî tevek diketin nava êgir .

Îcar eger em li koka bêjeya "silmandin"ê bigerin, ez dibêjim ku hîç têkiliya wê bi zimanê erebî ve tune. Lewra bêjeya silm, selam, îslam-bisilman-selamet bi xwe jî ne erbî ne.

Hêvîdar im ku zimanzanên kurd, li ser vê bêjeya bi teşqele rawestin û siyasethvanên kurd jî gava ku di kongreyên xwe de behsa bêjeya "rûsipîkirin"ê dikin, di binê simbêlan re nebişirin.

Lê tiştê ku ez lê disêwirim ev e: Ha we dît ku di kongreyekê de berpirsyartiya malî di destên jinekê de bû û bêjin wê ku di wê xalê de wê rûsipî kirin. Hingê ew jî ma wê nebêje ku wê çî rûreşî kiriye?

je: "Ev xala rûsipîkirinê hate girtin." û li xaleke din tê domandin. Lê eger nûner bêjin "na!", dîwan nabêje ku "ev kes hate rûreşkirin."

Çewa ku di piraniya zimanan de hene, herweha di zimanê kurdî de jî çî bêjeya ku heye, çewa ku hevmaneyên wê (sinonim) hene eynî wisan dijmaneyên wê (mutsas) jî hene. Mesela: Dijmaneya rûsipîkirinê, rûreşkirin e.

Bi rastî çî kongreyeke ku ez bi xwe jî tê de beşdar bûme û gava ku mesela "rûsipî" kirinê hatiye holê, ez xwe bi xwe sêwirîme û min gotiye: "Gelo, ma van biraderan rûreşiyek kiriye ku kongre niha wan ji binê wê gunehkariyê derdixîne û ruyê wan sipî dike?" Yan jî "Ji bedêla ku ew bêne perûkirin, ji ber fedekariya ku kirine ew bêne xelatkirin, vêca nasnavê rûsipîtiyê ku vajiyê wê rûreşî ye, li wan datînin?"

Ev bêjeya "rûsipîkirin"ê yan jî "rûspîkirin" çî ye û ji ku hatiye, heta niha jî nivîskar û siyasetvanên kurd lê nesêwirîne. Herwekî bêjeya "çavekirî" ku pir kes bi niyeta "xasûk", "dekvan" û "dolabgêr" bi kar tînin. Lê di kultura kurdî de, ew bêje bi mana comerd, camêr û nandayî ye.

Ji bo ku em rind bizanibin ka maneya "rûspî" kirinê çî ye, pêşî divê ku em berê xwe bidin xelkê, ka ew çî dibêjin û bi çî amacê bi kar tînim.

T.A.:

- Gava tişteki pir xirab li dora meriv rû dide û meriv nakeve navê, hemahema bi hindikî jê difilite, meriv dibêje: "Xwedê ruyê me sipî kir ku em ne ketinê!"

N.K.:

- Gava yek nebûkariyekê bi meriv ve tîne, lê meriv li ber xwe dide û dide peyitandin ku meriv ne lêkerê wî karê kirêt e, hingê meriv xwe bi xwe dibêje: "Xwedê ruyê min sipî kir. Ekene hindik mabû ku ez ê rûreş bûbûma!"

Ez bi xwe jî yek ji wan merivan im ku pir li nava xelkê, xasma li nava gundiyên Kurdistanê geriyame û gelek caran pêrgê peyvika "rûreşkirin" û "rûsipîkirin"ê bûme. Li piraniya herêman, ew bêje bi vê amaca ku li jorê hate diyarkirin tê bi karanîn.

Bêjeya rûreşî yan rûreşkirin, xeysetek e ku ji jinekê re tê gotin ku wê xwe ji aliyê namûsê ve hetikandiye. Peyva devê xelkê eynî weha ye: "Filankesê ruyê xwe reş kir." Bêjeya rûsipî yan rûsipîkirin jî, xeysetek e ku ji jinekê re tê gotin ku wê xwe ji aliyê namûsê ve ji hetikandinê filitandiye. Peyva devê xelkê ji vê re jî eynî weha ye: "Filankesê ruyê xwe sipî kir."

Xeysetê "rûreş"tiyê ne tenê ji bo pîrekan, lê hin caran ji bo zilaman jî tê bi karanîn. Yanî çaxê zilamek dest davêje jineke ku destmêja wî jê naşikê, nasnavê rûreştiyê lê jî tê dayîn. Xelk dibêje ku filankes ruyê xwe reş kiriye.

Îcar piştî ku mana bêjeya "rûsipîkirin"ê di zimanê kurdî de û li gor kultura kurdî ev e çewa ku me li jorê got, vêca em ê rabin û nasnavê "rûsipî" kirinê ku vajiya wê "rûreş" kirin e, çewanê li wan kesên welatparêz deynin, ku ewqas fedekarî kirine?

Li gorî geryan û lêkolîna min, peyvikeke ku şûna vê peyvika bi teşqele bigire, tenê "silmandin" e. Ev bêjeya silmandinê kok e, kirina wê disilmîne

(silmandiye, silmandibû). Ev bêje di nava xelkê de, bi mana dawêşandina tişteki ji êş û nexweşiyên tê bi karanîn.

Mesela min bi xwe pir çaran dîtiye ku, xasma jî li nava koçeran, dema zarokê nexweş diket, li derve agirekî gur dadidan û jineke navsere bi herdu nigên zaroka nexweş digirt û li ser wî agirê gur dihejand, ango wê zarokê ji êş û der dan dadiweşand; ew êş û nexweşî tevek diketin nava êgir .

Îcar eger em li koka bêjeya "silmandin"ê bigerin, ez dibêjim ku hîç têkiliya wê bi zimanê erebî ve tune. Lewra bêjeya silm, selam, îslam-bisilman-selamet bi xwe jî ne erbî ne.

Hêvîdar im ku zimanzanên kurd, li ser vê bêjeya bi teşqeke rawestin û siyasethanên kurd jî gava ku di kongreyên xwe de behsa bêjeya "rûspîkirin"ê dikin, di binê simbêlan re nebişirin.

Lê tiştê ku ez lê disêwirim ev e: Ha we dît ku di kongreyekê de berpirsyartiya malî di destên jinekê de bû û bêjin wê ku di wê xalê de wê rûsipî kirin. Hingê ew jî ma wê nebêje ku wê çî rûreşî kiriye?

# Xerîbî zor e, sirgûnî zehmet e!

Lokman Polat

“Bila biqede sirgûniya min, dixwazim di welatê xwe de bijîm, bihêlin di welatê xwe de bimirim.”

OVÎDÎUS

Xerîbî zor e. Jiyandina sirgûniyê zehmet e. Hezar derd û kul, êş û kelemê wê heye. Li ser zor û zehmetiya xerîbiyê nivîskarên edebiyata cihanê gelek nivîsên baş û balkêş, û gelek ceribandinên xweş nivîsîne.

Xerîbî, sirgûn, koçberî, bûye qedera ronakbîrên kurd. Kurdan rojnameya xwe ya pêşîn, pirtûkên xwe yên modern, saziyên xwe yên netewî û demokratîk li derve, li sirgûniyê pêk anîne.

Sirgûnî koçberî ye. Sirgûnî rewşek e, wezîyetek e. Serpêhatiya mirovahiyê ye, maceraya insanan e. Sirgûnî ji bo edebiyatê serkaniyek dewlemend e. Ji bo nivîskar jî welê ye. Êşên ku têne kişandin hestek nû pêşkêşî mirovan dike. Tenêti û hesreta welêt di can û ruhê mirov de tesîra xwe dike. Bêriya welêt, hesreta dîtina nas û dostan, heval û hogiran, malbat û merivan bandora xwe li ser ruhê mirov datîne. Li welatên xerîbiyê, li sirgûnê mirov hîn pirtir ji welatê xwe hez dike û bi zimanê xwe ve tê girêdan. Girîngiya axaftina zimanê xwe di jiyana xwe ya rojane de hîs dike. Nivîskar Joseph Brodsky dibêje, “Ji bo me nivîskaran sirgûn, berî her tiştî waqiya zimên e. Zanistiya zimanê zikmakîyê pêş ve dixê. Û xwespartina zimên yan jî jê dûrketinê pêk tîne.”

Yên sirgûnkirî tiştên ku bikaribin bikin di serî de divê, rastiya bînin zimên. Ew dengê gelê xwe ne. Ew berpirsîyar in. Gelek kes ji bo nêrînên xwe tên sirgûnkirin, an jî ji bo ku neyên girtin û nekevin zindanan ji welatê xwe derdikevin; welatê xwe terk dikin. Sirgûnî cihana mirov digehurîne. Mirov ji koka xwe tê qûtkirin. Ji bo ku mirov xwe bi koka xwe ve girêde, divê pêşî dest bavêje zimanê xwe. Xwe li ser zimên hûr û kûr bike. Mirov zanistiya zimên di sirgûniyê de pirtir hîs dike. Zimanê mirov di sirgûniyê de nasnameya mirov ya sirgûniyê her tim tîne bîra mirov. Nivîskarek li ku dibe bila bibe, ew bi zimanê xwe heye. Ziman dibe welatê nivîskar. Zanistiya nivîskarê sirgûnê li ser vê eksênê şikil digire. Lewra maneya hebûnê di vir de ye. Bi paşeroja xwe,

bi jiyana xwe û bi welatê xwe ve girêdan, têkilî, dan û sitandin bi ziman dimeşe.

\* \*

Dîroka sirgûniyê bi qasî dîroka mirovahiyê kevnar e. Sirgûn û koçberî tiştin ku bi insên ve girêdayî ne. Di bûyerên weha de; serhildan, berxwedan, têkoşerî û cezakirin heye.

Di rêveçûna sirgûniyê û di jiyana pêvajoya sirgûniyê de hin kelîme-bêjehene ku ji bo yên sirgûnkirî bûne wek bêjeyên alfabeyê. Herwekî; êş, bîranîn, bêrî, hesret, hest, coşî, koçberî, asteng, penaber, hizin, nasname, labîrent, doz, mixalefet, otorîte, xew û xeyal, tenêti û hwd.

Gelek nivîskarên edebiyata cihanê ji welatê xwe dûr ketine, hatine sirgûnkirin. Lê van nivîskaran di welatên xerîbiyê de gelek berhemên hêja afirandine. Wan bi zimanê xwe yên zikmakî berhemên edebî nivîsîne. Bi riya zimên be jî wan tucarî têkiliyên xwe ji welatên xwe nebirîne, têkiliyên xwe her tim domandine.

Julio Cortezarê arjantînî li Fransayê sîh sal e ku dijî. Ew dibêje: “Hetanî ku min bi zimanê xwe yê zikmakî nivîsî ez ji welatê xwe dûr nebûm.” Nivîskarekî din yê lafîn amerîkî, Asturias jî dibêje: “Min welatê xwe Guetemalayê di Parîsê de jiyand.” Nivîskar Juan Goytîsolo jî dibêje: “ Ji bo nivîskarê sirgûnê ziman şûna welat digire. Nivîskarên ku di sirgûnê de dijîn hîn pirtir li zimanê xwe xwedî derdikevin.” Nivîskarên ku di sirgûnê de dijîn bi dîroka xwe ve, bi welatê xwe ve tèn girêdan. Ew bi zimanê xwe dijîn. Gelek ji van nivîskarên sirgûnê di pêvajoya pêşerojê de, di cografya welatê xwe de kok davêjin û bi navûdeng dibin.

Tenêti, tenêbûyîn qedera nivîskarên sirgûnê ye. Tenêti hîseke wusa ye ku nivîskar bixawaze nexawaze nikare xwe jê dûr bixe. Nas û dost, heval û hogir, malbat û meriv, qebîle û eşîr hemû jî di welêt de ne. Nivîskarê sirgûnê bêriya wan dike. Hîsên wî yên nostalgîk geş dibin. Lewra sirgûnî hesret e. Hesreta bêriya paşerojê ye. Hesreta evînê, axê, jiyana berê ye; hesreta xwarin û vexwarina li welêt e.

Nivîskarê sirgûnê di sirgûniyê de gelek zehmetiyan dikêşîne. Di serî de dest bi jiyandina di nav civakek xerîb de dike û ev pê gelek zehmet tê. Ew vê civakê nas nake, zimanê wê nizane, xwe di nav de yên demdemî û xerîb hîs dike. Di serî de çavên wî tim li ser walêzê wî ye. Ew xwe li xerîbiyê miweqet dibîne. Nivîskarê sirgûnê xwe bi vegeerê diawiqîne. Di dilê wî de hesreta ku dê rojek vegere heye. Ew xwe bi vê dilxweş dike. Her çiqas ew dizane cihê ku ew dê vegeerê wek berê nebe jî, dîsa di dilê wî de vegeer heye. Viktor Hugo ji bo xeyala vegeerê dibêje; “ Heger azadî vegere ez jî dê vegerim.”

Dûrbîniya ji welêt, cih û warkirina di welatê xerîbiyê de awantajekê dide

nivîskar. Ew jî ev e: nivîskarê sirgûnê bi çavekî nesnel li civaka xwe dinêre. Ev nesnelî ji bo nivîskarên rexnegir maneya xwe hîn mezin e. Nivîskarên sirgûnê ji zilma dewletê û tehdâ civakî dûr, bêtirs fikir û ramanên xwe dikarin binîn zimên. Di hin tiştan de hin nivîskarên sirgûnê dişibin Prometheus. Ew jî wek wî li dij neheqiyê, zilmê û hovîtiyê derdikevin. Ew ji bo ku sazumanek bi adaletî pêk bê têdikoşin. Joyceyê irlandî di sirgûnê de pirtûka “Yên Dublinî” nivîsî. Wî di pirtûkê da jîyan û têkoşîna gelê xwe anî zimên. Pirsra Irlandayê kir mijara berhemên xwe.

Di edebiyata her miletî de cihekî girîng ya edebiyata sirgûnê heye. Edebiyata sirgûnê nakokiyên siyasî û civakî, guhertinên pêwîst dide biriqandin, dide bihîstin. Nivîskarên sirgûnê bi hêvî li pêşerojê dinêrin. Ew bi hêviya rojên ronî û xweş, rojên bextiyariyê têkoşîna xwe didomînin. Ew bi hêviya pêşerojek serfiraz dijîn. Lê ew welatê xwe û azadiyê tim bi bîr tînin. Rizgariya welat û azadiya gel armanca ber dilê wan e.

## Nivîskarên kurd yê sirgûnê

“Her welat ji insanên wî welatî re welat e, ji yekî din re jî cihê sirgûnê ye.”

T. S. ELIOT

Ji gelek welatan, nivîskarên wî welatî ji ber sedemên siyasî ji welatê xwe bazdane û çûne welatekî din û ew welat ji xwe re kirine cihê jîyanê, li wir bi cih û war bûne. Dîroka ronakbîr û nivîskarên kurd, dîroka sirgûnê ye. Gelek rewşenbîrên kurd li welatên biyanî mirine. Ji malbata Bedîrxaniyan û malbata Cemîlpaşa gelek ronakbîr li biyaniyê wefat kirine. Wek mînak, Nuredîn Zaza, Nurî Dêrsîmî, Îhsan Nurî Paşa û hwd. Ji yê dawî jî mirov dikare Mihemed Bekir mînak bide.

Nivîskarên Kurd yê penaber li welatên biyanî ji bo doza netewa kurd gelek kar û xebatên hêja kirin û berhemên giranbuha afirandin. Ew xabatên wan ê hêja, béguman perçeyek ji dîroka têkoşîna netewa kurd e. Pirtûkên dîrokî ku wan nivîsiye (Binêrin Nurî Dêrsîmî - Di Dîroka Kurdistanê de Dêrsîm, Îhsan Nurî - Dîroka Kurd, Zinar Silopî - Doza Kurdistan û herweha bi dehan pirtûkên din) beşek ji dîroka netewa kurd ronahî dike. Berhemên wan ji hêla dîrokê, zimên, çand û edebiyatê de serçavî ne; ji bo ronakbîrên kurd yê nûha çavkanî ne. Kovar û rojnameyên ku di wê demê de hatine weşandin, qîmet û rûmeta wan îro jî li cem ronakbîr û nivîskarên kurd gelekî bi qîmet in. Kovara Hawarê hêj jî di hêla rêziman û rastnivîsa kurdî û alfabe ya kurdî de rê nîşanê me dide. Em di gelek warên nivîsandinê de hîmên xwe ji kovara Hawarê digirin û ji xwe re dikin rêzan.

Wexta ku di 12ê îlonê de li tirkîyê derba askerî a faşîst çêbû û cunta hat ser hikim, piştî derbeyê gelek ronakbîr, nivîskar, welatparêz û şoreşgerên Kurd derketin derveyî welat û pîraniya wan di welatê Ewropa da cih û war bûn. Ev penaberên kurd yê siyasî li sirgûnê çapemenîya kurd û edebiyata kurd ya sirgûnê afirandin. Ji sala 1980î û vir ve ji 200î zêdetir kovar û rojnameyên kurdan li Ewropayê hatine weşandin. Herweha gelek pirtûkên edebî ji sala 1980î vir ve hatin weşandin. Gelek nivîskarên kurd yê penaber pirtûkên xwe yê yekem li ewropayê çap kirin. Edebiyata kurd a nûjen di vê demê de dest pê kir. Çend nivîskarên kurd ku pirtûkên xwe yê yekem bi zimanê tirkî weşandibûn, pirtûkên xwe yê din hendî bi kurdî nivîsîn û weşandin. Nivîskarên kurd yê ku li sirgûnê dijîn bi dehan romanên kurdî û bi sedan pirtûkên helbest û çîrokên kurdî weşandin. Di hêla çand, ziman û edebiyata kurd de nivîskarên sirgûnê yê penaber xizmetên gelek hêja kirin û hîn jî dikin.

Di nav nivîskarên kurd ên sirgûnê de du beş nivîskar hene. Beşek jê berî sirgûniyê jî nivîskar bûn. Beşa din jî li welatên xeribiyê, li sirgûniyê bûne nivîskar. Yê ku berî sirgûniyê nivîskar bûn:

Kemal Burkay, Mehmed Emîn Bozarslan, Rojen Bernas, Huseyîn Beysulen, Orhan Kotan, Mehmed Bayrak û hwd. Belê em dibînin ku li sirgûniyê hejmareke bilind nivîskar çêbûne. Wek mînak:

Mehmed Uzun, Hesenê Metê, Rohat Alakom, Laleş Qaso, Firat Cewerî, Lokman Polat, Hasan Yıldız, Mahmûd Lewendî, Mustafa Aydoğan, Aram Gernas, Zinar Soran, Osman Aytar, Siddîk Bozarslan, Süleyman Demîr, Haluk Öztürk, Gabar Çiyan, Adil Duran, Amed Tigrîs û hwd.



# Sefera trêne û dinya biçûk

Cemal BATUN

Serwer çentê xwe yê giran hilgirt û kete trêne de. Ji korîdora teng ve derbas bû û kete qompertimana ku hejmara cîhê wî yê rûniştinê lê bû. Hîn tu kesên din nehatibûn qompertimanê. Çentê xwe bicîh kir û rûnişt ku hinekî bêhna xwe bide. Ji pencerê ve li derve temaşe kir. Bi dehan mirov ber bi trêne ve dihatin. Hîn bi lez bûn û hîn jî hêdî hêdî bêyî ku xwe eciz bikin diketin hundirê trêne de. Çavê wî li jin, mêr û du zarokên bi wan re ket. Zarokek ji wan 4-5 salî xuya dikir ê din jî hîn di erebokê de bû, ango herî zêde 1-salî. Weha ber bi xeyalan ve çû...

\*\*\*

Çima ez li vir im?.. Ji welatê xwe dûr...gelekî dûr. Diya min destê xwe ser serê min ve derbas dikir, berî ku ez bixewim. Gelo hingê ez çend salî bûm...heşt, neh an jî deh...Lê, ez zanim dayika min gelekî ji min hez dikir. Gava ez hinek dereng dihatim malê, her ji min re digot:”Lawo, tu li kudê mayî, ma tu qet nabêje dayika min bêriya min dike, ka çi fikran dike-gelo tiştêk bi wî hat? Carê wilo neke lawê min, başe!.. Belê dayê başe! Lê, ka ka...ez bi hezaran kilometran dûrî te me. Dûrî te, dûrî bavê xwe, dûrî xwişkên xwe, dûrî brayê xwe, dûrî hevalên xwe, dûrî mala xwe, dûrî welatê xwe... dûrî her tiştê ku ez herî zêde jê hez dikim... Dûrî, dûrî, dûrî... Axxx ma gelo ev keder, ev xem dê kengî biqede?

Ma ji îro ve, ez dervî we hemûyan im, dervî evîna xwe, dervî evînên xwe...Ev bû 15-sal, belê 15-sal!.. Ma gava ez ji Nisêbînê dûrketim, ez çend salî bûm- 17 an jî 18? Ew roj e û ev roj e...

Belê, belê...Hûn li wir û em li vir..

\*\*\*

Serwer di van ramanan de, deriyê qompertimanê vebû. Ew jin, mêr û zaroyên ku li wan temaşe dikir, ketin hundir. Li gor edetên swêdiyan jî, hîn bi ketina xwe ve silav dan:

- Hej! (Merhaba)

Serwer hîn di bin tesîra xeyalên xwe de, serê xwe rakir û bersîv da:

- Hej, hej!.. (merhaba, merhaba...)

Ji ber ku çenteyên wan zêde bûn û zarokê erebê jî bi wan re bû û jinik her bi zarokê ve mijul bû, Serwer rabû û xwest alîkariya wan a çenteyan bike, ku wan bicîh bikin. Zilam spasiyên xwe pêşkeşî Ser wer kir. Piştî ku karê xwe qedandin jî, li ba Serwer danişt. Jinê jî li miqabil zarokê mezin rûniştand yê biçuk jî girte paşla xwe yê ku diyare ketibû xewê.

Piştî hinekî trê bi rê ket.

\*\*\*

Serwer dê biça Bonn'ê-paytexta Almanayê. Li wir hevaleyê wî yê gelek nêzik hebû. Hîn ji xortaniyê ve hevûdu nasdikirin. Gava 15-16 salî bûn. Di rêya xebata welatparêziya kurd ve hevûdu nasdikirin. Bi hevûdu re li gelek bajar û gundên Kurdistanê geriyabûn. Hevalê wî Rojhat, dengbêjek navdar jî bû. Li gelek herêmên Kurdistanê li şev û ahengan stranên xwe yên xweş pêşkeşî bi hezarên beşdarvanan kiribû. Li gel hev rojên zexmetiyê, rojên ku heval herî baş hevûdu nasdikin, piştî didin hev- girtin û mirin tê de ye, jiyabûn. Hevaltiya wan bîngehek weha xurt û saxlem hebû.

Rojhat, piştî înkilaba eskerî ya 12ê îlonê xwe gihandibû Almanayê. Ji hingê ve li wir dijî. Serwer jî wê demê derbasî welatek din bibû, ku xwendina xwe ya bilind li wir berdewam bike. Her di wan salan de jî, pêwendiya her du hevalan her berdewam kiribû. Çend caran Rojhat hatibû seredana Serwer û di rojên pêwîst de, destê alîkariyê gihandibû hevalê xwe. Serwer jî seredana hevalê xwe li Almanya'yê kiribû, her çend ku ji bo vê yekê ketibû zexmetiyek mezin a aborî jî.

Ji xwe piştî hatina Serwer a Swêdê, hevdîtînen her du hevalan gelek hesanîtir bû bû. Her sal bi kêmanî carek, du car hin caran zêdetir jî hevûdu didîtin.

Vê carê jî, rêya Serwer ber bi Almanya bû. Ewî hin karên li ber bi rê ve bibe, herweha seredana hevalê xwe jî bike. Wekî tê gotin, wî bi keviyekî du çûkan bikuje...Hem wî karê li ber bikira, hem jî seredana Rojhat û malbata wî bikira...

\*\*\*

Dilê Serwer çû çixarekê. Lê, nikaribû li qompartimanê çixare bikişanda. Ji xwe, van swêdiyan bêje çixare hema hema li her cihê qedexa kirin e. Derkete korîdorê û li vagona ku mirov dikare çixare lê bikişîne geriya. Gihîştê ve korîdorê û bi meraq çixara xwe pêxist.

Vegeriya qompartimana xwe û li ba zilamê swêdî rûnişt. Zilam piştî rûniştandina wî yekcar jê pirsî?

- Tu xelkê ku derê yî?

- Xelkê Kurdistanê.

- Yaha, ango tu kurd î?

- Belê!

- Ji kîjan perçê Kurdistanê?

- Ji Bakur.

- Bakur ango Tîrkiye

- Belê!

- Rewşa we kurdan bi rastî jî, rewşek trajîk e. Tiştên ku dewletên ku Kurdistan di bin destê wan de ye, bi kurdan dikin tiştên nayên qebulkirin. Ne dihêlin hûn zimanê xwe bipeyvin, ne dihêlin hûn jiyaneke serbest bijîn, ne dihêlin...

- Diyare tu li ser kurdan baş tiştan dizanî.

- Belê, ez rojnamevan im û min çend caran jî seredana Kurdistanê kiriye. Bi rastî ew jiyana ku kurd dijîn, bi min tiştê ne maqul e û ez ji Kurdan gelek hez dikim.

- Ooo! Ez gelek kêfxweş im, ku tu ji rewşa me agahdar î? Wekî din gava mirov gelek caran behsa jiyana û halê kurdan dike, biyanî zehmet tê dighin.

- Rast e! Ev çend dem e tu li Swêdê dijî?

- Ev heşt sal in.

- Êêê, tu li ser Swêdê çî dibêjî, tu ji Swêdê memnûn î?

- Ma ez çî bêjim? Wekî te gofî, jiyana û rewşa me kurdan em mecbur kirin, ku em dûtî welatê xwe bin. Swêdê jî hembêza xwe ji gelek kesên wekî min re vekirîye. Ji xwe wekî tu zanî, li Swêdê kurdan di warê edebiyat û nivîsîna kurdî de xebateke gelek hêja û giranbiha kirin. Gelek kurd, Stockholm û Swêdê wekî "Qubleta edebiyata kurdî dibînin". Herweha dewletên Kurdistan dagirkirine jî, di vî warî de gelek êrîşan tînin ser we. Belê, em spasdarê Swêdê ne...

Jina ku heta hingî bêdend guhdarî sohbetê dikir, bala xwe da Serwer û got:

- Tu ji bo me weha dibêjî... Na, na gelek xeletiyên Swêdê jî hene, lê belkî tu naxwazê bêtî, ji ber ku me neêşîn e? Ma beramberê biyaniyan ferqîya ku tê kirin, tu qet pê nehisiya ye?

- Belê rast e, dibe ku hin xeletiyên Swêdê hebin, lê ez naxwazim bînim zimên. Va hûn ji min baştir wan xeletiyên diyar dikin. Wekî din jî ez bawer dikim, li Swêdê hêzên xêrê ji hêzên bêxêr û tarî bi qewetir û bi hêztir in.

Zilam carek dî vegeriya ser Serwer:

- Me hevûdu nas nekir? Navê te bi xêr?

Serwer destê xwe dirêjî zilêm kir:

- Serwer.

- Göran.

Herweha Serwer û jinê jî xwe bi hevûdu dan nasîn:

- Serwer.

- Sussane.

Sussane piştî xwe danasînê, pirsî?

- Tu seferî kudê dike?

- Almanya - Bonn!

- Oooo, em jî diçine wir.

Serwer, ji kêngî ve dixwest pirsê ji Göran bike, gelo seferê ku derê Kurdistanê kiriye, çi dîtîye, çi jiya ye, bi çi helwêstê ji Kurdistanê veqetiya ye, çi bîranîna xwe ji Kurdistanê ji bîr nake. Ji ber ku niha mecala vê yekê girt, hema jê pirsî:

- Göran, tu dikarî hinkî behsa seferên xwe yên Kurdistanê ji min re bikî? Tu zanî ev bûye 15 sal ku ez ji wir dûr im...

Sussane gava ev yek bihîst veciniqî!

- Çi ? 15 sal! ev 15 sal e ku te seferî welatê xwe nekiriye ha!

- Belê!

- Te qet dê û bavê xwe jî nedîne!

- Na xêr!

- Oj dâ, oj dâ! (Eywah, eywah...)

Lê, Göran ji vê yekê ecebmayî nema. Dest pê kir bersîva Serwer bide.

- Serwer, cara dawîn a sefera min a Kurdistanê bû. Ez çûm Kurdistana Tirkîyê, gundekî navbeyna Cizîra Botan û Nisêbînê?..

Serwer gava navê Nisêbînê bihîst, wekî ku tu cêrek av bi ser dake ji nişkê de sar bû...

- Te got çi? Nisêbînê. Ez xelkê Nisêbînê me...

- Xelkê Nisêbînê yî?

- Belê!

- De baş e... guhdarî bike, tu gundê Dupîçê nas dikî?

- Çawa nasnakim, ez bi rojan li wir mame, gelek dost û hevalên min jî ji wir hene. Min bi rojan li wir xew kiriye... Seredana hevalên xwe kiriye...

- Baş e, tu mamoste Abdullah nas dikî?

Serwer hindik ma ku bêhiş biketa, ji cîhê xwe hindek ma hilpere.

- Mamoste Abdullah, nêziktirîn hevalê min ji Dupîçê bû!

- Ne bêje! Tu rast dibêjî!

- Belê çawa! Ma gelo tişteke pê hat?

- Na, na ji ber ku hevalê min e jî û mamosteyê bi tenê, heta xwendevanê bi tenê yê wî gundî ye, min navê wî anî zimên.

Sussane jî ji sohbetê şaş ma bû.

- Niha hevalekî we yê hevbeş derket!

Herduyan - Görân û Serwer bi hevûdu re bersîv dan.

- Belê, belê! Li vê ecêbê meyzîne!

Serwer bi meraq li hêviya axaftina Görân li ser Dupîçê bû. Ji ber vê yekê berê xwe dîsa da Görân:

- Görân, ez hêvî dikim, de behsa bîranîna xwe ya ji Dupîçê bike.

- Baş e. Na xwe tu dizanî ku Dupîç li ser sînorê Suriyê ye. Ji xwe ji ber ku di navbeyna Dupîç û sînorê Suriyê de qet mesafeya danîna têlan nîne, êvaran Tirk leşkerên xwe dikşînin paş Dupîçê - ango navbeyna gundên Dupîç û Eyserê - Dupîç êvaran dibe Suriyê û Eyser jî dimîne Tirkîye. Yanî sînor bi qasî du kîlometreyan ser bi Dupîçê ve tete danîn. Gava dibe roj jî dîsa leşker dikevin navbeyna Dupîç û Suriyê. Vê carê Dupîç dibe Tirkî. Ji xwe ev rewşa gund wê dike îstisnayek bi serê xwe. Ji alî hêzên dewletî ve jî hemberî runiştvanên gund tadeyên mezin tên kirin. Heta îro her çiqasî dewletê xwestibe gund vala bike jî, di vî karê xwe de bi ser neketiye. Ji dupîçiyên re jî xuya ye ku bûye înat - ew dê gund vala nekin. Ev rewşa gund a taybet weha lê kiriye, ku gundî êvaran derbasî nav xaka Suriyê dibin û ji wir malê ku li aliyê Tirkîyê giranbiha ye derbasî gund dikin û bi roj dibin sûka Nisêbîn û Cizîrê û ji xwe re difroşin. Êvaran jî malên Tirkîyê yê ku li Suriyê bi qîmete derbas dikin. Jiyana xwe jî weha debar dikin.

Ez ji bo ku bikaribim vê rewşa Dupîçê bibînim, piştî hewldanên gelek mezin min karî desturê ji dewleta Tirk bigrim ku sefera gund bikim û li ser binivîsim. Ew bû bû du şev ku ez hatibûm Dupîçê. Hevalê min û te Mamoste Abdullah jî bi min re hatibû. Em li mala xwişka wî Zêrînê bûn. Ber bi şefeqê bû, melayê gund ê ku sibehan em ji xew dirakirin hîn bang neda bû. Em bi dengên têqênîyan şiyar bûn. Teqreqa çekan bû. Ji ber ku em li hewşê raza bûn, me didît çawa şewqa fişekan di ser banan re derbas dibe. Dibe ku niv saet derbas bûbûn. Dengên çekan qut bû. Piştî niv saetîtir jî, ji xwe dinya ronî bû. Leşkeran derdora gund girtibûn û bi operloran bangî hemû gundiyan kirin ku derkevin derve. Ez jî derketim, ez tirsîyam ku ez tenê bimînim... Di nav vê gergelê de kesî bala xwe neda min. Di meydana gund de, leşkeran laşê 3 -

zilaman ên ku bi dehan gulê hatibûn kuştin û serên wan xuya ye, di bin cizmên xwe pelixandibûn raxistibûn. Xwîn li ser cil, dest û rûyên wan hişk bû bû. Leşkeran berê xwe dan gundiyan:

- Ev kî ne? Yê ku wê wan nas bikin bila derkevin pêş.

Lê, kes ji gundiyan ji cîhê xwe ne qeliqî û diyar nekir û wan kuştîyan dinase. Leşkeran bi tehdît û dengên bi xezebê tijiyay gelek carên din gotinên xwe dubare kirin. Gundiyan dîsa nasîtiya xwe ji bo kuştîyan diyar nekirin. Di rûyê hemûyan de, xem û êş dihate xwendin, lê ... kesî nedixwest wê xemê jî bi gotin diyar bike. Min li wan kurdan meyze dikir û ji xwe re digot: "Xwedêyo, Yesus (Îsa pêxember) ev çi zordestî ye! ev çi jiyana ku bi serê vî miletî hatiye nivîsîn... Ew çawa tehmula vê jiyane dikin!...Çawa, çawa!..." Ji xwe ez hîn jî fam nakim.

Leşkeran dîsa bi dengên bilind xezeba xwe rijandin... - Siktirbin! Siktirbin herin!

Em vegeyriyan mala Zêrînê. Hêstir ji çavên Zêrînê wekî şelaleyê destpêkirin birijin. Mamoste Abdullah jî hestirên ziwa dirijandin. Bêdeng, lê bi xem... Min ew xema di rûyên wan de, di dema meydana gund de nasî... Belê, ewan ew kuştî dinasîn. Bi şermezarî min ji Abdullah bi îngîlîzî pirsî:

- Mamoste Abdullah we ew kuştî dinasîn?

- Belê Görân ew mirovên me, ji gundê Eyserê ne...

Çi?... ev yek ji min re tiştêk nayê qebulkirin bû. Dupîçîyan hemû ew kuştî dinasîn, lê ji leşkeran re ev yek diyar nekirin.

Belê, Serwer ez we kurdan weha dinasim. Niha jî, ez dixwazim vê bûyera ku min di çend rojên xwe yên li Kurdistanê de jiya, li gel hevalekî xwe bikim filmek-film a trajediya rastiya jiyana kurdan, kurdên Dupîçê...

Hêstir ji çavên Görân dihatin xwar, hêstir ji çavên Sussane dihatin xwar û hêstir ji çavên Serwer dihatin xwar...

\*\*\*

Ev sefera trêne ya ku Serwer kirî, jê re bû wekî bîranînek ku neyê ji bîrkin. Gava ew gihiştine Bonnê, wan telefon û navnîşanên xwe jî bi hevûdu guhertibû. Belê, jiyana wusa ye, mirov wusa ne, dinya welê biçûk e... Bîranîna Görân ê swêdî, Serwer ê kurd ku bi dehên salan di nav doza kurd de ye, nêzîktîrî gel û welatê xwe kiribû. Ji xwe di dirêjahiya sefera xwe de li ser Mamoste Abdullah gelek dirêjtir qisa kiribûn.

Niha trêne gihiştibû Bonnê û Sussane, Görân û Serwer gava xatir ji hevûdu xwestin, wekî hevalên nêzîk ê hevûdu yên dehên salan bûn. Xatir ji hevûdu xwestin... Rojhat li hêviya Serwer bû û nasên Görân û Sussane jî li hêviya wan...

## Mihemedê Qazî (Mohamad Ghazî)

Mihemedê Qazî, di sala 1292an hîcrîyê şemsî (1913) li bajarê Sablaxê (Mehabadê) hatiye dinê. Hin pir piçûk bûye bavê xwe Mîrze Ebdulxaleqê Qazî -ku îmamê Sablaxê bû- hunda kiriye.

Mihemedê sêwîmayî, di mala pismamê bavê xwe Qazî 'Elî de bi cih bû bû. Qazî 'Elî ew şande xwendinê. Wî li Sablaxê xwendina seretayî (debistan) qedand û di 13-14 saliya xwe de dest bi nivîsandina şê'rê kir. Şê'ra ku li vir çap dibe, wê demê (1928-1929) nivîsandiye.

Apê Mihemedê Qazî, Dr. Cewadê Qazî, xwendina huqûqê li Almanya qedandibû û di 'edliyeya Îranê de dixebitî, loma Mihemedê Qazî di sala 1929-1930î de ji Sablaxê çû Tehranê ba apê xwe da ku xwendina xwe bidomîne.

Qazî di sala 1940î de lîsansa huqûqê ji zanîngeha Tehranê girtiye.

Di sala 1943an de zewiciye.

Wergera wî ya yekem di sala 1939an de derketiye. Wî gelek kitêbên navdar ên edebiyata cihanê wergerandine ser zimanê farişî. Heta niha bêtirî 70 kitêbên ku wî wergerandine farişî, çap bûne.

Mihemedê Qazî di sala 1974an de girîftarê nexweşiya kanserê dibe, loma piştî 'emeliyatê êdî nedikarî bê alîkariya cîhaza deng bipeyive.

Ew mirovek dilpak û qisexweş bû. Kesên ku ew dîtine meclisa wî ya germ ji bîr nakin.

Çi heyf ku Qazî di warê zimanê kurdî de pir nexebitiye. Hin wergerên wî yên ji fransî û kurdî bo farişî ku bi mesela kurdî re eleqedar in ev in:

\*Beyta Las û Xezal (Bi hevkarîya Hesênê Qazî hatiye wergerandin û di sala 1970î de, di kovara Cêhanê No de, li Tehranê hatiye weşandin.)

\*Îbrahîm Ehmed, Janî Gel (Tevî Ehmedê Qazî wergerandine.)

\* Basile Nikitine (Bazîl Nîkîtîn), Kurd û Kurdistan

\*Allbert Chanpdor, Selaheddînê Eyûbî

Wî bi xwe kitêbek bi navê "Zara" bi farişî nivîsiye ku di eslê xwe de çîrokeke kurdî ye û li ser hin rûdanên rast ku li Mukriyan rû dane hatiye avakirin. Zara paşê hem li Îranê hem li başûrê Kurdistanê hatiye wergerandin ser kurdî jî.

Mihemedî Qazî di 13. 1. 1998an de li Tehranê çûye rehmêtê. Li gor dengûbasan cenazeya wî bi beşdariyek gelek kesan û heval û dostên wî hatiye şandin bo Sablaxê û li nêzî gorrên şairên navdar Hêmin û Hejar hatiye veşartin.

Qazî di panzde saliya xwe de Sablax terk kir lê piştî 69 salan laşê wî dîsa vegeriya axa wî.

## Hesenê QAZÎ

### Xemasî

Bîsmîllahîrrehmanîrrehîm

Werin Kurdîne ta kengê ke ême xerqî gêjaw in  
Le destî mîlletî xeyre perêshanhal û damaw in  
Le bazarî cehalet da be bê pûl [û] huner mawîn  
Wekû darêkî bêrîşe hemû wişk in û bêaw in  
Be peykanî bela emro hemû mecrûh û pêkaw in

Le bo me 'eyb e ta kengê bimênîn wa de zîllet da  
Be lefzî Kurd Kurd in ême emma nek de mîllet da  
Belê Kurd îş kesêk e ger be bêmîsl e de xîret da  
Ne wek ême hemû weqtê ke tîmaw in de qîllet da  
Wekû xanim de xelwet da hemîşe xerqî sûraw in

Xerîqî 'eyşî şaran û xerîqî noşî bazar in  
Le layek da mutî' in û le jêr ehkamî exyar in  
Le layek da degel yektir hemû xesm in û wek har in  
Ne dost û îttîhadêk e wekû dêwane wa har in  
Xudaya çend xirap in û le bo ye hênde şewawîn  
Temaşay mîlletî Înglîs le sayey 'îlm û me'rifet  
Le sayey 'îlm emroke berewjûr e le gişt dewlet



Le sayey ãilm bêdar e le xwabî cehlet û xeflet  
 Le sayey ãilm mehîfûz e le ser cumleyî millet

Feqet her ême bedbext î n be narî cehl sûtawîn  
 Werin emroke xo ta key edî wextî huner-man e  
 Le xwabî xeflet a mawîn bes e weqtî hewildan e  
 Le kesbî me'rîfet se'y bikeyn wek merd û merdane  
 Îmamî Kurde bo ye wa te'essûbkêşî Kurdan e  
 Hezaran heyf bo ême ke bêşwên î n û bê naw î n

1928-1929

Mihemedê QAZÎ

بِسْمِ اللّٰهِ الرَّحْمٰنِ الرَّحِیْمِ

هه‌ناسی  
 ورن کردی تا گکی کردی فرق گزی ازان  
 لدرت دت خیره پریش کار دانا دین  
 لبار دله جهالت دله به بول مهر ما دین  
 و کردار کی به ریش مهر و شکی و به اوان  
 ۱۰- بر چکان بله امر و جو خروج و بکاردین ۱۰-  
 له بو به عیب تا گکی عینین و او دلت دا  
 بلجی کردیش کی که بره بشده غیرت دا  
 نه دکر ایسه مهر و قتی که تها دین دلت دا  
 ۱۰- و کو خانم ده خلوت و اهرمه غرق کردین ۱۰-  
 خریک عیش خار از فرق زکوش باز ازان  
 لدر لایک و اطعمین لیز احکام اغیارین  
 لدر لایک اکلن کتر بهر خصمین و دوک تا ازان  
 نه حرستی و اکان دکر دیوانه و ازان  
 ۱۰- فدا یا عین فر ازمین و سپهر منده شیر ازان ۱۰-  
 سما خای ملت انگلس لدر سایه علم و معرفت  
 لدر سایه علم بیداره لدر خواب ملت و غفلت  
 لدر سایه علم محظوظ شه حمله ملت  
 ۱۰- فقط بهر ایسه به خفین بنا جمل سزا دین ۱۰-

۱۹

ورن امر که خوتاکی ادی وخت نه زمانه  
 دفران غفلن با دین سیر وقت موله انه  
 کک به صرفت سیمی کیلن و کمر و در دانه  
 اماکی کرده بیزه و انصیب سستی کردانه  
 ۱۰- بهر ازان حیف بهر ایسه که به خوشبختی به اوان ۱۰-

# Zimanê Kurdî û nexşeya coxrafî ya zaravayên wî

Fuad Hama Xorşîd

## Naverok

Destpêk

Beş 1 - Zimanê Kurdî

Beş 2 - Zaravayên zimanê Kurdî

Beş 3 - Nexşeya zaravayên zimanê Kurdî

Beş 4 - Kurteçîroka lêkolînê

Têbinî

## Destpêk

Li ser zimanê Kurdî û zaravayên wî yê pirhejmar gelek lêkolîn hatine kirin. Û derbarî vê mijarê da gelek pirtûk û nivîsar hatine nivîsandin. Zanyarên Rojhilatî li ser vê mijarê munaqeşe kirine û derbarî wê da dîtî û ramanên xwe pêşkêş kirine.

Hin ji wan dîtî û ramanên pêşkêşkirî yê derheqa zimanê Kurdî da, kêma û ne temama in . Mebesta vê lêkolîn an jî nivîsarê, sererastkirina ew ramanên qalkirî ne, venasîna koka zimanê Kurdî û homojenîya wî ye. Di eynî demê da, ev lêkolîn dixwaze nexşeya coxrafî ya rastî ya zimanê Kurdî jî nîşan bide. Ango ev xebat kare wek lêkolînek yekem-mînak bê dîtî ku derbarî nexşeya coxrafî ya zaravayên Kurdî da wêneyek nû, berfireh û bihevkelîyayî dide. Di vê nivîsarê da li ser zaravayan nexşeyek jî çîh girtiye.

Em hevî dikin in ku, bi giştî ev lêkolîn bibe çavkanîyek kêrhatî bo kesên ku li ser pirsên zimanî û bi taybetî jî li ser zimanê Kurdî lêkolînê dikin.

Baxdad 1983

## BEŞ I

### ZimanêKurdî

Dema lêkolînavanek, wek misyoner an jî nivîskar, di lêkolînên xwe da rûbarî koka zimanê Kurdî û zaravayên wî dibe, bi awayekî destelepki, ji zanistî û mantiqê dûr bi gelek dîtin û ramanên xwe koka zimanê kurdî, werçerxîna wî û têkilîyên wî ligel zimanên cîran rave dike.

Ji bo ku meriv karibe "karakterî serbixwe" ya zimanekî îspat bike, hin lêkolîn û danberhevên rasteqîn pêwîst in da ku meriv karibe wî bigihîne kok û rehên tarîxî yên kevn. Meriv qîma xwe bi çend bêjeyên zimanekî ku dişibin peyvên cîran-ziman bîne, ji bo ku biryar bide ka ew ziman zarava ye yan jî varyanteke cîran-ziman e, belgeyên zanistî pêwîst in.

Lewma jî zimanê kurdî ne -wek hin misyoner û nivîskarên nezan ên ku pê bawer kirine- zaravayek zimanê farisî yê têkel û berevajîkirî ne jî zaravayekî wî yê lokal e, bê rêziman û bêserûber, (1) yan jî zimanekî ji koka Hindî ye.(2)

Gelek lêkolîn daye nîşandan ku, ev dîtinên hanê ne rast in.(3) Dema werçerxîn û cudahîyên ji zimanê Avesta\* bikeve rojevê, zimanê kurdî bi awayekî vekirî dirûv bi zimanê Pehlewî \*\* û zimanê farisî ya nûjen dikeve, lê wek zimanekî serbixwe xwedî xusûsiyetên xwe yên xas e.(4)

Sedemê ev dîtinên şaş ên derbarî jêderk û koka zimanê kurdî da, kêmbûna nivîsarên edebî yên kevnepî yên bi kurdî ne, bi taybetî jî dawîya sedsala hijdehan û sedsala nozdehan. Pêwîstî bi van nivîsarana hebû da ku li alîkî xebata ser zimanê kurdî hêsan bike û rûbarî zimanên din bike, li alî din lêkolînê bike û van zaravayên dewlemend bide ber hev. Carna ev herdu faktorên han ji bo yekî biyanî, ku dixwaze werçerxandina vî zimanî bişopîne, dijarîyên ciddî derdixe pêş.(5) Ji ber vê yekê ev herdu faktorên han dibe jêderka dîtineke nerast, dema ku behsa koka zimanê kurdî tê kirin.

Gelek rohilatzan, berî herkesî jî Justi û Socin(6), meyl darê wê bawerîyê ne ku di navbera zimanê kurdî (wek zarava yan jî varyant) û farisî da pevgerîdanek tune û zimanê kurdî bi temamî zimanek serbixwe ye.

Justi diparêze û dibê ku, zimanê kurdî ne varyantekî "nesafi" yê farisîya nûjen e, berevajîyê wê, ew bi fonetîk û etîmolojîya xwe bi dereceyeke bilind ji farisî cudatir e.

Socin îspat kiriye ku, zimanê kurdî ne bira-zimaneke zimanê Pehlewî yan jî farisîya nûjen e, lê di navbera wan da têkilîyek dûr heye. Herwisa Socin daye îspatkirin ku, zimanê kurdî ji farisîya kevn derneketiye holê.

Di eslê xwe da di navbera zimanê kurdî û farisî da têkilîyek dûr heye, ji ber ku herdu ziman jî ji malbata Îndo-Ewrûpî ne. Lê herdu ziman bi gelek awayan

ji hev vediqetin : bi xizneya bêjeyan, rêziman, morfolojî û dengkirinê.(7) Sidney Smith diparêze û dibê, kurdî bi temamî zimanekî serbixwe ye û xwedî tendensên werçerxîn ên dîrokî ye.(8) Ji serdema ku hêj tarîxa farisan di nav mij û dûman da bû û nexuya bû bala me ketibû ser hîpotez û teorîyên ser zimanê kurdî ku, ew bi awayekî gelek vekirî zimanekî safî yê Indo-Ewrûpî ye û heta îro bi rengekî ecêbmayî di çiyayên asê yên Kurd da hatiye parastin. Di Rojhilata Navîn da yekta zimanek ku bi gotinên erebî têkel nebûye, bêjeyên dînî ne tê da, kurdî ye. Kurdî bêjeyên kevn ên Indo-Ewrûpî radixe pêş çavan, ku di destpêkê da di Farişî da hebûn û paşî hatin ji bîr kirin lê Kurd wana rojane bi kar tînin.(9)

Ji bo naskirina dîroka zimanên Indo-Ewrûpî û têkilîyên wan bi zimanê kurdî ra, divê meriv çend faktayên dîrokî bi bîr bîne. Arkeolog bal dikşînin ser wê yekê ku ji bo sivilîzasyonên kevn hevtêkilîyek şîrîk heye, ku piştî dewra neolîtîk li piranîya dinyaya kevn belav bûne, wek Romanya, rojhilatê Rûsya, Susa, Belûcistan, Hîndîstan, Turkistan û Kurdistan. Ji ber vê encamê ye, lêkolînavan îddîa dikin ku dirûvbihevketina van kulturên şirovekirina cûrexelkek homojen tîne pêş. Ji ber belavbûna pîralî ya vê sivilîzasyonê, ji Hîndîstanê heta bi Ewrûpayê, ev qewm bi navê Indo-Ewrûpî hatiye bi nav kirin.(10)

Ev qewm berî koçkirinê li cî-warên xwe, li berîyên ku ji rojhilat heta bakûrê rojhilat a deryaya Kaspiskê(11) dirêj dibû, rûdinişt û ji gelek eşîran pêk dihat. Temamîya van eşîran bi hevra xelkek pêk tînin, ku hema bêje yek zimanekî bi kar anîne, ango hemû zimanên Indo-Ewrûpî yên ku îro tîne axaftin û dikevin vî zimanmalbatî,(12) wek mînak, sankrîtî, Italyani, Keltî, Almanî, Slavî. Ev zimanên han, wek zimanên Indo-Ewrûpî tîne bi nav kirin.(13)


Dema ku koçberiya Indo-Ewrûpîya dest pê kir, her grûbek berê xwe da cîhekî dinyaya kevn, bi taybetî jî Asiya û Ewrûpayê. Çend grûbên wan bi ser Donê ra xwe gihandin nîvgirava Balkan û Ewrûpaya Rojhilat. Ew pêşiyên Yewnanî û Romayîyan in, pêşiyên wan ên ku zimanên Ewrûpî yên îroyîn dipeyivin. Grûba duduya berbi başûrê rojhilat kişîya, giha tixûbên Hîndîstanê û li Sînd û Panjabê bi cîh bû. Herweha xelkên Asiyaya Başûr, ku bi zimanê Hindî diaxifin, ji vê grûbê çê dibe û zimanê wan di malbata zimanê Indo-Ewrûpî da cîh digre.

Grûba sêyem berê xwe dide Asiyaya Biçûk, çiyayên Zagros û heta bi Îran û Kurdistanê. Parêzvanên van koçberan, Gûtî û Medên (14)bi dû wan bûn, pêşiyên gelê Kurd ê îroyîn bûn.(15) Partan li rojhilatê Îran, ku iro wek Navçeya Îran tê bi nav kirin, bi cîh bûn. Ev hemû xelkên han bi zimanekî xizmî diaxifin, ku xwedî hin xusûsiyetên wekhev bûn û wek zimanên Îrani dihatin bi nav kirin.

Zimanên Indo-Ewrûpî li sê grûban hevbeş dibe :

1- Zimanên Ewrûpî 2- Zimanên Hindî 3- Zimanên Îranî.

PROTO - HIND-EWROPÎ



Malbara zimanên Hind-ewropî

Lêkolîn giha wê encamê ku, di navbera zimanên Îndo-Ewrûpî û Îranî û zimanên Îndo-Îranî da hin pevgirêdan hene. Di şemaya zimanên Hindî û Îranî da tê xuyan ku ev zimanên han ji kîjan çavkanîyan derketine.(16)

Li gor şemaya zimanên Îndo-Îranî, zimanê kurdî wek zimanek serbixwe tê xuyan û herwisa tê xuyan ku ew ne bermahîyeka lokal a zimanê farisî ye. Ev şema, tevî çavkanîya jêderkê, têkilîya navbera kurdî û farisî jî nîşan dide û dide zanîn ku ew ji malbata zimanên Îndo-Îranîya kevnare ne. Ev, vî rastîyê dîyar dike ku herdu ziman, bi temamî ji hev cuda û bi awayekî serbixwe werçerx bûne û kemilîne.(17)


Zimanê kurdî, farisî û yên ku di malbata Îndo-Îranî da cîh digrin, wek sê grûp-zimanên sereke ji hev cuda dibin :

- 1- Îranîya Bakûrê rojava
- 2- Îranîya Başûrê rojava
- 3- Îranîya Rojhilat

Kurdî, di grûba yekem da û farisî jî di grûba duyem da cîh digre.(18) Ev jî belegeyek din e ku herdu ziman ji hev cuda ne û serbexwe ne.

Ango aşkera ye ku kurdî zimanekî serbixwe ye û yek ji zimanên grûba Îranîya Bakûrê Rojava ye. Di nav şaxên zimanên Îndo-Îranî û di grûba xwe da, zimanê kurdî, nêzîktir zimanê ku digihîje grûp-zimanên Ewrûpî ye. Ev zimanên han û grûbên zimanan bi gelemperî bi vê averûya zimanî tên têgihîştin : Zimanên Îndo-Ewrûpî.

### Zimanê Îndo - Îranî



## BEŞ II

### Zaravayên zimanê kurdî

Çend misyoner û nivîskar li ser bingeha zimanê kurdî û ew têkilîyên ligel zimanê farişî şaş û metal mabûn. Hin jê jî, li ser pênas û hejmara zaravayên kurdî û têkilîyên wan ligel hev ecêbmayî mabûn. Ev rewş li ser xusûsiyetên taybetî yên zaravayan û beşbûna wan, gihaye encama gelek dîtînen cuda. Ev dîtînen newekhev di derheqa du zaravayên kurdî yên kevnare da ne, kurmançîya başûr (Lûrî) û goranî; hin nivîskar di wê bawerîyê da ne ku, ev herdu zarava ne zaravayên kurdî ne, zaravayên farişî ne.(19) Di rastîyê da, ev ramanên şaş ên derbarî herdu zaravayan da, girêdayî sedemên siyasî ne ku bi xwe ra dîtînen neobjektîv tînin pêş û xasima jî derheqa zaravayê Lûrî da. Ecêb e ku, nivîskarên kurd jî wek van nivîskaran difikirin.(20)

Hêj berî ku hestên neteweyî yan jî îdeolojîya neteweyî ya Kurd krîstalîze bibe, Şerefnameyê di sala 1596an da (21) daye xuyan ku kurmançîya başûr (Lûrî) zaravayeke kurdî ye. Ev tê wê maneyê ku, Şerefxan Bidlîsîyê rehmetî ji xwe gelek emîn, xwestiye ku zaravayên kurdî rave bike, bêyî ku bikeve bin bandora neteweyî ya Kurd û hesabên siyasî. Basil Nikitinê rehmetî jî, wek Şerefxan Bidlîsî xwedî eynî dîtîne ye.(22)

Herwisa Şerefname diyar kiriye û parastiye ku, zaravayê Goranî jî kurdî ye. Ev dîtina han ji alî C.J.Edmonds û Tewfîq Wehbi jî piştgirîyê wer girtiye.(23)

Tevî ku zaravayên kurdî ji hev vediqetin jî, ev nabe sedem ku meriv derheqa orîjînalîteya zimanê kurdî û serxwebûna wî da bikeve şikê ku ew ne zimanekî serbixwe ye û ji zimanên cîran ne cuda ye. Nivîskar, dirokzan û zimanzanan, bêyî ku tixûbên van zaravayan bigihînin hev, zimanê kurdî wek gelek zaravayan ji hev veqetandine. Me ji niha va (wek ku li jorê hatiye xuyan) derbarî zaravayên Lûrî û Goranî da çend sedeman-destnîşan kiriya.

Ji ber zaravayên kurdî yên pirhejmar, hin kes di wê bawerîyê da ne ku zimanê kurdî, zaravayek lokal ê zimanên din e (zimanên cîran). E.M.Noelê rehmetî, li dij vê dîtîne derketiye:

*"Gelek caran hatiye gotin ku, zimanê kurdî navçe bi navçe diguhure. Di eslê xwe da ziman li başûrê rojhilat diguhure, wek mînak kurdîya Botan, bi dereceyekî bilind ji kurmançî cudatir e. Lê ne rast e ku meriv bêje, varyantên kurdî cudahîyên mezin nişan didin. Li gel min çend kes ji Botan, Dîyarbekir û Hekarîyê (Çolemerg) hene. Hemû kesên ku li gel min in, ziman (kurdî) baş têdigihîjin û heta dûrîya rojavayê Kurdistanê di têgihîştina ziman da rastî diwarîyekê nayên. Ji bo ziman pêwîstî tenê bi çend hefteyan heye da ku ew karibin xwe li mala xwe hîs bikin. Ew cudahîyên ku hene, bi tenê girêdayî*

çend dengên vokal ên cuda ne. Wek mînak, min bêjeya "dê" wek "dayk", "day", "da", "dî" bibîstîye. Bêguman ev ji bo yekî biyanî ku fêrî dengên cuda nebûye kare bibe sedemê sergêjahîyê. Meyla wan a mezinkirina cudahîyên navbera zaravayan bi dîtînen weha têne xurt kirin, lê di rastîyê da bêjeyên ji hev cuda xwe bi hoker, daçek û hin bêjeyên ku pîr caran tîn bi kar anîn da nîşan didin. Wek nimûne, bêjeya "ny" (niha) li Sulêymanîyê "êsta", li Çolemergê "niha" û di kurdîya rojava da "angoh" e. Hin varyantên din jî, "êsta-ha", "aneka", "nika" û "henûska" ne. Kesekî ku derbarî zaravayê navçeyek da xwedî zanînek baş be, bi hêsani kare fêrî çend peyvên, ku ne zêde ne, ji hev cuda bibe." (24)

Tevî ku cudahî di nav zaravayên lokal da hene jî, zimanê kurdî di hemû zaravayan da xusûsîyetên xwe yên zimanî bi şeweyek vekirî nîşan dide. (25) (Mebest xusûsîyetên şîrîk in - d.w.)

Zaravayên kurdî li gor faktorên coxrafî û zimanî, wek çar zaravayên sereke beş dibin :

A-Kurmancîya Bakûr

B- Kurmancîya Navîn

C- Kurmancîya Başûr

D- Goranî

Her zaravayek xwedî çend devokên lokal an jî şaxê devokan e, ku bi gelemperî xwedî xusûsîyetên wekhev ên fonetîkî û zimanî ne. Ji bilî vê yekê, çend cudahîyên biçûk ên ku hene di çend bêjeyan, tîpan an jî hin peyvên lokal ên ku di bin bandora zaravayên cîran da mane da xwe nîşan didin.

Di şemaya jêrîn da, devok an jî varyantên zarava yên sereke weha ne :

### Zimanê kurdî û zaravayên wî

Zaravayên sereke	Zaravayên lokal an jî şaxê zaravayan
Kurmancîya Bakûr	Bayezîdî, Hekarî, Şemdînanî, Botanî, zaravayê rojava, Bahdînanî
Kurmancîya Navîn	Mukrîyanî, Soranî, Ardelanî, Sulêymanî, Germîyanî
Kurmancîya Başûr	Lûrîya qedîm (Feylî), Baxtîyarî, Mamasanî, Guhgalû, Kelhorî, Lakî
Goranî	Goranîya qedîm, Hawremanî, Bajelanî, Zazakî



## Zaravayên kurdî bo çi pirhejmar in?

Sedemên pirhejmariya zaravayên kurdî, bi gelek faktorên va girêdayî ye. Lê ji mêtê va, dema ku kurdî wek gelek zarava ji hev veqetiyên, du faktorên rolên girîng leystin. Herdu faktorên ev in :

### A- Faktorê coxrafî

Cîwarên Kurdistanê yê xwezayî bi çiyayên sext û asê, rê û şiverêyên dijwar ên bê gihanek, îklîma hişk û berî her tiştî jî zivistana dijwar, sedemên herî mezin in ku eşîrên kurd di sedsalên pêşî û navîn da ji hev cuda jîyane û ji hev îzole bûne. Di navbera wan eşîran da danûstendinek çandî çênebûye û lewma jî ev rewş berbi afirandina formên cuda yê ziman va çûye, ku bi vî awayî forma ziman a ku li navçeyek hatiye bi kar anîn li cîhekî din nehatiye xebitandin. Bi kurtî : Di pirhejmarî û şaxdayina zaravayên kurdî da, ji hev îzolebûna coxrafî sedemek bingehîn e.

### B- Faktora siyasî

Ji ber ku li Kurdistanê, ango di hemû beşên welêt da, yekîtiyek siyasî çê ne bûye, welat nebûye xwediyê tradisyonek edebî ya gelemperî û şîrîk. Ligel hin dewlet û xanedaniyên kurdî, ku ya serbixwe yan jî nîvserbixwe bûne, xasima di serdemên îslamî da, zimanê kurdî ne xwedî îmkân û werçerxandina zimanek standard bû. Ev şertên dijwar dijberî û cudahîyên navbera zaravayan kûrtir kir. Ev, girêdayî bi xet û xusûsiyetên lokal ên xanedaniyan bû, ku bi giştî rê dan zaravayên lokal ên nava tixûbê xanedaniyê. (ango her xanedanî jî qalîkê zaravayê xwe derneket û rê nedan zaravayek din da ku têkilîyek xurt çê bibe - d.w)

Ligel vê yekê divê meriv destnîşan bike ku, hin dûmenên zimanî yê ku zaravaya sereke ji yekî din an ji zaravayên lokal cuda dike tune. Hemû zarava bi hev va hatine girêdan û ketine nava hev, ji ber ku xeta ji zaravayek derbasî yeka din dibe bê navbir û gav bi gav dikêşe û meriv ji nişkêva têdernaşe yan jî his nake ku li cîhek kifşkirî zaravayek nû dest pê dike.

Yek ji hevvelatîyên Kurdê wan navçeyan ji Erbilê bi rêkeve û berê xwe bide Şaqlaw, Rewandûz, Galalah, Hacî Umran, Xane, Nagedeh, Miyandwaw û heta Mehabadê bigere, nikare tixûbê zimanî ya zaravayê Soranî û Mukrîyanî ji hev veqetîne, his bike û ji hev derxe, lewra herdu zarava ji Erbilê heta Mehabadê gav bi gav di nava ahengekê da ne.

Dema meriv ji kurmancîya bakûr derbasî kurmancîya başûr bibe, kare eynî tiştî bibîne û destnîşan bike. Nikitine hin xusûsiyetan destnîşan kiriye û daye xuyan ku Şemdînanî ne kurmancîya bakûr a safî ye : *"Hin xusûsiyet nîşan*

*didin ku zaravayê Şemdînanî ne varyanteka safî ya grûp-zaravayên bakûr e, ew dibe pirek bo grûp-zaravayên başûr. Ev zarava (devok) a û î wek pirtika negatîv bi kar tîne. Herwisa ev zarava daçekên zî û le (di kumancîya bakûr da wek ji û li ne - d.w) jî bi vî rengî bi kar tîne. Bêguman ev varyantana belgeyên qels in lê hêvî ew e, lêkolînên ku berdewam dikin bigihîjin îspateke zelaltir.”(26)*

Li gor zanîna me ya îroyîn, em dikarin bi giştî karakterên sereke yên sereke-zaravayên navçeyek rave bikin û cîhê ku xusûsiyetên berbiçav ên zaravayek dibe serdestê zaravayek din, bidin xuyan.

### BEŞ III

#### Nexşeya zimanî ya zravayên kurdî

Zimanê kurdî li temamiya başûr û başûrê r ojhilata Tirkîyê (Kurdîstana Bakûr), li dorhêlên bakûrê Sûrîyê, li bakûrê rojhilata Iraqê û rojavayê Îranê tê axaftin, ji bilî Xûzistanê. Ligel van deran, kurdî digije navçeyek fireh a başûrê rojava ya Asiya û ji wê derê xwe berdide bakûr û digihîje heta Lenînanakan (Yekîtîya Sovyet); Qers, Erzurom, Erzingan, Sêwas, Maraş (li Tirkîyê); bakûrê Heleb, Çîyayê Kurd (li Sûrîyê); tixûbên navbera Tirkîye û Sûrîyê, çemê Dicle, Şingal, bilindahîyên Hemrîn, Mendelî, Badrah, bilindahîyên Puştî Kulî, bajarê Dîsfûl û heta berava bakûrê rojhilata kendava Îranî. Li rojhilat, kurdî xwe berdide rojhilatê çemê Aras ê li Ermenîstanê, Makû, Xoy, rojava û rojhilatê bajarên dora gola Ürmîye, çîyayê Sahand a li bakûrê bajarê Maragheh, ji wê derê dikeve rêyeke marbadayî û ji bajar û gundên Îranê yên jêr derbas dibe :

Ahmed Abad, Masê Abad, Bijar, Asadabad (rojavayê Hemedan), Kariz, Aligudarz, Şarkurd û berbi rojavayê Husar, Bandar û Daylamê li bakûrê rojhilat a berava Kendava Faris.

Di vê coxrafyaya mezin û fireh da (nêzî 500.000 kîlometreqare) zimanê kurdî li hemû alîyan ji bandora zimanî yên cîran îzole nebûye. Ev tê wê maneyê ku zimanê kurdî li deverên tixûb têkelî zimanên cîran dibe, wek tirkî li bakûr, erebî li rojava, farişî li rojhilat û rojavayê rojhilat, ermenî û turkmenî li bakûrê rojhilat. Li deverên navend ên Kurdîstanê, zimanê kurdî û zaravayên wî bi şeweyekî gelek zelal paqij maye, ji ber ku di bin bandora zimanî (zimanên cîran-d.w) da nemaye. Dema ku em li vê derê behsa ”têkelbûnê” dikin, qesda me ne tunebûna hin tixûbên zimanî yên ku zimanê kurdî ji zimanên cîran vediqetînin e, wek nimûne tixûbên siyasî yên navbera welatan. Dema meriv ji xetnavçeyek ku li wê derê bikaranîna zimanek lihevketî yê ji

du zimanan pêk tê dibîne, meriv digihîje navçeyek nû yê zimanî. Di vê mijarê da nimûneyek, lihevketina ziman a bajarên sînor ên Kurdistanê ne.

Dema belavbûna coxrafi ya zaravayên kurdî yên sereke bikeve rojevê, Kumancîya Bakûr li deverên bakûrê Kurdistanê tê axaftin, Kurmacîya Navîn li deverên navendî û Kurmancîya Başûr li deverên rojhilat tê axaftin. Goranî li mintiqeyek biçûkî di navbera Kurmancîya Navîn û Kurmancîya Başûr û navçeyek dinî jora talîya bakûr tê axaftin, li Dersîmê tê axaftin û li bakûrê Mûsilê ku dikeve qeraxê çemê Xosar ji alî eşîreke biçûk tê xebirdan. (27) Ravekirinek berfireh li jêr berdeyam dike.

### A- Kurmancîya Bakûr


Li gor zaravayên din Kurmancîya Bakûr xwedî nexşeyek firehtir e. Ev zarava ji alî kurdên Tirkîyê tê axaftin (wîlayetên Bayezîd û Agirî, Wan, Çolemerg, Sêrt, Mûş, Mêrdîn, Diyarbekir, Xarpût, Meletye, Entab, Ruha û rojhilata wîlayetên Erzurom, Qers; (bajarê Semsûr, Mereş û beşek ji Dersîmê jî vê zaravayê bi kar tînin - d.w) ji alî kurdên Sûriyê (seranserê tixûbê bakûr ê bi Tirkîyê va), ji alî kurdên Yekîtiya Sovyetê (rojavayê Ermenîstanê) û ji alî kurdên navçeyên Dihok û Zibar (li Iraqê) tê axaftin).

Xeta zimanî ya rojhilat a ku vê zaravayê ji Kurmancîya Navîn vediqetîne, xeta serbixwe ya ku ji navenda rojavayê qeraxê gola Ûrmîyê (Îran) dikişê û ji bakûrê Şîno, Kela Şîn (li ser tixûbê navbera Iraq û Îran) û çîyayê Halgurd (Iraq) derbas dibe ye. Piştî ev xet di paralela çemê Rewandûzê da berbi jor, cîhê ku ev çem û çemê Zapê digihên hev, berdeyam dike. Herweha ev xet berbi bakûrê çemê Zapê berdeyam dike û bi awayekî paralel dikişê ta ku digihîje çemê Dîcleyê. (28) Ji ber nexşeya fireh a vê zaravayê, zaravayên (devokên - d.w) jêrîn ên ku bi ferqiyên gelek biçûk ji hev cuda dibin ev in:

- 1- Bayezîdî : Bakûr û bakûrê rojhilat ê gola Wanê û wîlayetên Xoy li Îranê.
- 2- Hekarî : Rojhilat û başûrê rojava yê gola Wanê.
- 3- Botanî : Newala Botan û derdora wî, Sêrt, Ertûş û Diyarbekir (Amed).
- 4- Şemdînanî : Başûrê rojhilata Tirkîyê, rojhilata çemê Zap û navçeyên nêz ên Îranê.
- 5- Zaravaya rojava: Li Xarpûtê, Ruha, Maraş, Entab û bakûrê Heleba Sûriyê.
- 6- Bahdînanî : Li wîlayetên Sinjar, Zibar, Duhok ên Iraqê.

### B. Kurmancîya Navîn

Ev zarava dikişê rojhilatê xeta li jor qalkirî ya ku Kurmancîya Bakûr û vê zaravayê ji hev vediqetîne û ji wê derê digihîje çemê Şîrwan û rîya esehî ya



Nexşeya coxrafi  
ya zaravayên kurdí

navbera Xaniqîn (Îraq) - Qesrî Şîrîn - Kermaşah heta bi Malayer (Îran) û ji rojhilata bilindahiyên Hemrîn li rojava (Îraq) heta xeta ku digihîje çiyayê Sahand, Masirabad, Bijar, Asadabada li rojhilatê Îranê. Ev zarava wek çar zaravayên lokal ên jêrê beş dibe :

1- Mukrî : Li Şino, Nagadeh, Mehabad, Miyandwaw, Maraxe, Saqez, Bokan, Serdeşê (Îran). Navenda vê zaravayê, Mehabad e.

2- Soranî : Li navça Erbîla (Hewlêr) Kurdistana Başûr (bilî wîlayeta Zibar).

3- Ardelanî : Li Senendej (Sine), Bijar, Baneh, bakûrê navça Jawanrûd (Îran). Navenda vê zaravayê, Senendej e.

4- Sulêymanî : Li wîlayetên Sulêymanî, Kerkûk, devera Xaniqînê (Îran). Ev zarava, li mintiqeyên rojava hinek ciyawaz e. Ev, ji alî hinekan va wek zaravayê Germiyanî tê bi nav kirin (li bajarên Kalar, Kifrî, Qara Tepe, Tûz û Kerkûk).

### C. Kurmançiya Başûr

Ev zarava, bi awayekî fireh dikişe başûrê rojhilata Kurdistanê (Lûristan) û ji rîya esehî ya navbera Xaniqîn û Malayera li bakûr dikişe berbi bakûrê rojhilata Kendava farisî.

Ev zarava, ji alî kurdên Lûr va tê axaftin. Lûrî dibe du şax : Lûrîya Buzurg û Lûrîya Kuçûk, ango Lûrîya Mezin û Lûrîya Biçûk. Ya pêşî nasnavê Baxtiyarî, Mamasanî û Guhgelû ye û ew sê eşîrên kurd in. Ya din a bi navkirî, ango Lûrîya Biçûk, dibe sê grûp : Pîş-kûh, Pûştî-kûh û Bala Garîweh.

Ev zarava kare wek şaxên jêr bê beş kirin :

1- Lûrîya qedîm (yan jî zaravayê Feylî) : Li Pîş-kûh, Pûştî-kûh û Bala Garîweh.

2- Baxtiyarî : Ev, ji alî eşîrên Baxtiyarî tê axaftin; ew ji, der vayî sê navçên îzolekirî, eşîrên Heftling, Çarling û Dînarûnîs pêk tê. (29)

3- Mamasanî : Ev nav, ji navê Mihemed Hesenîyê avakarê vê eşîrê pêk hatiye. Hêla Mamasanî li bakûr heta navça Beşt û ji wê derê jî heta Kazerûna li rojhilat hatiye tixûb kirin.

4- Guhgelû : Ev, ji alî eşîra li jor bi navkirî (Mamasanî) tê axaftin. Devera vê eşîrê, di navbera aqara eşîrên Baxtiyarî yên li bakûr û aqara eşîra Mamasanî ya li rojhilat da ye.

5- Kelhorî : Ji alî kurdên Kelhorî va tê axaftin. Kelhorî, wek kevintirîn eşîr eke kurd tê nasîn. Hej jî, erdên wan li dora çiyayê Zagrosê hene. Ew, dibin du grûbên mezintir : Şaxê Şêx-bazî (Şêxbizî - d.w) û şaxê Mansûrî.

Seranserê navçeya ku ji Mahîdeştê, nêzî Kermaşahê, heta tixûbê navbera

Iraq û perê Mendaliyê (Îran) diçe, di bin destê şaxê Şêxbizinî da ye. Şaxê Mansûrî, xewdî navçeyek biçûk a rojhilata Gilanê ye.(30)

6- Lakkî : Li rojhilata Kermanşahê ji alî eşîrên biçûk ên kurd tê axaftin.

#### D. Goranî

Ev zarava, li mintiqa ku digihîje heta bakûrê rîya navbera Qesrî Şîrîn û Kermanşahê tê peyivîn. Li wê derê komek ku bi zaravayê Goranî diaxife heye û ev zarava ji alî eşîrên Hewreman, Rijab, Kandûle (nêzî Kermanşah û eşîrên sereke yên Sincabî Goran û Bajalan, ango eşîrên Şabak) tê axaftin.

Zarava dibe çar şax :

1- Goranîya qedîm

2- Hewremanî

3- Bajelanî

4- Zazakî (dimilkî, kirdkî - d.w)

Goranîya qedîm ji alî binecîhên Karand, Zehab, Jawanrûd (Îran), çend eşîrên Kakayî yên Tawq û çend eşîrên Zengeneya nêzî Kifrî (Iraq) tê peyivîn. Hewramî, zaravayeka lokal a xweş û efektîv e (31) û ji alî binecîhên derdora Hewreman û çîyayê Pawa tê axaftin. Hewramî dibe du grûp : Şaxê Lahor, li rojavayê çîyayê Hewreman (li Iraq) rûdinên û şaxê Taxt, li rojhilatê van çîyayan (li Îran) rûdinên in.

Zaravaya Bajelanî li rojhilatê Mûsil (Şabak), Zahaw, nêzî Xaniqîn û Quratû, Hawrayîn û Şexan (Iraq) belav bûye. Herçiqas yên ku vê zaravayê diaxifin belavbûyî ne jî, zarava bi awayekî gelek zelal di bin bandora Kurmancîya Navîn da maye.

Zaravayê Zazakî, şaxekî zaravayê Goranî ye lê balkêş e ku ev zarava li dervayî navça zaravayê Goranî dimîne, li dûrîya bakûr, di nav navçeyên Mûş, Xarpût û Erzinganê (Tirkîyê) ye. Meriv dikare bêje ku, ev zarava, di navbera şaxçemên Firatê, ava Mûradê û ava Firadê, heta ku digihîje rojhilata çîyayên Mûşê û di nav navça Dersîmê da bi cîh bûye.(32)

## BEŞ IV

### Kurteçîroka lêkolînê

Di encamê da em dixwazin destnîşan bikin ku, her zimanek parçeyek çanda neteweyî pêk tîne. Zimanê miletek, wek kultura miletek e û xwedî tendenseke ku bi gelek tecrubeyên însanan tînin guhartin û werçerxandin. Însan dikarin di nava xwe da bi gelek şêweyên cuda zimanê xwe bi kar bînin û formekê bidînin,

lê heta ku ew xwe wek mîletek ji eynî neteweyî bibînin û eynî zimanî bipeyivin. Bêguman ev ji eynî dîrok, hest, urf û adet pêk tê. Çend xusûsiyetên girîngtirîn ên zimanek zindî, werçerxîn û guhurîn e. Zimanek di nav zeman da diguhure û ev taybetmendî mintiqe bi mintiqe diguhure.

Ev pirsên han ji ber vê yekê girîng in : Meriv di yek û eynî zimanî da kare rê bide çend cudahîyan? Û kengê encama cudahîyên navbera zaravayan dertê pêş da ku ew du zimanên cîyawaz in?

Bersîva vê pirsê, di tarîfa averûya "netewe" da ye. Me du faktorên destnîşan kir : bawerî û hest. Ev tê wê maneyê ku, yên ku zaravayên cuda diaxifin di wê bawerîyê da ne ku, ew eynî zimanî diaxifin bêyî ku ferqîya navbera wan zaravayan bibînin û têderxin.(33)

Herweha em di wê bawerîyê da ne ku, ferqîya zaravayên kurdî çî dibe bila bibe, meriv nikare bi vê faktayê (dîtînen ser zimanê kurdî û zaravayên wî - d.w) cudahîyan bide pêş û dijîspata taybetmendîya vî zimanî bike yan jî van zaravayan ji koka zimanê kurdî veqetîne. Yên ku van zaravayan diaxifin, bi şêweyekî zelal bawer dikin ku ew zimanê kurdî dipeyivin. Bi serda jî, ew ji bo vî zimanî xwedî hestek berpirsiyarîyê yê manewî ne. Ev, li hember hemû raporên bê binyat ên ku derbarî yekbûna zimanê kurdî da pirsiyarî dikin, terî xwe sedem e ku zimanê kurdî zimanek yekbûyî ye (bi zaravayan va - d.w).

---

## BEŞ I

- (1) Binihêre : Layard, Austen H. "Discoveries among the ruins of Nineveh an Babylon, with travels in Armenia, Kurdistan, and the Desert"-New York, 1953, rûp. 374
- Driver G.R. "Studies in Kurdish history"- B.S.O.S., 1922, cild: XI, beş 3, rûp. 493 û 505
- (2) Creagh, James, "Amenias, Koords and Turks"- London, 1880, rûp. 170
- (3) Soane, E.B. "Notes on the phonology of Southern Kurdish"- J.R.A.S, 1922, beş 2, rûp. 192
- (4) Edmonds, C.J. "The character of the Kurds in the Middle Eastern Scene"-R.C.A.J., Nisan 1958, cild XIV, beş 2, rûp. 147
- (5) Noel, Edward "The character of the Kurd as illustrated by their proverbs and populer saying"-B.S.O.S, cild I, beş IV, 1920, rûp. 79
- (6) Binihêre : Justi, F. "Kurdische Grammatik" - S.PB, 1980
- Socin, A. "Die sprache der Kurden, in grundriss der Iranischen philologie", 1-2 - Strassburg, 1898 -1901
- (7) Edmonds, C.J. "Kurds, Turks and Arabs" -London, 1957, rûp. 5
- (8) M. Emin Zeki "Dîroka Kurdistan" (Erebî), çapa duyem, cild I, Baxdat 1961, rûp. 305
- (9) Soane, E.B. "Report on the Suleimani district of Kurdistan"-Calcutta 1961, rûp. 86
- (10) Charpentier, Jarl " The original home of the Indo-Europeans" -B.S.O.S., cild IV, 1926-28, rûp. 146

- (11) Brasted, Henry James "History of ancient ag" (Wergêra bi Erebi: D. Qurban) - Beyrût, 1926, rûp. 135  
 Charpentier, Jarl "eynî behem", rûp. 164  
 (12) Brasted, Henry James "eynî berhem", rûp. 135  
 (13) Charpentier, Jarl "e.b.", rûp. 149  
 (14) Binihêre, derbarî Medan da : Young, T. Cyter "The Iranian migration into Zagros"-Îran, cild V, 1967, rûp. 12-17  
 (15) Edmonds, C.J. "Kurds, Turks and Arabs", rûp. 85  
 (16) Binihêre : Moris, William (Red), "The Heritage dictionary of the English language"-New York, 1973 (ku ev şema, bi lêzêdekirinek, ji eynî behemâ Driver G.R., rûp. 494an hatiye wergirtin)  
 (17) Soane, E.B. "Grammar of the Kurmanji or Kurdish language"-London, 1913, rûp. 3  
 (18) Edmonds, C.J. "The place of the Kurds in the Middle Eastern" Scene", rûp. 147

## BEŞ II

- (19) Wek mînak binihêre: 1- Minorsky, V. "The Guran", B.S.O.A.S., 1943, cild XI, beş 1, rûp. 75  
 2- Edmonds. C.J. "Luristan, geographical Journal", 1922, cild LIX, no 5, rûp. 340  
 3- Soane, E.B. "Short Antology of Guran Poetry", J.R.A.S, 1921, beş 1, rûp. 59  
 (20) Binihêre : 1- Kemal Fuad "Kurdish dialects, ZANYARI Journal (Kurdi), 1971, no. 4, rûp. 16-24  
 2- Tewfiq Wehbi û C.J. Edmonds "A Kurdish-English Dictionary", Oxford, 1966, rûp. 5  
 (21) Şerefxan "Şerefname (Tarîxa Kurdistan)" (wergêra Erebi), Kahîre, 1958, rûp. 12.  
 Nivîskarê navdar Şerefxan, ku di berhema xwe ya tarîxê da mijara neteweya Kurd digre dest, di ravekirina xwe da zimanê kurdi wek çar grûp beş dike : Kurmanci, Lûri, Kelhori ve Gorani.  
 (22) Nikitine, Basile "Kurdish Stories from my collection", B.S.O.S., 1926-1928, cild IV rûp. 121  
 (23) Tewfiq Wehbi "a.e", Şerefxanê. 5  
 (24) Noel, E.M. "Diary of Major Noel on special duty in Kurdistan", Basrah, 1919, rûp. 9  
 (25) Edmonds, C.J. "Kurds, Turks and Arabs", rûp. 7  
 (26) Nikitine, Basile "e.b", rûp. 121

## BEŞ III

- (27) Minorsky, V. "e.b.", rûp. 76  
 (28) Disa binihêre : Edmonds, C.J. "e.b", rûp. 10  
 (29) Rawlinson, Major "Notes on a march from Zahab", J.R.G.S, cild 9, beş1, 1839, rûp. 102  
 "Beşên başûrê rojhilata Kurdistanê, ji alî eşîrên Baxtiyarî va bûye cîh-meskenê rûniştinê. Ew di navbera çemên Dîz yan jî Sehzar ên bakûrê rojava û çemê Karûn ê li başûrê rojhilat dimînin. Navçe dora 50.000 kîlometrekare ye û 35.000 kîlometrekareyê wê çiyayên asê yên rêneda ne." Harrison.  
 Harrison, J.V. "The Bakhtiari Country south-western Persia", agahdariya coxrafi, 1932, cild LXXX, no. 3, rûp. 193  
 Sawyer, H.A. "The Bakhtiari mountains an upper Elam", agahdariya coxrafi, 1894, cild IY no. 6, rûp. 483



(30) Rawlinson, Major "e.b.", rûp. 44

(31) M. Emin Zeki "e.b.", rûp. 324

(32) Minorsky, V. "e.b.", rûp. 76

#### **BEŞ IV**

(33) Hammash, K.I. "Language and Civilization", Al-Aqlam Journal (Iraq), 1975, cild 10, no. 6, rûp. 48-49

**Wergera ji swêdî : A. Gernas**

# Felsefa ola êzîdiyan û koka wê

Pîr Memo Osman

Di sala 1990î de, ez ji bo xwendinê li bajarê Londonê bûm. Hîngê melbendê roşenbîriya kurdî li wê derê, ji min daxwaz kirin ku, semînerekê li ser ola êzîdiyan bidim. Ji bo ku vê daxwazê bi cih bînim, ez li nav pirtûkxanên Londonê, geriyam. Gelek lêkolîn li ser êzîdiyan hebûn; min xwendin û zêdebarî zanîn û aghdaryên min jî, êdî ev babet amade kir. Heta niha bi tenê pirtûkek bi navê "Êzîdyatî, 1979 Bexda" ji aliyê du nivîskarên êzîdî, hêjayan Xidirê Silêman û Xelîl Cindî ve, ya hatiye berhev kirin; nexa tevaya lêkolînên din, ji aliyê nivîskarên ne êzîdî ve bûne. Mirovê êzîdî ji ber du sedemên bingehîn, nikare basî ayînê xwe bike:

1. Dijatiya rejîmên desthilatdar li Iraqê, ku rê li ber digirtin û siyaseta bi erebkirin û bi beiskirinê beramber ol û kurdûna wan bi kar tanîn. Ev pîlan bi germî ji sala 1970î dest pê kir û heta niha jî berdeham e.

2. Tirsê ronakbîrên êzîdî ji baskirina kesayetiya şêx Adî,(Hadî) yê ku havî(biyani)ji ola êzîdiyan û nizimkirina wî bo pileya mirovî. Çinku piraniya êzîdiyan, wî wek pêxember nas dikin, belku wî dikine roha Tawûsê Melek û carna jî, roha Xudê.

Pirsa êzîdiyan, hizir û serinca dîrokzanan ranekêşaye û gelek bi kêmi û kurtî basî wan hatiye kirin. Basî wan( belku ji bo cara yekê) di pirtûka Şaristanî de, yê ku di sala 1153an Z de, koçkirî hatiye kirin û careka din jî, di pirtûka Seyahetname Ewliya Çelebî de, ku ew jî, di sala 1680î Z de miriye, hatiye kirin. Ji ber hindê jî, dema şêx Adî dest daye ser ola êzîdiyan, êdî wan nikarîbû roleka giring bilîzin û çihên tiliyên xwe di dîrokê de çêkin. Lê ew li Kurdistanê jîyan û xwe ji hêriş û pelamarên misilmanan parastin. Çinku bi hizra misilmanan, ew kafir û gawir bûn û Şeytan dipêristin. Bo cara dawiyê jî, di destpêka çerxê 19an Z de, ew ketine ber hêrişa Mehemed Paşayê Rewandîzî, ku bi Mîrê Kore nav dikirin. Ji ber hindê jî, roj li pey rojê, ew kêmi dibûn û her hind mabû bêne qirkirin.

Êzîdî li Iraqê, Sûrî, Tirkî û Sovyeta berê belav dibin. Piraniya êzîdiyan jî, ji Tirkîyê mişextî welatê Elmanyayê bûne. Hejmara êzîdiyan, li tevaya welatan digihê nêzîkî niv milyonî.

## **Termê Yezdan (Yazdan)**

Navê Yezdan, ji bo cara yekê di pirtûka Zerdeşt Avêstayê rûpelê 18an de, wek Xudê pîroz hate salox kirin. Ji wî jî, peyva Yazd, anku Xudê peyda bûye. Û Yazdan wateya gelek Xudayan dide. Mana giştî jî ew e ku, hejî peristin û qurbaniyê. Ev jî mana giştî ya Xudê pîroz û tevaya Xudayên Hîndo-Îranî yên berî Zerdeştî jî dide. Bi vê çendê, êzîdî bawer dikin ku ew yekem netewe ne Yezdan yan Xudê peristîn.(1)

## **Şeytan - Devil -**

Di zerdeştîyê de, navê Şeytanî, Asuras yan Ahuras yan Lords bû û di ola filehan(kiristiyanan) de, bi Şeytan navkirîne û ew jî, mîrê tariyê ye û dibêjinê firîştê ketî. Herwesa ola misilmana jî, mîna ya filehan bi Şeytan nav dikin. Peyva (Divel), exrîqî ye û ji peyva Diabolos hatiye wergirtin; ku mana xerabî û sedem dide. Lê di demê nû (New Testment) de, peyva Şeytanî wek termek li dij Xudê û dijberê wî bi kar tê.

## **Sedemên hebûna Şeytanî:**

1. Tiştê ku xerab xuya ye, ji bo tiştên pak pêwîst e.
2. Hebûna beşekê tiştî, ji hebûna aliyê başê tiştî ye.
3. Gerdûn ji toxmê baş û xerab pêk hatiye.
4. Hebûna xerabiyê, ji bo veğerandina arezoya azad pêwîst e.

Lewre eger ji bo tiştî, Dirustker(xaliq) hebe, ev e wê çendê digehîne ku, xerabiyê jî Dirustkerek heye. Ev jî wê manê dide ku, hebûnek xwezayî(siruştî) û ezeli ye, yan jî ji bo mebesteka taybet peyda bûye. (2)

## **Tawûsê Melek**

Êzîdî mîna fileh û misilmanan bawer nakin ku Tawûsê Melek (Şeytan-Divel), serkêşê xerabiyê ye. Belku ew bawer dikin ku serokê tevaya firîştane û ew digel Cibraîlî rohê xelkê dikişîne. Lê xerabî bi xwe di dilê mirovî de ye û serekanî jî ne Tawûsê Melek e. Herwesa çiroka dirustbûna gerdûnê, li cem êzîdiyan, ne weke ya olên din e. Ew bi vî rengî şirove dikin:

Berî ku Xudê, heft firîştên din dirustke, Tawûsê Melek ji ronahiya xwe çêkir û ferman dayê ku ji kesekî din re sucdê neke. Dema Xudê heft firîştên din çêkir û ferman da ku ji erdî axê bînin û ji wê jî, helametê Ademî çêkin. Xudê ji roha xwe pif kirê û ferman da tevaya firîştan ku, sucdê ji bo Ademî bikin. Hemî firîştan sucde kir, lê Tawûsê Melek ne kir. Xudê sedema vê yekê

jê pirsî, wî jî bersiv da:

”Ez çewa succê ji bo yekê din bikim! Ez ji ronahiya te me û Adem ji axê ye. Ez şîret û raspêra te li erdê naxînim...”

Hîngê Xudê wî xelat dike û dike serokê tevaya firîştan û cêgirê xwe yê li ser erdî. Ji ber hindê jî êzîdî bawer dikin ku Tawûsê Melek, nûnerê Xudê yê li ser erdî ye û salê carekê, di çarşema yekê ya meha nîsana rojhelatî de, tê xwarê ser erdî. Û ew roj jî li cem êzîdîyan dibe cejna serê sala nû. Di wê rojê de, Xudê ji ronahiya xwe Tawûsê Melek dirust kiriye. Êzîdî baweriyêke mukim bi vê çîrokê tînin û xuya dikin ku, Xudê viya ye Tawûsê Melek taqî bike ka şîr eta wî ji bîr kiriye û li wê pileyê ye ku bibe nûnerê wî li ser erdî yan ne? Nexo çima Xudê ferman da firîştên xwe ku succê ji bo Ademî bikin, li demê ku Xudê ferman dide. Bibe, dibe( kun feyekon). Tawûsê Melek, wek hizreka felsefî, ji aliyê wî xelkî ve têtê peristin, yên ku bawerî bi rastiye tînin. Êzîdî dibêjin ku bi tenê ew e gelê yekan e û hişyar ku, bawerî bi rastiye anî. Herwesa hizra peristina Tawûsê Melek, mîna hizra pileya bilindbûnê di zanista ciwanîyê (sublime) de ye û yê baweriyê bi vê hizrê neyîne, nikare vê rastiye jî bibîne. Lewre gelê êzîdî şîya vê rastiye û vê hizra ciwanîyê jî bibîne.

### Şêx Adî

Êzîdî bi bawer in ku şêx Adî hizra çîr oka Tawûsê Melek ditiye û bawerî jî pê anîye. Şêx Adî kurê Misafirê Hekarî ku di sala 557an 558an yê koçî de miriye û du pirtûk li pey xwe hiştine.

1. Cilwe.

2. Mishefa Reş. \*Ew jî piştî mirina wî di sala 743an yê koçî de, peyda bûn. Felsefa wî jî li ser du bingehan rawesta ye.

1. Guhdarî.

2. Ravekirin.

Her çend şêx Adî navê Tawûsê Melek nayîne, lê ew giftûgoyê li ser çîroka dirustkirina gerdûnê ku di Qur’anê de hatiye, dike. Şêx Adî bawer dike ku koka xerabî û başîyê yek e û dibêje:

Eger xerabî bê vîn û îrada Xudê bûba, da bêhêz ba. Yê bêhêz jî, nikare bibe Xudayek. Çinku nabe tişteke bê viyan û bê agehdariya wî, di mala wî de hebe.

Êzîdyatî hizir dike ku Husên Helacê sofî jî bîr û baweriyên şêx Adî li ser pîrsa berevaniyê ji Şeytanî hebûn. Şêx Adî roha Tawûsê Melek di ya xwe de didît, çinku digot:

- Ez bûm yê Adem di behîştê de jiyandî û Nemrûd jî, havêtiye nav agirî.

- Ez bûm yê Xudê esmanî jê re gotî: Tu dadvanî (hakimî), adîlî û serdarê erdî yî.

- Ez im Adî yê Şamiyê kurê Misafirî.

Xudê dilovan, nav textê esmanî, kursî û heft erd dane min.

Di nihênîya zanîna min de, ji bilî min çî Xudê nînin.

Ev tişt xizmetkarên hêza min in.

- Eger min viya, dê bo cara duduyan yan jî siyêyan vegerim vê dinê, yan jî yeka din bi rêya rohvegahaztinê. (4)

Hindek dîrokzan bi vî rengî basî şêx Adî û Laleşê dikin:

Laleş gundekî ku dikeve bajarê Musilê. Li wê derê şêx Adî û kurê xwe şêx û îmamê kurdan dijiyan. (5) Lê Îbin Elsîr hevçaxê Yaqot Elhemewî, mirina şêx Adî vedigerîne rûdanên sala 557an yê koçî û bi vî rengî bas dike: Di wê derê de Şêx Adiyê kurê Misafirî mir û koç kir. Ew xudênas di bajarê Hekariyê de ser bi bajarê Musilê dijiya ku, ew bi xwe ji Şamê, bajarê Balebekê bû. Dema ew çûye bajarê Musilê, hejar û xelkên çiyayî li wan deveran, bawerî danê û ew gelek bi nav û deng bû. (6) Herwesa hindek çavkaniyên din jî dibêjin ku, şêx Adî ji hoza (eşîra) Dinbilî ya kurdî ye û bi zimanê kurdî dipeyvî.

## Şêx Adiyê sofî

Berî şêx Adî, sofîyan cilên spî li xwe dikirin ku nîşana sersokiyê (sakarîsade) bûn. Lê şêx Adî bi cilên reş guherandî û navê wî kire xerqe (7) û xwendekarên wî jî ew cil li xwe dikirin û heta niha jî hindek komên êzîdîyan wan cilan bi kar ûnin. Şêx Adî û xwendekarên xwe, mîna komên sofîyan diketine xelwê, ji yana nexweş û ji xelkê dûr diketin. Rojiyên dirêj digirtin û bi tenê giyayên nas di navbera wan de, dixwarin. Ew jî eger wan yan mirîdên wan çandiban. Dîsan wan xwarina nenas ne dixwarin û ew qedexe jî dikirin. Ew peristin û nexwarina tiştên nenas, heta niha jî di nav êzîdîyan de hene; mîna nexwarina xes û kelemê.

Şêx Adî hat û rêxistina olî ya kevin li cem êzîdîyan, guherand û sîstema herêmî (pyramid) deyna ku heta niha jî, heye û bi van pileyên serekî ava kir:

1. Şêx: Anku yê rojperist û ev pileye jî, çil îcax in.

a. Adanî.

b. Qatanî.

c. Şemsanî.

2. Pîr: Ew çil îcax in.

3. Mirîd: Ew jî çil îcax in û di nav wan de jî ev pileyên ayînî hene:

a. Qewal.

b. Feqîr. (8)

Şêx Adî peywendiyên giran û aloz di navbera van pileyan de çêkirin. Ji bo

her êzîdiyêkê şêxek, pîrek û birayekê dawiyê (axretî)heye û ji bo wan jî ahengên taybet deynane ku bigêrin û jê berpirsbin. Şêx Adî ev dabeşkirine bi mora sofîgeriyê boyaxkirin, rewîşt û tîtalên ola Êzîdiyan, yên kevin û nû têkel kirin ku, mirov bi zehmet ji hev cihê bike. Wî rêformên xwe li ser diyardeyên derve destnîşanirin, berevajî Zerdeştî, yê ku guherînên nav xwe di ola xwe de çêkirin. Pirs û sedemên hatina şêx Adî bo Laleşê, ew jî çîrokeka dirêj e û pêwîstî bi delîveka baştir heye. Ya hejî gotinê ewe ku di Laleşê de, karê Rebena (masîra-nun) û babê Çawîş(qeşê kasolîkî) heye ku nikare jinê bîne.

### **Nivêjên êzîdiyan**

Ev ferze ji nivêjên berî zerdeştîyê(şemsaniyê) û sofîgeriya ku şêx Adî anî, têkel e û bi vî rengî ye:

1. Nivêja berîspêdê -Fecir-
2. Nivêja rojhelatinê.
3. Nivêja nîvro.
4. Nivêja êvarî.
5. Nivêja rojavabûnê-Mexrib.

Lê nivêjkirin bi metodê kevn e û divê piştî sûstina dest û ser û çavan, nivêjker berê xwe bide rojê, dema derdikeve û ava dibe û ji bo nivêja nîvro jî, berê xwe bide Laleşê, cihê pîroz li cem êzîdiyan. Digel van jî, çendîn tika û nivêj bi helkevîna jî hene.(9)

### **Koka ola êzîdiyan**

Ola êzîdiyan berî hatina şêx Adî, oleka esmanî (cosmic)bû,( mebesta min ne ew e ku ji esmanî hatibû û xwedan pirtûkeka mîna Qur'anê bû). Ew bawer dike ku binaxê vî gerdûnî başî ye û xerabî ji der ve tete nav. Di vê bûçûnê de zerdeştîyatî û êzîdiyatî digehine hev û ola dawiyê, gelek kevintir e ji yê din. Ew yek ji wan ola ye ku, 2000 sal berî zayînê hatiye Kurdistan û Îranê. Dema Zerdeşt 500 sala berî zayînê peyda bû û ola wî bûye yê dewletê, hîngê karekê mezin li ser êzîdiyatîyê kir. Dema ola misilmantîyê hatî û ji bo ku, êzîdiyatî hebûn û berdewambûna xwe biparêze, hîngê êzîdiyan her zû amojgariyên şêx Adiyê sofî wergirtin û gelek guherîn bi ser de çêbûn. Ji ber ku ola êzîdiyan, berî hatina şêx Adî, ji wan ola bû ku, di ser lawazî û bêhêziya xwe re jî gelek li dij hindê bû ku, biçe nav ola misilmanan û ji ber vê helwêstê jî, çendîn cara toşî qirkirin û vebirandinên tevayî bû. Ji bo ku, li dij misilmanan raweste, ew li rêyên din digeran, taku bîr û bawerên xwe biparêzin. Ji ber vî sedemî, dema misilmanan Kurdistan û Îran xistûne bin kontrola xwe, her du olên zerdeştîyatî û êzîdiyatî wek du olên belav û aşkera, xwe havêtine rêyên sofîgerî û

peristvaniyê.

## Êzîdiyatî û zerdeştîyatî

(Zerdeştîyatî pêşxistina olê êzîdiyatiyê kevn e.)

Zerdeşt 300 sala berî Îskenderê makedonî jiya ye. Li gor şirovekirin û lêkolînên li ser zimanê Avêstayê (pirtûka pîroz ya zerdeştî) hatîne kirin, çavkanî dupat dikin ku, koka wê ji Mîdiya (bapîrên kurda) hatiye. Herwesa felsefe û pîrensîbên wî, peywendiyên adet û baweriyên olên hindî bi yê îranî ve dupat (Tekîd) dikin, zêdebarî pesin û rêzê ji bo baweriyên aşivanî yan xweyê aşayê. (10) Anku mirovê li rastiyê digere û hewil dide ji bo xwe peyda bike ku, ew jî gelek nêzîkî Nîrvan e Budadî ye. Ne dût e ew Xudayê bi navê Memê Aşvan di nav êzîdîyan de, her ew be yê ku di felsefe û ola zerdeştîya de hatî.

Ez bawer dikim ku mezinî û payebilindiya zerdeştî û giringiya peyama wî, ji hindê tê ku wî tiştên nû di ola xwe de pêşkêş kirin û baweriyên felsefiyên şoreşgerî wek dualîzm (sunaiye) damezrandin û heta niha jî ew hizre, roleke mezin di felsefe û zanista pisîkolojiyê de dibînin. Ev dualîzme, şerenîxa berdewam e di navbera hêza baş û xerab de. Zerdeştî bawerî bi Xudayê başiyê, yê tak û tenha dianî ku çend çiq jê diçin:

a. Xudayê dilovaniyê: roh - pakî - başî.

b. Xudayê xirabiyê û rohên şerok.

Zerdeştî ev amojgariyên xwe anîn, çinku bab û kalikên wî, ravekirineka aşkera ji bo pîrsa xirabiyê peyda ne kiribûn. Ji lewre jî, zerdeştîyatî ola îrada azad e û her kes, bixwaze yan nexwaze, wê rastiyê yan derewê helbijêre. Pileya olî (pîr) wek rêberî olî, di nav her du olên zerdeştîyê û êzîdiyatiyê de hevpişk e. Herwesa adet û rewîştên din yê hevpişk, yê ku koka wan vedigere wan olên kevin yê ku 2000 sal berî zayînê, ji Hindê mişexfî Îran û Kurdistanê bûn, ev in:

## Agir

Ev toxme nûnerê Mîsra (Mîthra) yê ye ku, dadvanê gerdûnê û deshelatdarê agirî bû. (11) Mîsra jî mîna Arîme (Aryman) ye ku li gor hizra Zerdeştî, wê di paşerojê de roleke giring di rêxistina gerdûnê de bibîne. Berê temaşayî agirî dikirin, wek nûnerê Rojê li erdî û mîna hêzeka gerdûnî, bi rojê û avabûna wê ve girêdayî ye.

## Roj

Wek çevenga (sîmbola) beheştê dibînin û tekela ku Xudê pê gerdûna wan bi rê ve dibe. Zerdeştî gelek rewîştên olên kevin wergirtin. Lê bi germî li dij

( daévas) û rola wî dirawestin.

### Dualizm

Ew jî hizra hebûna du hêzên beramberhev û bi rolên xwe ji hev cihê, dipejirînin. Ev dualizm e di nav olên hindî-îraniyên kevin de hebûn. Du cîn ji wan hene:

1. Dualizma gawirî.
2. Dualizma sincî(exlaqî).

Dualizm di zerdeştîyê de berrabûn e di navbera Xudayê esmanî ku, xweşî û bextiyariyê belav dike û Xudayê li jêr erdî. Mirov qurbaniya pêşkêşî wan dikin, daku xwe ji ziyar û xerabiya wan dûr bikin.(12) Xudayên li jêr erdî, li gor zerdeştîyê, neku bi tenê dûr kirîne, belku disiza dayîne, anku digel Şeytanî, di dozexê de ne. Zerdeştîyatî bawer dike ku hebûna madî( hebûna matiryalizmî), cihê şerenîxa van her du hêza ye(başî û xerabî)yê û eve jî, kakila olê hindo-îraniyê kevn e. Olên êzîdiyatî, zerdeştîyatî û hindo-îraniyên kevin, bawerî bi rohveguzastî (Donadon) heye. Berdewambûna jiyane jî, piştî mirinê, meseleka misoger e. Veşar tin di gorê de jî, anku mala rohê piştî mirinê.

### Ga

Baweriya xudênenasên kevin xuya dike ku, mirina Gay, pêwîstiyek bû û tevaya heyberan ( kaînat) û şînayî ji xwîna wî gayî şî û peydabûne. Ev helkevîne vedigere qurbaniya salan e ya Mîsra(mithra) ji bo nûkirina jiyane û hatina buhareka pir giya û çerwanekê mişe, ji bo giyandaran. Ev aheng e di payîzê de dihate kirin. Heta niha jî êzîdî ahengê di vê cejnê de dikin û ew li cem wan, ji cejnên mezine ku, dibêne Cema û di dawîya demsala payîzê de tê kirin. Ahengên vê cejnê bi dirêjîya heft rojan, her ji 23 ê îlonê û heta yekê çiryapêşîn (tişrînewel) berdewam dibe. Di roja çarşembê de, li ser çiyayê Laleşê, li cem gora şêx Şemsî, ku yek ji xudênasên navdar e û serkêşê êzîdiya ye, Gay serjê dikin. Mebesta wan ji pêşkêşkirina Gayî ew e ku, destnîşana dawîya payîzê dikin û daxwaza hatina zivistaneka têr baran ku, giyay û şînatîyê ji dewara( Heywana) re( çavkaniyên bingehîn yên jiyana wan) şî bike. Ev e jî her ew Gaye yê ku, pêşkêşî (Appolo)yî kirî û Ga jî, sîmbola çiryapêşîn e di zanista stêran de.

Li cem neteweyên hindo-îraniyên kevin, dema Ga serjê dikirin, agir hildikirin û stiran jî digotin. Ev adet e gehîştî nav êzîdî û zerdeştîyan jî. Li cem êzîdiyan dehol û zirnayê lê dixin û stiranên olî jî tene gotin, agirî heldikin û goştî dibirêjin û digel dankutê (simatê) li ser xelkê belav dikin.

Sal di nav gelên hindo-îranî de, ji 360 rojan û 12 mehan pêk dihat. Ji bo her mehekê 30 roj û salekê jî, du demsal pêk dihatin:

1. Ji buharê heta payîzê.



## 2. Ji payizê heta buharê.

Digotin e wan jî demsalên Xudê. Di demsala yekê de, aheng di nav xweza û keskatiyê de digêran û bi helkevîna dawîbûna erkê salê, yê ku Mîsra jê berpirs, ku wezîfe û erkê wî şînbûn û bergirtina rez, dehîl, dexl û danî ye. Lewre jî Ga pêşkêşî Mîsrayî dikirin. Heta niha jî êzîdî vê cejnê pîroz dikin û bi cejna Serêsâlê nav dikin. Xelk malên xwe bi gul û çiçekan dixemlînin û li wê baweriyê ne ku, Tawûsê Melek wê di wê rojê de wek cigirê Xudê, ête ser erdî û ji ber hindê jî, qurbana pêşkêşî wî dikin.

## Ahoramezda

Di olê Zerdeştî de Ahoramezda, parêzgarê xelkê ye. Di nav firîştan de, wî bi tenê şîya hêza helbijartinê di navbera toxmê başî û xerabiyê de bi kar bîne. Her ew bû di berê de, yê ku karî helbijêre û bi kar bîne.(13)

Ev hizr e nêzikî çîroka dirutkirina gerdûnê û rola Tawûsê melek e. Çinku wî bersiva rast da Xudê, dema jê re gotî, sucdê ji bo Ademî bike. Îna Xudê ew xelat kir û pileya wî bilind kir û kire serokê tevaya firîştan. Eve jî mîna rola Ahoramezda ye ku serokê ( esman - av - erd - şînatî - giyandar û mirovan e.)

## Mirov di zerdeştî û êzîdiyatîyê de

Dualîzm baweriyê bi revîn û şikestina hêza xerabiyê beramber hêza başiyê tîne û li dawiyê jî serketina Ahoramezdayî. Ev e jî ew armance ya ku tevaya gerdûnê li bendê dimîne û ev serketine jî, têgehiştina Xudê dupat dîke û bi vê çendê, ola Zerdeştî dibe yê çêker û pêşketî. Mesela başî û xerabiyê li cem zerdeştîyan, bi wîjdan, sinc û rewîştên mirovî ve girêda ye. Eger mirov têgehiştî be, ew dê rêya başiyê helbijêre û nezan be, xerabiyê. Ev ravekirin jî, wek ya li cem êzîdiyan e, dema dibêjin ku, başî û xerabî di mejî û wîjdana mirovî de ye. Ev e jî li ser mirovî diraweste ka kîjanî dihelbijêre û çend bi Tawûsê Melek ve girêdayî ye, yê ku berê mirovî dide başî û rastiyê, çinku Xudê jî mafê helbijartinê dabûyê. Ravekirina vê çendê jî, bi hebûn û peydabûna taqet û şîyanên mirovî ve ye û ka heta çî pileyê dê bi kawdanên dûrûberên xwe ve daxbarbe ku, bibe mirovekê baş yan jî xirab. Amojgariyên zerdeştîyê, li ser mesela kesayetîya mirovî, roja dawiyê û rêya rast, karekê mezin li ser ola êzîdî, cuho, filehan, misilman û teoriyên xudênasiyê, yê gelek zana kiriye. Zerdeştî karekê mezin li ser guherîna ola êzîdiyan kiriye, nemaze li ser rewşa naveroka navxwe ya cejn, adet û rewîştên wan.

Şêx Adî hat daku guherînan di pêkanîna dirustkirina derve de bike, wek danana sistema herêmî û dabeşkirina êzîdiyatîyê li ser gelek pileyên ofî, bê ku bikare naverok û felsefa wê biguherîne, çinku şîwarên kevin her man û kar û senga wan jî, di jiyana rojane de her maneve. Lê digel hindê jî em dikarîn

şêx Adî û Zerdeştî bi du çakîker û serkêşên olî yên mezin bizanîn, nemaze eger em temaşayî wê rewşa aloz û xeternak, ya ku çaverêyî ola êzîdîyan dikir bikîn, dema misilman hatine deverê.

Em dikarîn pêngavên şêx Adî bi yên şoreşger bizanîn, nexasim e di wî demê berteng û tirsînak de, ku wî şiya vî olê kurdî ji vebirandinê rizgar bike.

Li dawiyê, eger zerdeştîyatî olekê dualî be, êzîdîyatî yekîniye (Wehdaniye) û ew olekê metiryalî ye bêtir ji yekê mîtafîzîkî.

Wergera ji erebî: **Xelîl Duhokî**

---

### ÇAVKANÎ:

1. The Encyclopedia of Religion, rûp 503.
2. Her ew çavkanî, rûp 319.
3. Rudolf Frank: Scheich adi/der grosse Heilige, Berlin, Mayer und muller 1911, rûp 103.
4. Her ew çavkanî, rûp 8.
5. Yaqot Elhemewî di fêhenga wî ya cografîyê de. Di ( 626 koçî - 1229 zayînî)de miriye.
6. İbin Elesîr, pirtûka wî, ji rûdanên dîrokê, di 630 koçî -1233 zayînê de miriye.
7. Margaret Smith: Studies in Eearly mysticism in the near of middle East the sheldon press, London 1931, rûp 161.
8. Roger Lescot: Enquete sur les yezidis De syrie et du djebel SindjarBeyrouth 1938, rûp 232.
9. E. S. Drower: Peacot Angel, London; John Mukry 1941, rûp 92.
10. R. C. Zaehner: The Dawn and Twilight of Zoroastrianism weidenfeld and Nicolson 1961, rûp 34.
11. Mary Boyce: AHistory of Zoroastrianism, Vol 1, leiden Köln.E J. Brill. 1975, rûp 29.
12. Her ew çavkanî, rûp 233.
13. Her ew çavkanî, rûp 226.

\* Mesele li ber Rudolf Frankî têkelbûye, çinku heta niha heşkere nebûye ku, her du pirtûk yên şêx Adî ne. Şêx Hesenê kurê birayê wî, Cilwe nivîsiye û dibêjin ya dîn ji şêx Adî nivîsiye.

\* Ev gotar di kovara Roşenbîriya Nû de, hejmar 243, rûp 101- 111, belav bûye.

## ”Ziman û çanda kurdî ne tenê ya kurda ye, pirsa 62 mîlyon hevvelatîyê Tirkîyê ye ”

(Nivîsara jêr, parastina ser okê KURD-KAVê ya li dadgeha Stenbolê ye. Ji ber ku parastin, pêşagahdariyên pêwîst ên bo xwendevanan gelek zelal radixe pêş çavan, me yekser vê parastinê ji orîjînalê tirkî wer gerand kurdî û pêşkêş kir. - R.Ç.)

Dadgêrê birêz,

Di serdema me ya îroyîn da daxwaz ew e ku, çî zimanê qewmekî ku ji 300 - 500 bêjeyî pêk tê, çî jî zimanê civatek pêşkerî yê ku bi 200 000 bêjeyî tê axaftin hemû ziman bêne parastin û jîyandin. Li gor vê daxwazê û daxwazkarê vê mebestê, her ziman û çand kufîlkeke baxçê malbata mirovatîyê ye. Û malê wan ê şîrîk e. Jîyandin û tedbîrên pêşvebirina wan jî, dîsa di bin berpirsiyariya malbata mirovatîyê da ye.

Ji ber vê yekê, li gor huqûq û peymanên navneteweyî, meriv nikare pêşîyê li perwerdeyiya zarokan a zimanê maderî, mafê jîyana azad a di çanda xwe da bigre û ev heq, mafê bingeînê mirovan e û nayê spartin (dewr kirin).

Îro li Tirkîyê nêzî 20 mîlyon kurd dijîn. Ew diçin eskerîyê, bacê didin û bi kurtî hemû watinîyên hevvelatîyê bi cîh tînin. Lê dewlet li beramberî vê yekê wezîfa xwe pêk nayne. Wek nimûne, ji zarokên tirk ra dibistanan vedike. Zanîngehên mamosteyîyê vedike. Ji bo pêşvebirina zimanê tirkî, çand û hunera wî sazîyên cûrbecûr vedike. Di vê paralelê da piştgiriya sazîyên çandî yên sîvîl dike.

Dema ku dor tê ser hevvelatîyên kurd, bicîhanîna van watinîyan bide alîkî, zimanê kurdî, çand û hunera wî qedexa dike, di dadgehan da dizêrîne û ceza dide wan.

Herweha wek komek ronakbîr, me xwe li beramber dinyayê berpirs dît, ji bo dagirtina vê valahîyê Waqfa Kurd a Çand û Lêkolînê damezrand.

Li gor seneda waqfa me, ku ji alîyê dadgehên desthilatdar biryar hatiye girtin, em dikarin qursên bi zimanê kurdî vekin. Em dikarin ji pengava yekem heta bi unîversîteyê xwendegehan vekin. Em dikarin radyo û televizyonan vekin. Em dikarin hemû cûre berên bihîstin û dîtinê pêşkêş bikin.

Me di detpêkê da gaveke mutewazî avêt û hewl da ku bi zaravayên kurmançî, dimilî (kirdkî, zazakî) û soranî dersxaneyek vekin.

Beşek girîng ji kurdên asîmîlebûyî, dixwazin kurdîya hêsan û pratîk fêr bibin, yên ku bi kurdî zanin jî, dixwazin li gor rêzimanê binivîsin û bixweynin. Ji xeynî kurdan gelek kesên nekurd ên wek tirk, ereb, laz, çerkez, ermen dixwazin fêrî kurdî bibin. Ev têr nake bi serda jî. gelek sazîyên ku ji waqfa me wergêrvan dixwazin hene.

Herweha ji bo bersîvdayina van daxwazîyan, li gor normên Wezaretê Perwerdeyî û di bin kontrola wan da, me ji bo dersxaneyek kurdî ya ku dikare şahadetname bide serî li walîyê Stenbolê da. Serlêdana me hewaleyî Mudurîyeta Perwerdeyî bû. Serlêdana me hate qeyd kirin û ji me hin belge li gor normên wan avahîyek hate xwestin.

Me hemû daxwazîyan bi cîh anî. Lê mixabin ku piştî heft mehan, ji me ra nivîsek şandin û bi wê nivîsê daxwazîya me red kirin.

Ev ne bes bû, ji tarîxa pejirandina seneda me virda, xebatên me yên zimanî yên di avahîya weqfa me da hatin ewiqandin, pêşî lê hate girtin. Qatek avahîya weqfê hate morkirin. Û niha jî ji alî dadheha we tîm dadkirin.

Dadgêrê birêz,

Em wek weqif, di çarçeva mijarên seneda me da lêkolînan dikin. Ji zimanên biyanî werdigerînin kurdî, ji kurdî jî werdigerînin zimanên biyanî. Li ser dokumentên dadgehan ên ku gihane me, xebatên wergerê dikin.

Wek her zimanî, di kurdî da jî hin zarava, şêwe û devok hene. Ji bo ku em karibin di van karan da hêj serwest û amade bin, wek kesên ku karin bi kurdî bixweynin û binvîsin em, xebatekî berdeyamkirî dimaşînin.

Wek tê zanîn hunermand û edebîyatvan gelek averû û bêjeyên pirmane bi kar tînin, herwisa tê zanîn ku her zimanek xwedî deranînên (idiyom) xweser in. Dema ku nivîsarên weha werdigerînin, dîsa em di van mijaran da pir caran li ser ziman radiwestin. Ji bilî vana, di kurdî da cinsiyeta hemû heyîyên abstrak û berbiçav heye. Carna em, li ser mêbûn an jî nêrbûna bêjeyek bi rojan munaqêşe dikin. Ango di waqifê da em, him ji hev ra dibin xwendevan him jî dibin mamoste.

Ev xebatên me, bi hinceta ku me ji wezaretê destûr negirtiye, hatin qedexê kirin. Derê me (waqifê) hate mor kirin. Niha jî li dadgehê wek tawanbarek tîm dadkirin.

Yanî niha, di wergerandina nivîsarek an jî kasetek Dadgeha Ewlehîya Dewletê (DGM) ya Stenbolê da, ji bo tesbîtîkirina tewandina lêkerên zimanê kurdî, afirandina bêjeyên nû, tesbîtîkirina beramberbêjeya deranîn an jî averûyek, xebatên derbarî cinsiyeta bêjeyek em ê ji Wezîrê Perwerdeyîyê destûrê wergirin?

Ez ne di wê bawerîyê da me ku ev tişteke huqûqî û dîtinek aqilane ye. Hema bêje her roj, em di waqîfê da li ser kurdî diaxifin, munaqeşe dikin, fêr dibin û xebatên fêrkirinê dimeşînin. Ji bo ku em karibin kurdîyek xweş, li gor rêzimana wî bixweynin û binivîsin wekî din tu rêyek fêrbûnê tune.

Wek mînak, ez li dibistanê fêrî tirkî bûm. Xwendin û nivîsandina kurdî jî, di çil salîya xwe da di nav şêwexebata jorê fêr bûm. Ango kurd, bi salan li malan, li kolanan, li cîhê kar, di wasitayan da xebatên zimanî didin meşandin.

Dadgêrê birêz,

Di vê çespandinê da gelek dijberî hene û di têhihîştinê da zehmetî dikşînim. Mesela, rêvebirî, heqê ku dadgêrî daye min ji min distîne û nahêle ez wî heqê bi kar bînim. Ango, rêvebirî ji biryara dadgêrî ra hurmet nîşan nade û vê biryarê tûşe munaqeseyê dike. Ev ne rewşeke pejirandinê ye.

Ji ber ku ez mafekî ku dadgeha Beyoglu daye min bi kar tînim, di eynî avahîyê da (edlîyê da) dadgehek din dawê li min vedike. Ez dixwazim vê jî bêjim ku, ev tişteki seyr e bo min.

Di qedexekirina qursên zimanê kurdî da wek hincet zagona 2923 hatiye nîşandan û li gor vê zagonê, li Tirkîyê tenya bi zimanên îngilîzî, fransîzî, almanî, rûsî, spanyolî, îtalyanî, erebî, çînî û japonî karin qurs bêne vekirin. Zimanên dervayî vana qedexe ne.

Îro li dinyayê nêzî 2800 zimanên jîndar hene. Em zimanên ku ne xwedî dewlet in deynin alîkî. Gelo di qedexekirina zimanê 160 dewletan da spartinek aqilane û huqûqî heye?

Dewlet ji bilî 9 zimanan, perwerdeyîya bi zimanên din qedexe dike lê di eynî demê da li sazîyên xwe yên fermî da, ji xeynî 9 zimanên qalkirî, bi gelek zimanên din qursan vedike, karê perwerdeyîyê dimeşîne.

Ango qedexe tenê li ser kurdî tê çespandin.

Li gor zagona 2923 a derbarî perwerdeyîya zimanên biyanî, bo hemwelatîyê erebên Sêrtê, Ruhayê zimanê maderî serbest e, lê bo kurdên van bajaran qedexe ye.

Dadgêrê birêz,

Hebûna kurda, rastîyêke sosyolojîk e. Ev ziman (kurdî) û çand ne tenê ya kurda ye, pirsra 62 mîlyon hemwelatîyên Tirkîyê ye.

Eger min îro li pêşberî we parastina xwe bi kurdî bikira, ji bo tamtêgihîştina gotinên min we yê tercumanek ji ku derê bi dest xista?

Wek ku tu jî dibînî, îhtîyaç bi însanên ku karibin zimanê kurdî li gor rêziman bixweynin û binivîsin heye, îhtîyaç bi dozger û dadgerên weha heye.

Ez di wê bawerîyê da me ku, dijminahîya hember zimanê kurdî, çand û hunera wî, mêtîyê zordarî û qedekarî hewldaneke xirabkirina aşîtîya civakî

ye.

Dadgehên desthilatdar mafê vekirina qurs û dibistana daya me, lê pêşî li vê xebatê tê birîn, derê waqfa tê mor kirin, dawê li me tê vekirin. Ez vê yekê nikarim bipejirînim û daqurtînim.

Tevî hemû biheqîya me, eger ez bê m cezakirin, li pêşberî we aşkera dikim ku ev ceza bo min şanazî ye.

---

---

## Ji raya giştî ra

### Morkirina derê KURD-KAVê, morkirina ziman û çanda kurdî ye!..

Polîtîkaya dewleta tirk a êrîşkar û dek û dolabên tîr gerandin, ji alî herkesî va tê zanîn. Dîsa baş tê zanîn ku ev polîtîka, li ser bingeha înkariya gelê kurd tê meşandin. Hedef ne tenê rêxistinên polîtîk ên kurd û daxwaziyên wan ên neteweyî ne, herwisa rêxistinên sivil, xebatên demokratî yên legal û yasayî, çalakîyên zimanî û çandî jî bi eynî dozajî dibin hedefa tîrên vê polîtîkayê. Ev polîtîka gihaye radêyê wisa ku, çî çalakîyên bêhna kurdî jê bê wek tawanbariya potansiyel tê pejirandin. Mînakî dawî, êrîşên nehuquqî yên li ser KURD-KAV (Waqfa Lêkolîna Çanda Kurd) e.

KURD-KAV piştî xebateke dirêjî huquqî û yasayî hate damezrandin. Li gor seneda wê ya damezrandinê, ev dezgeh xwedî mafê vekirina qursên bi zimanê kurdî ye. Kare jî pengava yekem heta bi universitêyê xwendegehan veke. Kare bi zimanê kurdî dezgehên radyo û televîzyonê veke û bi rêve bibe. Kare hemû cûre berên hunerî yên bihîstin û dîtîni pêşkêş bike.

Hemû mafên ku di seneda waqfê da cîh digre, bi biryara dadgehên dewleta tirk hatine pejirandin. Lê bila wek tiştêkî ecêb neyê dîtîni, dema waqîf jî bo mafên xwe yên pejirandî yên legal û yasayî dest bi xebatê kir, ew dewleta ku vê senedê tesdîq kiribû, rûyê xwe yê înkariyê nîşan da û qet bi derengî jî neket.

Li gor agahdariyên çavkaniya esehî waqîf, li gor normên Wezaretê Perwerdeyî û di bin kontrola wan da, jî bo vekirina dersxaneyek zimanê kurdî yê ku karibe şehadetname bide, bi daxwaznameyek serî li walixana Stenbolê dide. Ev daxwazname hewaleyê Muduriyeta Perwerdeyî dibe û hemû ewraqên ku muduriyeta dixwaze tîr temamkirin. Ango hemû pêwîstî tîr bi cîh anîn, lê piştî 7 mehan di bersivnameyê da daxwazên wan tê red kirin. Hema piştî

bersîvnameyê jî, polis êrîş dibin ser waqfê û derê wê mor dikin, derheqa 22 yê Adara 1998 rêvebiran da jî dawê vedikin.

Bêguman ji roja ku waqif hatiye damezrandin, li pêşiya xebatên wê astengî kêm nebûne û muamela tawanbariyê li wan hatiye kirin. Dewleta tirk dizane ku, ew nikare gelê kurd bi awayekî fizîkî ji holê rake, lewma jî ji çalakîyên zimanî û kulturî ziravê dilê wê diqete. Lewra baş pê dizane ku, ziman û çand, miletekî li pîya dihêlin û di zindîmayînê da roleke bingehîn dileyzin. Ev polîtîka, daxuyaniya sosyolog û zimanzan Tove Skutnabb-Kangas tîne bira me : "Nufûsa kurda a giran, mecalê nade qirkirina wan ê fizîkî, lewma jî Tirkîye hewl dide ku kurdan ji alî ziman û çand ji holê rake."

Bi rastî em, tu pêwîstî nabînin ku li ser vê gotinê zêde kin. Lewma jî em, êrîşên ser KURD-KAVê, çespendinên nehuquqî û nedemokratî, binligkirina mafên mirovî yên navneteweyî tawanbar dikin û ji raya giştî ra didin xuyan ku, em li ba têkoşîna şanaz a KURD-KAVê ne.

Bi navê

**KOMELA NIVÎSKARÊN KURD LI SWÊD**

Xelîl Dihokî

22 Adar 1998

---

---

## Ji Komelê

Komela nivîskarên kurdên li Swêdê di 24, 1, 1998an de li ser Kür d Teavun ve Terakki Cemiyeti û r ojnama wê semînerek li darxist. Semîner ji aliyê Malmîsanij ve li bajarê Stockholm li ABFê hat dan.

Dîsa komela me, di 31, 1, 1998an de ji bo bîranîna Mihemed Qazî li bajarê Stockholm li Alvikê, civînek pêkanî. Di vê civînê de Hesên Qazî hinekî berfireh li ser jiyana Mihemed Qazî û nivîskariya wî rawestiya.

Komela nivîskarên kurd li Swêdê kongera xwe a çaran di 7, 2, 1998an de li Stokholmê çêkir. Bi dû hin devjengên di derbarê xebata pêşerojê û pejîrandina hin biryaran de ji bo komîta karger Xelîl Duhokî, Aram Gernas, Hesên Metê, Lokman Polat û Cemal Batun wek esîl; Têmûrê Xelîl û Laleş Qaso jî wek cîgir hatin hilbijartin.

Komîta Karger Xelîl Duhokî serok, Aram Gernas sekreter û Lokman Polat jî berpirsiyarê malî hilbijart. -

## Ji Çirayê re namek

(Birêz Xelîl Sasonî, nama ku te ji bo kovara me di vê tarîxê de 7, 7, 1996 ji Qamîşlê şandibû, pêşî diçe Qanadayê. Belkî çû be derin din jî lê em nizanin. Name ji Qanadayê mehek berê giha destê me.

Name wek ku hatiye nivîsandin em diweşînin. R.Ç)

"Weşangeha (Awesta) ya ku Abdullah Keskîn xwediyê wê ye li Stenbolê, bi navê 'Şîrên Windabûyî - Cegerxwîn' di Sibata 1996an de dîwaneyek helbestan diweşîne.

Gava ku min rûpelê dîwanê xwendin.... min dît ku helbestên tê de, ji qabê heta qabê, helbestên min in; ne yê mamostê min Cegerxwîn in.

Tevî ku xêztilik û rûçikên min di wan helbestan de xuyanî ne...

Tevî ku di rêzikê ji helbesta (Hevalo) de navê min ê heşkere (Xelîl) hatiye ...

Tevî ku di rêzikê ji helbesta (Ez dengê birçiyar im), min gotiye; 'Ez im dengê Cegerxwîn û Mahmûd Derwêş û Lorka'

Tevî ku di dîwanê de wergerandina min ji helbesteke bi zimanê inglîzî re a bi navê (Whity on the moon- wayti li heyvê daniye) ya helbestevana emêrikanî (Cil Hêrn) ku min wergerandiye zimanê kurdî bi şîr heye...

Tevî ku di dîwanê de wergerandina min ji helbesteke erebî a bi navê (El etlal-Kavil) ya helbestevan Dr Îbrahîm Nacî re jî heye....

Tevî ku kurdek bi tenê jî tune û nîzane ku Seydayê me Cegerxwîn ne fêrî zimanê inglîzî bû ta ku karibe helbestekê ji zimanê inglîzî wergerîne zimanê kurdî bi şîr...

Tevî ku piraniya helbestên di dîwanê de hatine bi dehan ji kurdê Sûriyê ezber kirine û bêtir jî nîvê wan helbestan hatine awazkirin ji alî hunermendên Cizîrê û hatine tûmar kirin ser kasetan û belav bûne bi dengên çend dengbêjan ji berî bîst salan ve...

Tevî ku orjînalê vê dîwanê hey li ba min parastiye û li ser rûpelê paşîn çend xêz bi pênûsa Seydayê min Cegerxwîn bi xwe, hin têbinî û çend rexneyên toreyî nivîsandine li ser helbestên dîwana min di roja 22, 2, 1977an de ...

Mixabin, tevî van rastiyan hemî jî lê ji ber kêmasiya herî mezin ku mamoste Keskîn ketiye dema xwe ne westand û izin ji malbata Seydayê Cegerxwîn ne sitend berî dîwanek li ser navê wî bide çapê û belav bike...ev bûyera ne xweş çêbû.

Ji ber van tiştên ku ne layiqî Seydayê nemir Cegerxwîn û ne layiqî xwediyê weşanxanê û ne layiqî min jî... ez mecbûr bûm ku vê ronîkirin û agadariyê ji we re bişînim. Û hêvîdar im ku hûn ji kerema xwe re bi weşînin û belav bikin.

Tevli rêzdarî û hêviyên min yên gem û gur.

**Xelîl Sasonî**  
Qamîşlê, 7, 7, 1996"



# Çarsedsaliya Şerefnameyê

Di çardeyê meha heştan ya sala 1597an de, Şerefname Bedlîsî, dîroknameya pêşî ya gelê kurd, Şerefnameya xwe temam dike. Di 1997an de çarsedsaliya vê berhema bêhempa bû û weşanxaneya APECê xwest kurmanciya wê çap bike, lê negihaşt û anuha, ew di destpêka sala 1998an de derdikeve.

Şerefname: mîrek ji eşîreta Rojkan. Vê malbata xanedar desthilatî li Kurdistanê kiriye û bajarê Bedlîsê ji xwe re kiriyê paytext û serbajar. Ji sedsala nehan û pê de, ev malbata kurd geh bi şeweyekî serbixwe, geh di bin sî û desthilatiya mîr an qiralên dî de hukum dike. Şerefname Bedlîsî navê Şerefnameyê li berhema xwe dike û mebesta wî du tişt in: Ev pirtûk dibe ya "şeref" kurdan, ya rûmet û serbilindiyên wan. Ew dikare bibe ya malbata Şerefname bi xwe jî.

Pirtûk bi farisî hatiye nivîsîn ji ber ku ev ziman, di serdema Şerefname Bedlîsî de zimanê edebiyata bilind û bedewiyê ye. Ji Delhîyê heta Stanbolê wê demê, ev ziman, zimanê civatên pêşketî û bajarvaniyê ye.

Naveroka berhemê: Şerefname ji du cild in, cilda pêşî ji destpêkek û ji çar beşên ("sefheyên") ne bi eynî dirêjbûnê pêk hatiye. Di destpêkê de nivîskar li ser efsaneyên kurdî, li ser cidayiyên devokan, li ser dîn û olên kurdan û taybetiyên civata kurdî, hûr dibe û nêrînên xwe rave dike.

Beşê pêşî: Ew li ser du malbatên kurd ku bi şeweyekî serbixwe desthilatî û hukmê xwe kirine.

Beşê duduyan: Ew li ser mîr û serokên kurdan yên ku ne bi şewekî berdewam serbixwe desthilatî kirine. Hin ji nav van mîr û serokan çar jî gelekî xurt bûne, perên xwe, bi navên xwe, çê kirine.

Beşê sisêyan: Ew li ser mîr, xanedar û serokeşîrên, ne bi mezînbûna herdu pirtûkên pêşî ye.

Beşê çaran: Şerefname wê li ser malabata xwe, li ser êla Rojkan, dinivîse. Ew bi şewekî berfireh li ser vê imaretê û serbajarê we hûr dibe. Beşên dawî yên vê pirtûkê li ser jiyana wî bi xwe ne.

Cilda 2.: Ev beşê Şerefnameyê li ser dîroka Rojhilata Navîn û Asiya Navîn e.

Şerefname gencîneya bûyer û agahiyên dîrokî yên Rojhilata Navîn e. Lê berî her tiştî, Şerefname gelekî giranbûha ye ji ber ku kurdekî ew nivîsiye û tê de nêrînên xwe li ser miletê xwe, li ser dîroka gelê kurd dane nîşan.

Şerefname Bedlîsî ciyê xwe di dilê kurdan de digre. Piştî mirina wî, her mîrî, her serokê êlê tê û li Şerefnameyê çend rûpelan ji dîroka xwe an êla xwe lê zêde kir. Bi kêmanî heşt Şerefname hene û her yek berdewamiya pirtûka berî xwe ye.

Destnivîsa Şerefname ji pirtûkxaneya biraziyê wî Ebdal Xan tê dizînin û bi guman e ku

tirk wê dibin. Lê çend destnivîsên vê berhemê di gelek pirtûkxaneyan de hene. Destnivîsên Şerefnameyê li Petersbûrgê, li Tehranê, li Stambolê hene. Mele Mehmûdê Beyazîdî cara pêşî ev pirtûk wergerandiye kurmancî û navê wê kiriye Dîroka Kevnare ya Kurdistanê. Şerefname wergerandine gelek zimanan. Di çarşed û yeksaliya wê de li Awrûpayê Weşanxaneya APEC'ê vê berhema hêja bi tîpên latînî, bi Kurmancî wê pêşkêşî xwendevanan dike.

# ŞEREFNAME

Yarîta Kurdîstanê ya Kevnare



a

*Şerefname Bedî'î*

Şerefnameya kurmancî bi lîpên latînî derket!

# ŞEREFNAME



a

*Şerefname Bedîse*

NAVÎŞANA XWESTINÊ:

APEC-TRYCK & FÖRLAG

Box 3318, S-163 03 SPÅNGA/SWEDEN

Tel: +46 8 761 81 18 \* Fax: +46 8 761 24 90